

Cenneta Li Ser Dinyayê

# HÊLÎNA MALBATA BEXTEWAR

Osman Nûrî TOPBAŞ

WEŞANÊN ERQEM

**ISTANBUL - 2016**

© Weşanên Erqem 1437 H / 2016 M

# HÊLÎNA MALBATA BEXTEWAR

Osman Nûrî TOPBAŞ

**Navê Resen:** Huzurlu Aile Yuvası

**Nivîser:** Osman Nûrî TOPBAŞ

**Wergêr:** Mehmet Seyhan
[Mela Muhemmedê Bêrkevanî]

**Rastker** Abdusselam Kartal
[Mela Ebdusselamê Bêcirmanî]

**Qordînator:** Muhammed Davuthan Kılıç

**Grafiker:** Rasim Şakiroğlu
Murathan Musayev

**ISBN:** 978-9944-83-895-5

**Navnîşan:** Ikitelli Organize Sanayi Bölgesi Mah.
Atatürk Bulvarı, Haseyad 1. Kısım No:
60/3-C Başakşehir,
Istanbul, Turkey

**Tel:** (+90-212) 671-0700 pbx

**Fax:** (+90-212) 671-0748

**E-mail:** info@islamicpublishing.org

**Malpera We bê:** www.islamicpublishing.org

**Sertifika çapê:** Weşanên Erqem

**Language:** Kurdish

WEŞANÊN ERQEM

Cenneta Li Ser Dinyayê

# HÊLÎNAMALBATA BEXTEWAR

Osman Nûrî TOPBAŞ

WEŞANÊN ERQEM

# PÊŞGOTIN

Hemd û senayên bêdawî ji Cenabê Heq re bin! Ewê ku însan ji mêr û jinekê aferandine û bi wesîleya mehebbeteke ku di navbera wan de kiriye serkehnîya seadeta ebedî jî, derîyên îşq û mehebbeta li hemberî zatê bilind ê xwe li ber me vekirine.

Dirûd û silavên bêdawî li ser mûrşid û rêberê bilind ê me Mûhemmed Mûstefa -sellellahû eleyhî we sellem- bin; ewê ku ji bo jîyana malbateke bextewar nimûneyê ji hemû nimûneyan mûkemmeltirîn û îdealtirîn e ku ew jî wê dilên me li ber derîzana evîn û mehebbeta îlahî hazir bike..

Hîç şek û şubhe nîn e ku di xulqîyet û aferîna hemû mexlûqat û heyberan de mehebbet heye.

Ellah Teala, berî aferandina van aleman "**xezîneyeke veşartî**" bûye. Wî mehebbet û hez kir ku ew were zanîn û wî bi vê mehebbetê hemû heyber aferandine.

Ji lewma mehebbeta îlahî bû cewher û kakila hemû mehebbetan û Cenabê Heq, hemû hezkirin û mehebbetên dîtir ên ku daye bendeyên xwe jî di

rastîyê de her yek ji wan ji bo mehebbeta xwe wek wesîleyeke hazirker û bilindker îhsan kirine. Wî, wek pêpelinga biqîmettirîn ji bo derketina bi zirweya mehebbeta xwe jî mehebbet û peywendîya navbera mêr û jinê bexş kiriye. Wî ji bo vê mehebbet û peywendîyê mal û hêlîna malbatan ku bi Eqda Nîkahê (girêbesta zewacê) têne damezirandin jî her yek ji wan bi navê mezinê xwe kiriye ew mekan ku têde ev mehebbet bi manetir û biberekettir tecellî dibe.

Bi vê nêrînê hêlîna malbatê, hem ji bo mehebbeta Xuda bû pêpelingeke jêneger, hem jî ew, ji bo berdewamîya nifş û neslan bi qanûna îlahî hate kirin. Yanî hawîra malbatê, hem îhtiyaceke bedenî ye, hem jî wê ji bo kemala rûhanî jî zemîna pêşî û bingehîn pêkanîye.

Bi vê sebebê, di nezara Îslamê de zewac, her zeman esil bûye û heta tu bibêjî bes; ew hatiye teşwîqkirin. Ji xwe berevajîya vê, ji fitret û aferîna însanî re dijber e.  Lewra zewac, -mazeretên derbasdar ne têde ne- wekî din îhtiyaceke û sunneteke senîyye ye ku divê însan xwe jê dûr negire.

Ji ber ku çêkirina hêlîna malbatê ev qeder giring e; gellek nuqteyên hûr û meseleyên mûhîm hene, divê mirov wan li ber çavan bigre da ku bikare meqsedên ji zewacê têne arzû-kirin tehqîq bike û da ku mirov bikare hawîr û weseta malê jî bixe cenneteke aramî, dilşadî û hizûrê.

Divê mirov çi bike, ji bo bikare heyata malbatekê damezirîne ku ewê ji bo mehebbeta îlahî bibe pêpeling? Divê mirov li çi miqate be, da ku her malek ji malên me bibe cenneteke hizûr û seadetê? Divê em çawa bijîn da ku rêwîtîya me wek temamê ferdên malbatê di wusleta bêdawî de bi nuqte bibe? Divê çawa were temîn kirin ji bo ew seadeta ku wê li dinyayê tehqîq bibe, ew di heyata axretê de jî berdewam bike?!

Ha hemû kar, di bersivên van pirsan de veşartî ye. Belkû ji bo herkesî bi awayekî rast û durust tesbîta van bersivan, bi sebeb zeman û zemînê ku em têde dijîn, ne mûmkin be. Ji bo vê Îslamê, bi awayê ji hemû awayan sipehîtir û bi her tefsîlatên wê ve rê, usûl, qaîde û endaz danîne ku ewê însanan bibin bigihînin wan hedef, meqsed û netîceyên ku bi heyata aîlewî têne arzû-kirin. Ji bilî vê jî Îslamê dîyar kiriye ku heke ev tedbîr û riste li ber çavan neyên girtin ka wê kîjan netîceyên wexîm û xirab derkevin holê.

Di vê xusûsê de ji bo mirov bigihîje serkeftina îdeal, yanî ji bo çêkirina hêlîna malbateke bi hizûr jî Cenabê Heq, ji bo me nimûneya ji hemû nimûneyan sipehîtir û mûkemmeltir kiriye nesîb ku ew jî Sultanê Dilan Hezretê Mûhemmed Mûstefa-sellellahû eleyhî we sellem- e. Ew Pêğemberê Pêğemberan ku di ti merhele û sefheyeke heyata wî de hîç ti negatîfî û nelêtîyeke biçûktirîn jî nîn e, wî di hêlîna aîlewîya ku damezirandî de jî ev qiwama bilind jîyaye. Bi vê

nêrînê, ji bo çêkirina malbateke baş, em mecbûr in ku heyata malbatî ya wî ya ku bi sipehîtîyên mûstesna û bi şeref tije ye, rind bizanin û em wê ji bo xwe bikin nimûne.

Di rewşeke berevajî de ew civaka ku em têde dijîn, wê di şeklekî ji hêlînên germ ên ji hizûr û bereketê tije, mehrûm de her ku biçe wê bi nav navenda buhran û qeyranê ve bigindire, di hev de totlanî bibe.

Em tev dibînin ku gellek ciwanên me hene ku nikarin hêlîna malbateke rast û hevkêş damezirînin, bi jinberdanên ne di cih de hem dinyaya xwe, hem jî dinyaya zarokên xwe reş dikin. Ya wexîmtir jî ev e ku çendîn ğafil ji zewacê nêzîk nabin û di girdab û gera isyan, guneh û heramên di vê xusûsê de reben û perîşan dibin.

Ha ev berhema biçûka li ber destên we ku me ji bo van sedeman û sebebên wekî wan hazir kiriye, înşaellah ew jî -wekî berhemên dîtir ên ku di vê qadê de hatine nivîsîn- wê ji bo birînên malbatî yên di civaka me de bibe hetwane û merhemeke şîfadar.

Me bi vê xwezî û nîyetê berhem di bin van serdêrî û ser-mijaran de hazir kiriye:

**1. Di Îslamê De Nîkah û Malbat.**

**2. Mijarên Ku Divê Jin Di Nav Malbatê De Li Wan Miqate Bin.**

**3. Mijarên Ku Divê Mêr Di Nav Malbatê De Li Wan Miqate Bin.**

**4. Mijarên Ku Divê Jin û Mêr Di Nav Malbatê De Li Wan Miqate Bin**.[1]

**5. Li Dor Perwerdeya Zarokan.**

**6. Cihê Jinê Di Îslamê De û Hînkirina Keçan**

**7. Tesîra Îmanî Ya Dêyên Sultanan Di Medenîyeta Weqfan De**

**8. Paşgotin**

Berhem, bi awayekî giştî ji wan roportajan (hevpeyvin û sohbetan) hatiye meydanê ku ew di Kovara Şebnemê de hatine weşandin. Lêbelê têde îlawe/pêvek ên nû û ferehkirin jî pêkhatine.[2]

Di berhemê de wek xulase malûmat û agahîyên lazim ji bo malbateke hizûrdara ku wê li ser endaz û pîvanên Îslamî were damezirandin, cih digrin. Di zewacê de qaîde, rêzûrêç û prensîbên ji bo tehqîqbûna meqsedên bilind lazim hatine vegotin û mîsalên lazim û îzahatkar ên bi van re têkildar jî hatine guhastin û neqilkirin. Nimûne ji heyata hemû mezinên Îslamê bi taybetî jî di serê tevan de nimûne ji heyata Mezinê

1. **Not**: Ev kitêb, şeklê kurtkirina ji wê kitêba me ye ku bi aynî navî û wek ji heft beşan îbaret hatibûye weşandin.
2. Cenabê Heq, keda şagirtê giranbiha yê me Ûmer Farûq DEMÎREŞÎK ya ku di hazirkirina vê berhemê de çêbûye û ğeyreta M. Alî EŞMELÎ ya ku di teshîh û ferehkirina wê de bûye arîkar, bike sedeqa carîye!

me Pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- hatine dayîn. Bi vî awayî, li ber çavan hatiye girtin ku ji xwendevanên giranbiha yên me re dîtineke dîyartir û têgihiştineke berraq di her halûkarî de were dabînkirin.

Em ji Xuda temennî û nîyaz dikin ku vê berhema naçîz; hem ji bo mirovên ku hêlîna malbatê damezirandine, bi taybetî jî ji bo ciwanên ku ji nû ve wê hêlîna malbatê damezirînin bi havil û feydedar bike.

**Di van demên ku li temamê dinyayê hêlînên malbatê bi erdhej û zelzeleyên bêexlaqîtî, îhmalkarî û bêmehebbetîyê dihilweşin de Rebbê me, wê qudretê ji me tevan re bike nesîb ku em pê bikarin ji xwe re malbatên wisan sağlem, xurt û bi şîyan damezirînin û bidin jîyandin ku tiştek nikaribe wan bihejîne!. Xudayê min! Xanî û malên me bike cenneta mehebbet, hizûr û dilşadîyê! Ji bo vê cennetê jî derîyekî bi ber cenneta ebedî ve veke ku wê têde wusleta cemalûllah tecellî bibe!**

**Amîn..**

# Di Îslamê de Nîkah û Malbat



*Nîkah rêya pêğembera ye, sunneta Resûlûllah e, bihara neslê ye, şeref û edeba mêr û jinê ye, keleha namûs û îffetê ye, ew ji navbera heyber û mexlûqatên dîger cihêwazî û îmtîyaza însanî ye.*

*Seyda, di roja me de li ser zewacê gellek mûnaqeşe têne kirin. Berî her tiştî, ma însan mecbûr in ku bi awayekî civakî pevre bijîn? Ma heke ew bi tena serê xwe jîyana xwe bidin dewamkirin çênabe?*

Tenêtî û tekîtî ji Xuda tenê re taybet e. Lewra wî aferînerê bilind û mezin, yek û tekbûn kiriye keyfîyeteke ji bo xwe tenê û li ser vî esasî wî hemû heyber û mexlûqat cot; nêr û mê aferandine. Ji lewma hemû heyber, ji ber taybetmendîya cot bûna xwe ji hev re mûhtac in. Ji hêla ku ew di aynî zemanî de hatine aferandin ve jî, li gorî pêkhatin û çêbûna xwe di nav nuqsanî û nekarînekê de ne. Hemû heyberên ji ğeyrî Xuda ku navê “**masîwaûllah**” li wan tê kirin; di nav hezar û yek îhtiyacê de ne. Hem îhtiyaca wan bi hev û din heye. Hem jî ebedîyyen îhtiyaca wan bi Cenabê Heq ê ku her tişt ji tineyî anîye hebûnê, heye.

Ji navbera van mexlûqatan tevan jî, ji hêla mûhtacbûnê ve “**însan**”, adeta di serê tevan de tê. Lewra îhtiyac û daxwazên însanî, li gorî heyber û

aferîndeyên din hê zehftir in. Zêdebarî vê jî ev îhtiyac, tim û daîm zêde dibin û bi ti awayan xilas nabin. Lewra însan, tim û daîmî însan dixwaze wek maddîmanewî di nav rehetîyê de bijî. Diltengî, tinetî, jan, îzdîrab, êş û felaket jê re zor tên. Di van wextan de însan bi taybetî li destekî ku bi destê wî bigre û li dilekî ku xwe bavêje ber penaha wî, digere.

Li ser vî esasî kurê-adem, ji peyvên "**uns**" yan jî "**unsîyet**"ê yanî "ulfet û dostanî"yê hatiye peydakirin û navê peyva "**însan**" lê hatiye kirin. Ev jî şanî dide ku ew mûhtac e bi heyberên din re bi taybetî jî bi hevcinsên xwe re bibe yek û heval. Ev mûhtacîtî, taybetmendîya pêşîna însanî ye. Însan, adeta bi vê xusûsîyet û taybetmendîya xwe tê naskirin.

Rewşa ku ev heqîqet bi awayekî ji hemû awayan bariztir û xuyatir derdikeve holê jî pevrebûna mêrjinê ye. Ev xusûs, ji bo temînkirina berdewamîya neslan jî zerûreteke jêneger e, heta şert e.

Ji lewma ev zerûret, di candarên din de nêrmê, di terkîba kîmyewî ya heyberên bêcan de jî di sûretê zêdek (+) û kêmek (-) de tecellî bûye. Çawa di Qur'ana Pîroz de di gellek ayetan de ev mijar bûye mewzûbehs:

"**Me her tişt cot aferandiye da ku hûn bifikrin û îbret jê bigrin**." [3]

3. Zarîyat, 51/49.

**“Ez Ellah ê ku ji wan tiştên ku erd hêşîn dike, ji mirovan bi xwe û ji mexlûqên ku hê ew rastiya wan nizanin jî hemû cot aferandine, teqdîs dikim, pak didêrim**.”[4]

**“Erê, me hûn însan cot bi cot; jin û mêr aferandine**.”[5]

Keyfîyeta cot bi cot aferandina ku di van ayetan de hatiye zikrkirin ne ev e ku ji aynî heyberê du heb aferandine; lêbelê wekî ku li jorê jî hate zikrkirin her tişt, wek “nêr û mê” yan jî “zêdek-kêmek” hatiye aferandin. Heke na, aferîna yekî ji van fizûlî dibû, û fizûlî û nelazimîyeke wiha jî ji sifetê bilindê Cenabê Heq “**mûteal**” re, yanî ewê ku xwediyê hemû sifetên kemalê ye, re berevajî dibû. Bi kurtî wî ew cot bi cot aferandine, lêbelê wî di awayekî lihevçûyî de hîç ti cêwîyek neaferandiye. Di cêwîyên hêkeke tek de jî ji dinyaya hundurîna wan heta bi serê pêçîyên (telîyên) wan û heta bi çavên wan jî ew qeder alîyên wan yên ji hev û din ferqdar û cuda hene ku..

Welhasil Ellah Teala, heyber cot bi cot aferandine û qanûna cezb-kirin û hatin cezb-kirinê di navbera wan de bicih kiriye da ku ew jihevnêzîkatîyê bi hev û din re saz bikin. Bi vî awayî wî kemala maddî û manewî ya wan, bi yekbûn û pevrebûna wan ve girêdaye.

---

4. Yasîn, 36/36.
5. Nebe, 78/8.

Li dora vê heqîqetê îhtiyac û temayula mêrekî bi jinekê û ya jinekê jî bi mêrekî, bi qebûla cewhera xwe ji bo berdewamîya neslê ye. Lêbelê ğayeya tek, helbet ne ev e. Lewra bi pêkhatina malbateke sağlema ku were damezirandin hizûra rûhî û îctîmaî ya ferdan, aramî û ahenga wan jî heta bi dereca paşîn ğaye û hedefeke mûhîm e ku îhtiyaca kurê-adem pê heye. Di gihiştina vê hizûr, aramî û ahenga rûhî de jî zirweya ku tê arzûkirin însan sade û sade dikare bi “**mehebbetûllah**”îyê bigihêjîyê. Yanî bi îşqê berê xwe dana qelb bi alîyê Cenabê Heq ve.. Ev, ji Leyla’yê bi ber Mewla ve rêwengîyek e..

Yanî ji bo vê rêwengîyê -heke tabîr caiz be- Leyla şert e. Lewra mehebbeta di navbera mêr û jinê de merhela yekema bi mehebbetûllah’ê nêzîkbûna ji Cenabê Heq teşkîl dike. Lewra mehebbet, çendan bi arzûyên nefsanî destpê kiribe jî heta mirov ji wê nebûre ew nabe “**evîn**”. Evîn, navê hev-kişandina tecellîyatên îlahî ye li ser mirovên ku têne hezkirin.

Ew qelbên ku navenda hêza kêşanê ne, bi wesîla hevserên ku bi mehebbetê bi hev û din ve hatine girêdan adeta antremanên (hîndekarîyên) sewdayê dikin û bi vî awayê ku ji mehebbetûllah’îyê re hazir dibin qabilîyeta hezkirina ji Xuda qiwamê qezenc dike. Bi zarokên ku fêkîyekî siriştî yê malbatê ye jî ev qabilîyet hê bêhtir kamil dibe û li lîyaqetê vedigere.

Ha bi vê lîyaqetê,zewac ji bo mehebbetûllah dilan hemêz bike lazime ku mirov bi xebera fermanên îlahî bike û wilo wê tehqîq bike. Zewaceke ku sade bi arzûyên aqilî û nefsanî, bi hewes û temayulan tehqîq dibe -bi pirranî- fêkîyê mehebbetê hasil nake. Ji lewma di hêlînên ku wiha hatibin damezirandin de kemal û gihana manewî û perwerdeya mehebbeta qelbî ya ku ji zewacê tê hêvî-kirin nayê cih û tehqîq nabe. Yanî dil bi awayê layiq nikare îstîfade bike. Lewra însan di zewacên wiha de, bi gelemperî ji îştah û arzûyên nefsanî û erotîk re dibe kole. Ji xwe tu ji pêşveçûna manewîyatê behs neke, dinyaya dilî ya wan hê bêhtir bi şûn de dimîne, ziwatir dibe û heta bi bêesilîtîyê jî digihe.

Ew zewacên ku ji bo gihan û bilindbûna manewî, yanî ji bo temambûna nîvê dîn dibin wesîle, ew wê sewîye û asta îdeala ku divê mirov bigihîyê, nîşan dide. Çawa ku heke tiştek temam bidest nekeve, terfê ku were bidestxistin jêneger e, aynî wisan divê herkes bi qasî hêz û taqeta xwe ji bo temînkirina van sifetên îdeal kar û xebat bike û ji hewldan û xebatkirina ji bo wan jî xwe li paş nehêle. Bes mirov bi xêra vê, bi wê hizûr, aramî û kemala ku bi wesîla zewacê tê arzûkirin, digihe.

Digel vê jî wekî ku me qasekê berê îfade kir, pevbendîya di navbera mêr û jinê de di qabilîyet û lîyaqet qezenckirina însanî ya ji bo mehebbetûllah'îyê de, ne tekane sebeb e. Lewra heke rewş wiha bûye

hingê ezeban, di hêla gihan, kemal û pêşveçûna manewî de hîç ti encamek bidest nedixist û ew li cihê xwe rawestayî diman. Haleveku di navbera wan de gellek mêr û jinên salih û salîha hene ku Qur'ana Pîroz medhê wan dide, her wekî Hezreta Meryemê[6] û Hezretê Îsa -eleyhima-sselam-. Ev hal nîşan dide ku sermayê herkesîdi pêkhatina aferîna wî de ne yek e û şertên derveyî yên ku bandorê li wî dikin jî ne aynî ne. Yanî di çarçoveya programê qedera îlahî de di şertên dinyayê de wek îmtîhaneke ku qezencên wê mezin in kar û qezenc hatine teqdîrkirin. Naxwe (bi mûcibê wê programa qedera îlahî) ji bo hinek mirovan rêya qismet û nesîb girtî ye. Ji bo hinek mirovan jî hinek rewşên ji zewacê re astengkar û bêîmkanî-

6. Navê Hezreta Meryem 34 caran di Qur'ana Pîroz de de - bas dibe. Ji bilî vê navê wê di şeklê Îsa bin Meryem de jî 23 caran derbas dibe. Bi îlawe li ser van Qur'ana Pîroz navê sûretê nozdehemê xwe jî wek «**Sûretê Meryem**»ê bi nav kiriye. Hezreta Meryem, tekane jin e ku di Qur'ana Pîroz de bi navê wê bi xwe behsa wê hatiye kirin. Di vê xusûsê de mûfessiran bal û diqqet kişandiye ser hinek hikmetan. Çendek ji van hikmetan wiha ne:

a- Di wê serdemê de jin biçûk dihate xistin, îmaja wê di şexsa dêya me Hezreta Meryemê de hatiye bilindkirin.

b- Pêğemberekî Ûlu'l-azm bi wasîteya dêya wî jê hatiye behskirin, ev jî ezameta şerefa dayîktî/makîtîyê destnîşan dike.

c- Dêya me Hezreta Meryem bi taybetî dêhn hatiye kişandin li ser îffeta wê, bi kirp hatiye îfadekirin ka îffet ferzeke çi qeder mûhîm e, û divê mirov çi qeder îffetê biparêze.

d- Di şexsa dêya me Hezreta Meryemê de bariztirîn taybetmendîyên jineke salîha hatine îfadekirin, bi awayekî îşaretkî daye zanîn ku taybetmendîyên wekî îffet, weqûrî, sebr, tewekkul, teslîmîyet û metanet jinê li cem Heq Teala bilind û mezin dikin.

tî hatine teqdîrkirin. Ji bo hinek mirovan jî zewac bûye xusran û îzdîrabeke mezin. Cenabê Heq, heke ew sebr bikin ji bo bendeyên xwe yên wiha hinek qabilîyetan îhsan dike û bi arîkarîya van qabilîyetan jî feydên ku divê bi zewacê werin bidestxistin belkû dibin ku hê zehftir werin temînkirin. Çawa ku digel hinek mirov ezeb in jî bi mehebbeta zêde'ya ku ji heywan û giyayan re şanî dane ev mekteba kamilbûn û manen bilindbûnê temam kirine. Hinek mirov jî li hemberî mûsîbet, îbtîla, kul û keder û tengasîyan sebr û tehemmul şanî didin û bi vî awayî yek bi yek pêpelingên bilindahîyê derbas kirine. Mesela di serdema esrê seadetê de di eshabê suffe de ku wan derfeta zewacê nebûye, lêbelê ew bi xizmeta îlm û îrfanê bi zirweya kemalê gihane. Tabîî ye ku ev rewş tev, halên taybet û awerte ne. Rastîya gelemperî û şert ev e ku divê însan bi eqda nîkahê zewacekê bike û ji bo xwe hêlîna malbatekê damezirîne, çêke.

Ev jî heqîqetek e ku ew qelbê mehebbet û hezkirin xwe têde nedin xuyakirin, wekî zevîyekê ye ku zemanekî dirêj ew beyar maye, nehatiye ajotin û çandin, têde dar nehatine çandin, yanî ew hatiye şemirandin. Têkilî û mûnasebeta di navbera mêr û jinê de wê vê ax û zevîyê bajon û sağ bikin.Tabîî ye ku ne bi van arzûyên nefsanî, lêbelê divê ew bi berterefkirina wan bibe. Yanî alîyê vê têkilî û elaqeyê, mecbûr e ku berê wê li îşqa îlahî be. Lewra mehebbeta di navbera mêr û jinê de, bes dema bi cewhera îlahî wergere, hingê wê dil bi mehebbetûllahî'yê bilind bibin. Heke di qi-

wameke wiha de ewlad bi nesîb bibin, ev jî, merhela duyema qelbî di rêya mehebbetûllahî'yê de pêktîne. Di piştî wê de hevser, hevdost, seyda û yên wekî van, tên. Bi vî awayî qelb, merhele bi merhele, gav bi gav bipêşve diçin û bi ğayeya ji hemû ğayeyan bilindtir bi mehebbetûllahî'yê re temam dibin, têne stranê û dikevin nav bendeyên bextiyar ên ku Heq ji wan hez dike. Ha ev netîce, zirweya ğayeya aferîna însên e.

Bi kurtî aîle ku navê pevrebûna mêr û jinê ya dînî û îctîmaî ye, ew heqîqet û îhtiyaceke ku di aferîna me de hatiye danîn ji bo ev ğayeya ulwî tehqîq bibe. Çi qeder ev heqîqet tehqîq bibe dara malbatê, çiqilan dide û ew qeder mezin û fereh dibe. Ew fêkîyên xweş û şîrîn dide. Hizûr, aramî, sakintî, nîzam û risteya ku di nav civakê de tê arzûkirin jî çend heb ji van meyweyan e.

Li ser vî esasî ji bo civak bigihîje sewîya medenî û hêlîn jî bi coş û seadeteke îlahî tije bibin di serê xusûsên ji hemû xusûsan mûhîmtir de jî weset û hawîra malbatî ya bi hizûr, tê. Ji lewma dema mirov malbatê ava dike mêr û jin li ser navê Xuda soz û peymanê didin hev. Ev soz û peyman hewldana nîyetê ye ji bo tehqîqkirina mehebbetekê ku ew jî di alîyê ğayeya aferîna wan de ye. Tişta ku vê nîyet û hewldanê xwedî dike jî hîç guman nîn e ku li hemberî hev rêz, pevbawerî û semîmîyeta dualî ye..

## *Îslam, çawa li "malbat"ê dinêre?*

Îslam, li ser esasê wan karên ku me zikr kirin, ewên ku mirov nikare wan li ber çavan negire, ehemmîyeteke mezin bi malbatê dispêre. Li gorî vê malbat, di mesabeya tuxmê civakê de ne. Çawa ev heqîqeteke tarîxî ye; ew malbatên ku li ser bingehên sağlem hatine damezirandin, ew pêkhatina civakê diparêzin û wê sipehî dikin; ew hevserên ku bi nêrîna rûhî ji hev re ne hevkuf bin, yanî ew hevjînên ku ji hev re ne hevkêş bin û bi mûnasebetên xirab, yan jî ew hêlînên ku bi awayekî şaş hatibin damezirandin, civakê diherifînin..

Ji vê hêlê ve Îslam, li ser esasê mehebbet û pîvanên heq ên ku danîne, pêkhatina malbateke dilşad û hevhêş dadimezrîne. Yanî bi malbatê hedefa wê hizûr û dilşadî ye. Ew qeder hizûr û dilşadî xwestiye ku hatiye gotin:

"*Cenneta însanî mala wî ye*.."

Bi rastî hêlîn-malbateke ku bi pîvanên îlahî hatibe damezirandin di nav şert û mercên dinyayê de adeta cennet e.. Têgihiştin û pêkhatineke wiha bilind jî, helbet ji ber ku ew li ser bingehên meşrû û pîvanên bilind û mehebbetê mûmkin dibe Îslam, bi "**hev-ahidbûnê/ji hev re peyman-dana dualî**" wekî nîkahê bilind dest bi kar dike. Yanî Îslam li ber herdu terefan şert û merc datîne ku her dualî li hizûra Xuda bi navê Xuda hinek soz û peymanan bidin hev.

Bi îfadeya mirovên berê hatiye gotin; “di nîkahê de keramet heye.” Ev jî di tesîskirina malbata bi hizûr û dilşad de giringîya nîkahê û feydeyên ku ew dide qezenckirin şanî dide. Lewra qîmetê amelan li gorî nîyetan e.

Berî li holê danîna nîyeteke wiha ulwî pevrebûna ku li derveyî nîkahê bicih tê, ji ber ku ji ğayeya aferîna însanî re dijber e, netîceya wê jî wê tam ji xusran û herifînê îbaret be. Gerek bi nêrîna pêkhatina aîlê, gerek jî bi nêrîna milletî wiha ye. Ji lewma pevrebûna li derveyî nîkahê ji terefê dînî ve hatiye redkirin û li cem Heq jî heta tu bibêjî bes cezayê wê giran e, pirr xeternak e û ew wek gunehekî mezin hatiye heramkirin.

*Li ser esasê giringîya wê, hûn dikarin ji kerema xwe hinekê bêhtir mewzûya nîkahê îzah bikin?*

Nîkah rêya pêğembera ye, sunneta Resûlûllah e, bihara neslê ye, şeref û edeba mêr û jinê ye, keleha namûs û îffetê ye, ew ji navbera heyber û mexlûqatên dîger cihêwazî û îmtîyaza nesla însanî ye. Yanî di serrebûn û çêtirbûna wî ji mexlûqatên din e.

Tehqîqbûna nîkahê bi şahidîya du mêran, ji bo îlankirina ji herkesî re ye ku di îctîmaîbûna (sosyalbûna) pevrebûna mêr û jinê de unsûr û regezekî bingehîn e. Lewra îhtiyac pê heye ku ew pevrebûn

ji alîyê mirovên din ve jî were zanîn. Li holê danîna her nîyetê, her dem îhtiyaca wê bi şahidan nîn e. Lêbelê di zewacê de şert-danîna şahidan, ji bo tehqîqkirina vê qebûlkirinê ye ku eqda nîkahê berê wê li temamê civakê ye. Lewra ew keç û kur ên ku wek bekar-bakîre û ezeb têne zanîn ji bo her yekî ji wan bûna talebên nû mûmkin e. Lêbelê di piştî zewaceke ku bi eqda nîkahê hatibe îlankirin û banghildêran de êdî talebên mûhtemel ji bo wî mêrî û wê jinê hatine xilaskirin, bi vî awayî çêbûye ku bingehên hêlîna malbateke sağlem a ku hevseran sade dixe aîdê hev, hatiye avêtin.. Ji bo vê ye ku bi nêrînekê, heke bi du şahidan neyê beskirin û dawet û dîlan jî were kirin hingê wê komeke mirovan ji bo eqda nîkahê bibe şahid. Ji lewma dawet-dîlan, ji meqseda îlankirina eqda nîkahê ya ji bo herkesî dize, di aynî zemanî de têde parvekirina memnûnîyeta damezirandina hêlîneke bi hizûr jî heye.

**Welhasil** nîkah bi hemû taybetmendîyên xwe ve, di alîyê parastina heysîyet û pêkhatina çêtira di aferîna însanî de qanûneke îlahî ye ku fermana wê li me hatiye kirin. Ji lewma li gorî Îslamê nîkah, bingeheke mûezzam û jênegera malbatê ye ji bo berdewam û gihandina neslê, terbîya ewladan, mûhafeza malbatê û parastina heysîyeta însanîyetê.

Îslam ew qeder giringîyê bi vê bingehê dide ku hemû mûnasebetên rizîyayî û sefîl ên ku sû-a qesdê lê dikin jî red dike. Li ser vî esasî kirina “**zina**”yê

ku rezaleta ji hemû rezaletan xirabtir a li derveyî nîkahê ye, wek herameke ji hemû heraman girantir hatiye qedeğekirin. Lewra ew rewşa mekroh; êrîşeke dîn û harane ya li dijî zarafeta nîkahê, ciwanîya wê û meşrûîyeta wê ye; cînayeteke ji hemû cînayetan zalimtir û bêwijdantir e ku ew neslekê tine dike. Bi qasî guherandina dinyaya hizûr û seadeteke bilinda wekî nîkahê, bi zirardariya fihûş û zinayê ehmeqtî û cehaleteke dîtirçênabe.

Çênabe ku milletekî bi fezîlet û kolan û sikakên memleketê wî ji dîmen û menzarayên rezaletan re bibin dik û sehne. Meydan ne ew cih in ku di wan de bêexlaqî tê bi xerman û girîş kirin.

Divê neyê jibîrkirin ku unsûrê bingehînê ku milletekî li ser pêyan radigre, pêkhatina dînî û exlaqî ye. Di vê pêkanîna exlaqî û parastina wê de jî rêya ji hemû rêyan bi bandortir jî nîkah e. Ji lewma di xusûsa zor nekirina wê de pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- ummeta xwe îqaz kiriye, wiha gotiye:

"*Nîkaha bi xêrtirîn, ya bêkulfet e.*" [7]

Ji lewma adetên wekî next-qelen, heq-şîr û rûvekirinê ku ji nîkahê re kulfet in, yanî zor û barekî zêde ji nîkahê re tînin, ev bi temamî tetbîqatên batil û pûç in û ev hemû jî kevneşopî û beremayên serdema cahilîyetê ne.

7. Ebûdawud, Nîkah, 32.

Cenabê Heq, ji bo bendeyê xwe jîyaneke bi îffet û bi hizûr arzû dike. Tişta ji hemû tiştan sipehîtir a ku îffetê temîn dike jî helbet zewac e. Çawa ewên ku di nava civakê de taqeta wan hebe ji bo bizewicin divê ew bizewicin, aynî wisan ewên ku taqeta wan nebe ji bo bizewicin jî zewicandina wan wezîfeyeke dînî ye ku li ser civaka Îslamê hatiye barkirin.. Çawa Xuda di ayeta pîroz de gotiye:

"**Ji navbera xwe nezewiciyan; ji koleyên xwe û qerwaşên xwe yên ku qencîkar in, bizewicînin. Heke ev, xizan bin, Ellah dê ji ciwanmêriya xwe wan dewlemend bike. Lewra Ellah** (bi lutf û rehma xwe) **berfereh û zana ye**."[8]

Di dewleta Osmanîyan de ji bo vê xizmeta xêrê weqfên taybetî hatibûne damezirandin. Lewra nîzam û exlaqê civakê bi jîyîna hizûrdara bi îffeta ferdan ve girêdayî ye.

Hezretê Mûhyeddînê Erebî -quddîse sirruh- di bara fezîleta teşwîqkirina nîkahê û arîkarbûna ji bo zewicandina wan de wiha dibêje:

"*Sedeqa carîye'ya ji hemû sedeqeyan çêtir, wesîle-bûna ji bo zewacê ye. Lewra ew kesên ku ji nesla wan tên çi qencîyê bikin ji bo wî mirovê ku ji wan re bûye wesîle, ecrek heye.*"

Lewra ew jîyana malbatî ya ku li cennetê bi bavê me Adem -eleyhisselam- û dêya ma Hewwa'yê dest-

8. Nûr, 24/32.

pê kiriye, ew bi qanûna îzdîwacê ya ku Ellah teqdîr kirî ji zaroyên Adem re jî întîqal kiriye, hatiye û ew bi dînê Îslamê jî hatiye bi ebedî-kirin. Bi rastî dînê Îslamê bi qaîdeyên ku danîne, jîyana malbatî bûye hizûreke bihiştê û bûye asîmanê rahmeke biharî. Ji bo gihiştina vê seadetê, zerûrî ye ku mirov bi qanûna nîkah û îzdîwacê re temaşegeha her yekî ji Adem û Hewwayê raêxe ber çavan û mirov her wekî wan bi hev û din ve bikele û di rêya mehebbet û teqwaya Xuda de adeta bibe yek-can û yek-nebz.

Bi nîkahê, bi awayekî heyretamîz di pev-kelîn û pev-xweşbûna du mirovên bîyanî de gellek ders û hikmet veşartî ne ku aqilan dixin dehşet û sosretê. Du ciwanên biyanî yên ku ji mala dê-bavên xwe cuda dibin û bi mehebbet û merhemeta ku Xuda ji bo navbera wan lutf dike, dilên wan bi hev û din ve têne girêdan, ew di nav germahî û cazîbeyeke ew qeder semîmî de dijîn ku ew hêlîna dê-bavan ya ku jê cuda bûne jî di ber sihê de dihêle, tescîla çi hikmeteke ulwî ye.. Derseke çi qudsî ye ku divê mirov kûr kûr li serê tefekkur bike.

Cenabê Heq nîkah ji bo ummeta Mûhemmed xistiye wesîla bereketê; îzdîwaceke di bin sîbera kîtab û Sunnetê de xistiye bihişta (cenneta) dilşadîya (seadeta) jîyana dinyayê.

Ji xwe dînê Îslamê dixwaze jîyaneke bi rûmet û weqûrane bi însanîyetê bide jîyandin, bihayê ji hemû bihayan bilindtir daye jinê û îşaret bi zirarên

ku ji îhmalkirina wê biwelidin jî kiriye. Jin wekî çirayeke billûr û camî ye ku bi qarçiqa hizûr û seadeta malbatî ve hatiye daleqandin. Ew bi feyz û nûra nîkahê civakê rohnî dike. Îffet û namûsa malbatê diparêze. Heke tabîr di cihê xwe de divê ji bo malbatê li hemberî girdab û erozyonên masîyet û gunehan paratonerek (birûskgîrek) hebe. Di rewşeke berevajî de wê nesl zayî bibin û ewê bibin kêstek û enqaza însanî. Zayî-bûna neslê jî ewê heta bi îlğa û îbtala eqrebatî û ev jî wê di dawîyê de heta bi herifandina civakê jî here.  Di vê teqdîrê de fitne wê bi dûpişk bibe. Hestên tenik û zarîf wê xilas bibin. Rezalet û bêhizûrî jî wê bi ser ve birijin û tuğyan bikin. Ev jî ji bo civakekê elametên noqavbûn û berateyên felaketê ne.

Seadeta jinê, bi jîyîna wê ya wek serdar-xanimê mûmkin e. Heke jin berê xwe bide ser wezîfeyeke li derveyî wezîfa esilîya xwe hingê hêlîna malbatê ziwa dibe. Beşdarî-kirina jinê di jîyana derveyî de bes bi sebebên zerûrî û ji bo karên ji aferîna wan guncaw re mûmkin dibe. Ev sebebên zerûrî jî divê bi awayê objektîf (afaqî) werîn nirxandin. Yanî divê bi pîvana îhtiyacên civakê were dîyarkirin û divê sînorên rewa û maqûl neyên derbaskirin. Ew tixûbên ku bi hewesên pûç û mazeretan werin binpêkirin sade xapandin û xwe xapîn e ku netîceyên wan tim bi xusranê dertên. Çendîn keç-xanim ên me hene ku bi vî awayî di girdab û gera ğefleta axirzemanî de winda bûne û çûne. Çendîn çav hene, bi rezaletên

ku serê wan bi avezêrîyan hatine nixumandin hatine xapîn, li pêşberî heqîqetên îlahî kor bûne û dilê xwe bi seadeta xwe neşewitandine.

Divê were zanîn ku xanim di nezara Îslamê de di nav avîzeya billûrî ya nîkahê de her yek ji wan îksîreke jîyanê ye ku pirr bi şewq û tav rohnî didin. Nasname û îhtîşama jinê ya exlaqî, rewîştî, îctîmaî û neteweyî/qewmî, bes jîyîna wê ya di nav rûhanîyeta nîkahê de ye. Jin bi xêra hêlîna ku bi nîkahê tê avakirin dikeve nav dinyayeke nipûnû. Belkû ew digel mêrekî ku berê hîç nas nekirî û bi temamî jê re mechûlbi ferdên malbata wî re di navberekê de dest bi jîyanê dike. Lêbelê xusûsîyeteke cuda heye ku Xuda ew ji zewacê re lutf kiriye. Ew herdu cotên ku bi xêra nîkahê hatine cem hev, berê ew du însanên ji hev re bîyanî û ğerîb bûn ji nişka ve ew dibin du însanên ku li dinyayê ew ji her kesî bêhtir ji hev nêzîk în.. Ew hêlîna ku wan çêkirî jî di pirranîya caran de ji wan re ji mala bavan ya ku jê cuda bûne, hê germtir tê. Çawa Rebbê me di ayeta pîroz de dibêje:

“**Yek ji nîşanên hebûn û yekbûna Xuda ye ku wî ji we re ji cinsê we bi xwe hevser aferandine da ku hûn ji hev re çavnas bibin û di navbera we de hezkirin û merhemet peyda kiriye. Bi rastî di vê de ji bo milletekî ku bifikirin, çendîn îbret hene**.”[9]

9. Rûm, 30/21.

Naxwe ji bo seadeta di nava malbatê de divê tekane unsûrê zal û hakim mehebbet, semîmîyet û şefqeta di navbera hevseran de be.

*Di her hêlînê de bidestxistina vê seadetê mûmkin nabe. Naxwe divê gihiştina vê seadet û hizûrê nîmeteke mezin be... Ji bo vê divê mirov dêhnê xwe bide ser çi?*

Ji bo çêkirina hêlîneke wiha bi hizûr, şertê pêşî ew e ku mirov di bijardina hevserê de bi hessasîyet wan qaîdeyên ku Îslamê danîne li ber çavan bigre. Cewhera van qaîdeyan ev e: Kesên ku ji bo xwe hevseran dibijêrin; divê hevserên xwe ne bi sebebên wekî sipehîtî û zengîntîyê yên berwext û li xweşîya nefsê diçin tercîh nekin û nebijêrin. Lêbelê divê ew giranîyê bidin ser wesfên bingehîn ên manewî yên wekî îman û exlaq û li gorî wan tercîha xwe bikin. Di vê xusûsê de Hezretê Pêğember -sellellahû eleyhî we sellem- wiha gotiye:

"*Jin, ji bo çar tiştan yanî ji bo malê xwe, sipehîtîya xwe, bavikê xwe û kemala xwe ya di dîn de tê nîkah kirin. Hûn ya dîndar tercîh bikin ku destên we xêrê bibînin!..*" [10]

Divê mirov ji vê heqîqetê hereket bike; ya hêlînê çêdike çûka mê ye. Hedîseke şerîf, hem wê xusûsîy-

10. Buxarî, Nîkah, VI, 123; Mûslim, Rada, 53.

etê îşaret dike; ewa ku mirov bi kîjan jinê re bizewice divê mirov li wê xusûsîyetê bigere ka ew têde heye, yan jî nîn e, hem jî ew behsa wê xusûsîyetê dike, ewa ku mirov bi kîjan mêrî re bizewice, îcab dike mirov lê bigere ka ew xusûsîyet di wî de jî heye yan nîn e.. Lewra ji bo her mûmînî, di piştî teqwayê de nesîbê ji hemû nesîban bi qîmettir amelê salih/amelê sipehî yê wî kesî/wê kesê tê ku mirov dê pê re bizewice. **Mêrê salih sitûnê nehej ê seraya hizûrê ye; jina salîha jî bi qîmettirîn tezyînata bexçeyê seadetê ye**. Pêğemberê Xuda vê heqîqetê di hedîsa şerîfa xwe de wiha îfade dike, dibêje:

"*Bilindbûna însanî di dînê wî de, muriwwet û şerefa wî di aqilê wî de, sipehîtîya nijad û sulaleya wî jî di exlaqê wî (yê ku bi nîkahê tê parastin) de veşartî ye*." [11]

Hevkufîyeta di navbera malbatan de jî yanî hevkêşî her divê li ber çavan were girtin. Ev hevkêşî; divê bi nêrîna li unsûrên curecur ên wekî zengînî, pevrebûna kevneşopî û kulturan were dîyarkirin.

Piştî vê jî bi îrade û kemalê ve bend e. Kemal, bi mûkemmelîyeta îman û amelî; îrade jî bi xwe pêgirtina bi ferman û qedeğeyên Îslamî tê cih.

Hêlîna malbateke hizûrdara ku di navê de ferman û qedeğeyên Xuda li ber çavan têne girtin, bingeha seadeta dinyayê û yek ji mezintirîn îhsanên

11. Darequtnî, III, 303; Beyheqî, Şûab, IV, 160.

Rebbê me ye. Dewama vê nîmet û seadetê, di jîyîna herdu terefan ya di nav keş û hewaya rûhanîyetê de ye. Ev jî bi fedakarîyên dualî û bi hev-fehmkirina dualî ve bend e.

Di roja me de di serê sebebên mûhîm ên ku malbat li erozyonê dikeve de; "**bi mêr-bûna jinê û bi jin-bûna mêr**" tê. Ellah Teala ji jinê re xusûsîyetên cuda, ji mêr re jî xusûsîyetên cuda lutf kirine. Ev jî, ji bo herduyan wisan hatine pêkanîn ku ew karibin bi awayê layiq wezîfa xwe di nav civakê bicih bînin. Ji pêkhatina bedena wan bigre heta bi taybetmendîyên gîyanî û rûhî yên wan hemû xusûsîyetên aferîna wan, di mêr û jinê de li gorî mesûlîyetên (berpirsîyên) ku Xuda li wan bar kirine, hatine pêkanîn. Ev rewş, di mêrê de li hawîrdora sağlemîya rûhî, berxwedêrî û taybetmendîyên bedenî derketiye holê ku ew bi temînkirina debara malbatê hatiye wezîfedarkirin. Ev jî vê mesûlîyetê li mêr bar dike ku divê ew bibe serdarê malbatê, ji bo malbatê mûcadela heyatê bike û debara malbata xwe temîn bike.

Jin, berpirsîya temînkirina debara malbatê neketiye ser milê wê. Heke ew berpirsî ketibûya ser milê wê, ev ji bo wê dibû ezîyet û meşeqqet. Lewra aferîna wê, wek rûhî û bedenî ne li gorî mûcadela heyatê ye. Berî her tiştî ev wezîfa îlahî li jinê hatiye barkirin ku ew vê hissê pêwîst dike; divê ew ji zayîna zarokan û ji zayînê pê ve jî li zarokên ku wê ji vê pevrebûnê hasil bibin bi taybetî di dewreyên nekarîna

wan de li wan binêre û wan biparêze.. Lêbelê heke îmkan û şert firsendê bidinê hingê jin dikare xizmeteke ji aferîna xwe re guncaw, rewa û aîdê jînîtîya xwe bike. Her wekî xwacatîya fêrgeha Qur'anê ji bo keçan û meslekên wekî vê..

Ev hemû taybetmendîyên aferînê yên ku berhema tayîna îlahî ne, ji bo mêr û jinê nasnameyeke cuda cuda û hevtemamker dide qezenckirin ku dema hevser birijin ser meslekên li derveyî van taybetmendîyên xwe hingê wê seadeta malbatê li zeîftîyê bikeve.

Divê em vê xusûsê jî bibêjin: Divê otorîteya mêr di nav malbatê de wek "tehekkum" (hukm sepandina bi darê zorê) û îtaeta jinê jî wek "esaret" neyên fehmkirin. Heke ev rol, di nav endaz û pîvanên nezaketê yên ku Îslamê bi awayekî hessas tayîn kirine de bicih werin hingê di malbatê de kes nabe "zalim" û kes nabe "mezlûm" jî..

Heke jin ji daîreya îffet û îtaeta xwe derkeve û zulmê li mêrê xwe bike, li hemberî vê jî zilam jî rabe otorîteya xwe ji bo arzûyên nefsanî yên xwe bikarbîne, hingê ewê hêlîna malbatîya xwe texrîb bikin. Lêbelê ew mêrê ku ji bo mûcadela heyata dinyayî fermanber e, dibe ku ew dem bi dem li ber hinek alozîyan rûbirû bimîne. Di demên wiha de heqê mêr û îhtiyaca wî heye ku li mala xwe ew ji xanima xwe îtaeteke teskînkar, bi şefqet û mehebbet bibîne. Bi aynî awayî ew jina ku heta êvarê li mala

xwe çavnêrîya mêrê xwe dike jî heqekî tabîî yê wê û îhtiyaca wê heye ku ji mêrê xwe elaqe, îltîfat û peywendîyê bibîne. Ji bo vê ye, di malbatê de divê herkes heq û mesûlîyetên ku Xuda jê re tayîn kirine, bizane. Di nav malbatê de divê mêr dilovan, bi merhemet û heqnas be; divê jin jî sernerm, dilovan, îtaetkar, xatirnas û hurmetkar be.

**Welhasil** tekane qaîde ku hêlînê di nav hizûr û seadetê de dide dewamkirin hezkirin û hurmeta hevber û dualî ye. Lêbelê divê neyê jibîrkirin ku bav û kalên me gotine; "çûka mê hêlînê çêdike." Bi vê nêrînê, di xusûsa xwedîtî-kirina li hêlînê de jinê, xwe xistiye bin roleke bi tesîrtir. Ji lewma fîraset (pêhis û têgihiştin), ğeyret, hewldan û fedakarîya ku jin wê di vê nuqtê de şanî bide ji ya ku mêr wê şanî bide giringîyeke zêdetir erz dike. Lewra Cenabê Heq, di vî warî de lîyaqet û hissîyateke çêtir ji ya mêr ji dê re bexş kirine.

Li ser vî esasî Hezretê Îsmaîl Heqqî Bûrsewî, dema peyva «**et-teraîb**»a kudi ayeta heftan ya sûretê Tariq de derbas dibe îzah dike wiha dibêje:

"*Heke zarokek bi ber lehîyê bikeve, çi qeder xeternak dibe bila bibe dê jî her xwe diavêje nav lehîyê û ji bo zarokê/a xwe xilas bike canê xwe li holê datîne û tevdigere. Lêbelê bav nikare hereketeke wiha nîşan bide. Heke wî hêvîya xwe ji wî zarokî qut kiribe, ew li kenarê lehîyê bes bi ğemgînî digrî.*"

Tabîî ye ku qiwameke wiha ji bo wan dêyan e ku qabilîyetên bilind ên di aferîna xwe de winda nekiribin. Heke na, hinek dêyên bêwijdan, bêgîyan, bêrûh û ğeddar jî hene ku zarokên xwe li kenarên goristanan û li ber derîyên mizgeftan jî terk dikin. Lêbelê evên ha, xwedî gîyanên wêran in û wan mezîyetên bilind ên di aferîna xwe de tine kirine, kuştine.

Di merc û şertên asayî (normal) de hesta dayîktîyê, bi ti awayan nikare zirarê bi ewladê xwe, yan jî zarokê xwe bigihîne û qîmî wan bike. Ev hesta bilind, heqîqeteke îlahî ye ku mirov heta di heywanan de jî jê re dibe şahid û wê dibîne. Çawa ev mîsala bi îbreta ku di kişandina belgefilmekê de hatiye tesbîtkirin jî tescîleke zehf rohn û eşkereya vê heqîqetê ye:

Di Parka Siriştî ya Sambûra Kenya'yê de di navbera tarîxên 21ê berfenbara (aralık) 2001'ê û 1-2 rêbendana (ocak) 2002'yan de şepaleke (şêredêya) û kehr-ğezalek di dereceyeke heyretamîz de di navbera elaqa dê-çêlîka wê de dibin. Kehr-ğezal dema yekcar di kamerayan de dixuyê hê bendê navikê li serê bûye. Dilê şepalê pê şewitiye û adeta ew ji xwe re bi ewlad kiriye. Kehr-ğezal jî ji ber elaqeya germa şepalê nikare ji wê veqete. Ji ber ku neşê şîr bidiyê hewl dide xwarinê bidiyê. Şepal ferqê dixiyê ku ew kehr-ğezal e, lewra hîç hewl nade ku wê bi goşt xwedî bike. Heta di zarfa vî zemanî de digel ku ew şepal zeîf bûye jî dîsa ranabe naçe nêçîrê. Digel

vê jî herdu jî tendurust in. Yanî kehr-ğezal, digel ku şîrê dêya xwe venaxwe û şepal jî digel ku dernakeve naçe nêçîrê her çendî zeîf bûbin jî çalakgerî û zindîtîya wan di cihê xwe de ye.

Di vê navberê de ğezala ku li kehr-ğezala xwe digerîya jî serê wê ji nişka ve derdikeve û tê. Dema ew kehr-ğezala xwe di ber hîmayeya şepalê de dibîne, şaş û metel dimîne. Ew neşê jê nêzîk bibe. Lêbelê ew neşê ji wir veqete û biçe jî. Ew ji dûr ve dengan derdixe û wilo ew û kehr-ğezala xwe hev û din fehm dikin. Bi vî awayî, ew bi kehr-ğezala xwe re têkilîyê saz dike. Heta ew pev re diçêrin. Lêbelê ev, di bin kontrol û çavdêrîya şepalê de bicih tê. Lewra ew bi temamî ji bo kehr-ğezalê bûbû xwedî û jê re aşna û çavnas bûbû. Ji bo vê, bi wê ne xweş bû ku ew jê cuda bibe. Lêbelê ji bo derketina wê bi dêya esilîya wê re deng dernedixist madem ew nediçû cihên dûr. Lêbelê heke kehr-ğezal zêde vebe, ew mûdaxele dike. Lewra ew pirr ji kehr-ğezalê hez dike. Ew qeder jê hez dikir ku bi zimanê xwe ew mis dida, guhên wê dialîstin, gurmik û dêmên xwe bi serê wê dihekandin û dibir û dianî. Lêbelê di dawîyê de divê di hinavê şepalê de hissa ku kehr-ğezal ya dêya xwe ğezalê ye, ğalib bibe ku di dawîyê de xatir ji kehr-ğezalê dixwaze. Ew wê bêhn dike, wê mis dide, çermê xwe bi çermê wêve dihekîne û adeta bi awayekî ğemgîn û mehzûn jê vediqete. Lêbelê teqdîra îlahî ye, kehr-ğezal bi dêğezala xwe re ser bi ser dimînin, hîn demeke dirêj bi ser pevre-mana wan re derbas nebûyî

şêr ferqê dixiyê. Derhal ew wê kehr-ğezala lawaz û bêparastin bi nêçîr dike. Şepal vê rewşê dibîne û heta tu bibêjî bes pê ğemgîn û nexweşhal dibe. Ew, li cihê ku kehr-ğezal hatî kuştin xwîna wê bêhn dike û her bêhn dike û serê xwe ditewîne. Adeta ew ji hinavê xwe dinale û hêstir ji çavên wê dibarin.

Ev rûdana (hadîse û bûyera) ku di kamerayan de hatiye xuyakirin mîsaleke çi heyretamîz û tije îbret e. Taybetmendîya dayîktîyê çi qeder di dereceyeke bilind û çêtir de hatiye şanîdan, hem jî di navbera du heywanên ku ew bi xulqîyet û aferîna xwe ji hev û din re dijmin in.. Ha ev, ayetek ji ayetên bilind ên Cenabê Heq in. Ev mûcîzeyeke îlahî ye ku di xusûsa dayîktîyê de tecellî bûye.

Di vir de ji bo me hikmet û îbretên mezin hene. Yanî dê, ne bi taybetmendîyên bedenî yên xwe, lêbelê bi taybetmendîyên rûhî yên xwe dê ye. Heke jinek xatir ji van bixwaze, naxwe heke ew xatiran ji jinîtî û dayîktîyê bixwaze, êdî ew ne abîdeyeke şefqetê ye; lêbelê ew dibe nêçîrvaneke bêhest û bêwijdan. Ew çendîn zarokan mehû dike. Ji lewma divê jin, xezîneya dayîktîyê hîç berze û winda nekin û wê di sewîyekeke ji mexlûqatên din hê çêtir û bilindtir de mûhafeze bikin. Lewra ji bo mexlûqatên din di alema axretê de bi çêlîkên xwe re rûbirû hatin û hesab jê hatin pirsîn nîn e. Lêbelê ew ji bo mirovan heye. Yanî ji bo mirovan, di roja mehşerê de ewladên wan yan wê wek xêr, yan jî wek şer derkevin pêşberê

wan. Bi vê nêrînê, bi şefqettirîn û dayîktîya çêtirîna ku ji ewladan re were şanîdan ev e ku bi vî awayî wan perwerde bike û bigihîne ku wan ji cehennemê biparêze û wê qiwama jîyînê bi wan bide qezenckirin ku wan bigihîne cennetê. Ji bo vê, di serê perwerdeya ku divê bi wan were dayîn de ev mijar tên; perwerdeya dînî, edeba sipehî, yanî terbîya exlaqî û pêhisa evdînîyê bi wan were dayîn.

*Ez benî, di civaka me de ew şexsên ku wê bizewicin bi navê nîşanîyê dewreyekê derbas dikin. Di vê navê de gellek problem têne jîyînê. Herdu teref di vê dewreya nîşanîyê de diçin geşt û gerê, bi hev û din re diaxivin û tiştên wekî van dikin, gelo di mewzûyên wekî van de xusûsê ku divê ew lê diqqet bikin çi ne?*

Ji jorê de xusûsa ku ez hewl didim vebêjim ev e; divê malbat di pêkhatineke wisan sağlem û nehej de were damezirandin. Naxwe damezirandina malbatê li ser bingehên rast û durust, ne sade di dewreya nîşanîyê tenê de ye; lêbelê ji serî heta bi dawîyê ew bi vê ve bend e ku mirov di hemû merhele û sefheyan de di nav pîvanên îlahî û hevkêşîyê de hereket bike. Lêbelê sed heyf û sed mixabin ku di zemanê me de hinek mirov di dewreya nîşanîyê de ji ber ku wisan hereket dikin her wekî ku zewac çêbûbe, gellek xeta

û asêbûnî û birînên dilî têne meydanê ku êdî nayên tamîr kirin.

Divê mirov bi awayekî qet'î vê îfade bike; sefha peyv-birrîn û nîşanîyê, ji wê lihevhatinê îbaret e ku herdu teref di rêya zewacê de qerarê didin û lihev tên. Yanî ev sefha, ne wekî sefha nîkahê ye. Herdu teref jî hê ji hev re mehrem in, yanî hê dîwarê heramîyê ji navbera wan ranebûye. Naxwe divê mirov li sînorê vê heramîyê û tixûbê helalîyê diqqet bike.

Bi kurtî herdu terefên ku nîşanîya xwe kiribin û hê nîkaha xwe nebirrîbin, bi tena serê xwe bi hev re bûna wan, ji lizûmîyê bêhtir pev re xeberdan û pevrebûna wan hîç ne mûnasib û guncaw e. Em tev di roja xwe de ji bo texrîbata halên bêjimar ên wiha dibin şahid..

Di vê xusûsê de ez dixwazim vê rîwayeta Îbnû Ebbas di bîr bînim:

Cenabê Heq, dêya me Hewwa, ji parsûya çepê ya Hezretê Adem aferand. Di wê esnayê de Adem -eleyhisselam- nivistibû. Çi dema ew ji xewê şîyar bû û li dev xwe wek zîlekê Hewwa dît, dilê wî meyla wê kir û destê xwe jê re dirêj kir. Melaîketan qîr dayê:

"- Ya Adem, destê xwe nedîyê! Hê nîkaha wê nehatiye birrîn!.."

Di piştî vê de mehra Hezretê Adem û Hezreta Hewwayê li hev hate birrîn. Şertê mehrê jî wek sê caran selewatê şerîf dana li ser Mûhemmed Mûstefa hate bicihanîn.

Ev, di hizûra Xuda de û li ber heqîqeta Mûhemmedî de bû destpêka nîkaha pêşîn.

Bi vî awayî nîkahê, bi selewat-dana li ser Hezretê Mûhemmed Mûstefa maneyeke bilind û ulwî qezenc kir. Ew bi tecellîyên rahm, bereket û feyzê tije bû.

### *Ez benî, tu di bara rêwresmên (merasimên) dîlanê de dixwazî çi bibêjî?*

Di zewacê de dîlan, ji bo parvekirina keyfxweşî û dilşadîyê ya bi dostan û xizmên malbatê re wesîle ye. Di aynî zemanî de di nîkahê de prensîb û seretaya îlankirin û ragihandinê heye. Dîlan tê kirin, ji bo ev sereta were bicihanîn û ew were bereferhkirin heta ku her kesek bikeve berê. Bi îlawe li ser van jî, çêkirina hêlîna malbatê xusûseke ew qeder heyatî û mûhîm e ku ew berdewamîya nesla însanî dide temînkirin. Naxwe dîlan, kirina bi wesîle ji bo keyfxweşî û dilşadîyê jî meqsedeke sipehî ye. Ev jî îcabeke aferîna me ye.

Divê em vê jî bidin zanîn ku kirina dîlanan bi terzeke ew qeder îsrafkarane heta ku ew ji bo mal-

batan bibin wesîleya herifîn û rûxanê, ev karekî wisa xirab e ku Îslam bi ti awayan wî qebûl nake. Ew Îslama ku ew qeder li dijî îsrafê ye heta ku ji însanê li ser çemekî boş desmêj digrin re jî dibêje; li avê miqate bin, avê îsraf nekin û bi îtîdal û dûrî-îsrafê av-xerckirinê ji xwe re bikin adet. Naxwe heke herdu teref zengîn bin jî divê ew bi rêya navîn tevbigerin û di nav civaka ku têde dijîn de mirovên mehrûm û meğdûr jî bifikrin. Di zemanê me de wekî dîlanên ku gellek zengîn dikin dîlan kirina bi wesîle ji bo şanîdana îhtîşam û qewetê, îsrafeke dîn û harane ye û ev jî şandêrîyeke ku wan bi awayekî baş û çak Îslam hezm nekirine.

Bi rastî dîlan, divê di nav zarafet û nezaketê de bibin. Divê mirov ji her cure îsraf, rîyakarî û şetafetê dûr bisekine, divê her kes li gorî rewşa maddî ya xwe rêwresmeke mûtewazî bike. Halên wekî şanîdêrîya qewetê, meqsed û rûhanîyeta dîlanan diperixînin.

Ji xwe zewac sunneteke mûbarek e. Lêbelê bi hinek tevger û adetên şaş, ên ku ji pîvanên îlahî re dijber bin û bi destpêkeke xirab gav avêtina nav zewacê, ketina cehalet û xusranê ye. Feqet ew dîwan û komeleyên nîkahê ku bi hukmên Xudayê bilind ve bend bin û ji qaîdeyên exlaqî re guncaw bin, ew dever mûbarek in û ew mekan in ku di wan de dûa û lavlav qebûl dibin..

Lêbelê bi şertê ku jin û mêr tevlîhev nebin û bi cergebez nebe, destûr ji wan keyf û şahîyên helal

re hatiye dayîn ku di wan de jin di navbera xwe bi xwe de dileyizin, keyf û şahîyan dikin û mêr jî xwe bi xwe di navbera xwe de dileyizin û keyf û şahîyan dikin..

Li alîyê din divê ğerîb, bêkes û hejar ji bo ser welîmê, yanî ji bo ser xwarina ku di wesfê xwarina cennetê de tê nirxandin û sunneteke senîyye'ya mûhîm e, yanî ji bo ser xwarina dawetê werin gazîkirin. Lewra pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- di vê xusûsê de wiha îqazê dike, dibêje:

"*Ew xwarina dawetê ku zengîn ji bo hatina serê têne gazîkirin û feqîr ji bo hatina serê nayên gazîkirin xwarineke çi xirab e!.*" [12]

Divê were zanîn ku bi sebeb dûayên zeîf û lawazan ji ummetê re arîkarî tê kirin. Ji lewma divê bi awayekî taybetî ğerîb û feqîr ji bo hatina ser xwarina dawetê werin gazîkirin. Divê were bibîranîn ku Mûsa -eleyhisselam- xwe îltîca kiribû, avêtibû ber penaha Cenabê Heq, wiha pirs kiribû, gotibû:

*"-Ya Rebbî! Ez li kuderê li Te bigerim?"*

Ellah Teala jî jê re gotibû:

*"-Li cem dil-şikestîyan li Min bigere!"*[13]

12. Buxarî, Nîkah, 72; Mûslim, Nîkah, 107. Ji bilî van li Îbnmace, Nîkah 25'an jî binêrin.
13. Ebû Nûaym, Hîlye, II, 364.

Lewra nîyaz û lavlavên mirovên dilbirîn û ğerîb li cem Xuda meqbûl in. Bi vê sebebê standina dûayên wan, bi taybetî jî di demên mûhîm ên wekî zewacê ku bingehên malbatê tên avêtin de hê bêhtir divê mirov lê miqate be. Ji bilî vê jî divê mirov standina dûayên xêrê ji mirovên salih û salîha jî îhmal neke.

*Ez benî, mêr û jinên ku nû zewicîne, divê dêhnê xwe bidin ser çi xusûsan ji bo hêlîna malbatî ya wan tendurust û sağlem bibe?*

Divê mirov baş bizane ku millet; bi mêrên xwe bilind dibin, feqet jin jî vê bilindbûnê temam dikin. Çawa bê mêran pêşveçûn çênabe, aynî wisan bê jinan jî pêşveçûn û bilindbûn çênabe, heke çêbibe jî ewê nuqsan û kêm bimîne. Bi vê peywendîyê ye ku heke mêrek di nav malbatê de nerehet be, pirranîya caran ew di karê xwe de jî serkeftî nabe. Ji bo vê em dişên bibêjin; memleket bi xêra kamilbûn û gihana jinên xwe bilind dibe. Tabîî ye ku berevajîya vê jî di aynî awayî de durust e. Yanî memleket û millet, di netîca nizmbûna jinên xwe de jî qîmetê xwe û hêza xwe winda dikin. Rûpelên tarîxê, bi nimûneyên bêjimar ên vê rastîyê tije ne.  Ha ji bo vê îhtiyaca bi pêkhatina malbatîya tendurust, misoger e.

Çawa însan, bi aferîna xwe heyberekî mûkemmel e. Lêbelê şexsîyet û nasnameya wî ya ku vê mûkemmelîyetê bide xuyakirin jî di hêlîna malbateke

sağlem û tendurust de derdikeve holê. Ji lewma ji bo însanî hêlîna malbatî divê germtirîn hemêza perwerdê be ji bo hal û bizavên ku hesta îhsanê cihbicih dikin. Heke wiha bibe, dil wê sewîyekeke manewî û rûhanîyetê qezenc bikin. Ewê ji heyata malbatî ya pêğember û welîyan parên xwe wergirin.

Di vê çarçoveyê de seadeta malbatî, bi vê ve bend dibe ku herdu teref li hemberî hev rêz û sîyanetê ji mafên hevû din re bigrin û vê îhtîram û rêzgirtinê jî bi mehebbetê perçîn bikin, zexm bikin.

Di xusûsa cihbicihbûna seadeta malbatî de para xwe wergirtina ji kehnîya «teqwa»yê ya ku ayetê bi vê îfadeyê «**îtteqû/ji Xuda bitirsin!**» qesd kiriye jî zehf mûhîm e. Erd û asîman şahid in ku ev dinya, bi bereketa li ber çavan girtina maf û hiqûqê jinê bûye cennet û bi encama xiraba li ber çavan negirtina maf û hiqûqê jinê jî bûye cehennem.. Mezinê me Hezretê Pêğember-sellellahû eleyhî we sellem- di xusûsa maf û hiqûqên jinê de di beşeke Xutba Xatirxwestinê de wiha dibêje:

"*Gelî mirovan! Mafên jinan li ber çavan bigrin! Bi wan re bi şefqet û hezkirinê mûamele bikin! Ez tewsîye dikim ku hûn di bara wan de ji Xuda bitirsin. We, jin wek emanetê Xuda wergirtine; we namûsa wan û îffeta wan li ser navê Xuda soz daye û wilo li xwe helal kiriye!*" [14]

14. Mûxtesera Sahîha Buxarî, X. 398.

Li ser vî esasî kişandina xaniman; ji meşğûlîyeta wan bi pêkhatina exlaqî ya ewladên wan ji bo perwerdekirina nesleke salih, berê wan dana ser karên ji aferîna bilinda wan re dijber, ne dikeve mentiqê, ne dikeve îz‘anê ne jî dikeve îmanê. Nakeve yekî ji van, lewra hizûr û seadeta di malbatê de nesîbeke sade û sade mirov dikare di bikaranîna taybetmendî û qabilîyetên di mêr û jinê de di cihên wan de û bi parastina wan, bidest bixe.

Ha ew zewaca ku ji bo gihiştina vî nesîbî hatibe kirin, pêkhatineke (pîroz e) ku Îslam zehf bi şeklekî hessas li serê radiweste. Du alîyên wê hene, yek ji wan maddî ye, yek ji wan jî manewî ye. Ji lewma heta ku mirov bikare hêlîna malbatê wek dualî damezirîne, şert e ku heta tu bibêjî bes mirov xwedî ciddîyet û diqqet be. Di rewşeke berevajî vê de wê were fehmkirin ku zewac, pevrebûneke besît bûye. Hêlînên malbatî yên ku bi têgihiştinên wiha teng û seresereyî hatibin damezirandin, mixabin bi jinberdanên ne di cih de bi encam dibin. Bi rastî hevserên ku ne bi hestên dînî û exlaqî heyata xwe bi-yek kiribin dawîya wan yan dibe ji hev cudabûn, yan jî dibe zincîra êş û janan ku heta bi goristanê her dirêj dibe û diçe. Helbet ev ne encameke ku ji zewacê tê arzûkirin. Ji bo vê, jihev-cudabûn wek bûyereke ku ‘Erşê ‘Ela dide hejandin hatiye nirxandin. Pêğember -sellellahû eleyhî we sellem- dibêje:

*"Bizewicin, hev û din bernedin!.. Lewra ji ber hev-berdanê 'Erş dilerize.."* [15]

Ji xwe nexasim ji bo zewq û keyfê jin berdan; hesabê wê jî, cezayê wê jî sûc û zulmeke mezin e ku bi ti awayan ne helal e. Ev, dikeve heqê evdan ku Heq hîç wê efû nake, lê nabûre û ji hêla maneyî ve jî xwe bi xwe werkirina di helak û xusranê de ye..

Zewacên ku wiha bi awayê keyfî û bêhizrane têne kirin û di piştî wan de jî jihev-cudabûnên ku wek misoger tên ji wan re ew qeder dawîyên hezîn û ğemnak hene ku ew bi jimartinê xilas nabin. Girantirîn û xirabtirîn xuyabûna vê jî, berî her tiştî li ser zarokan tê meydanê. Ew mala ku di navê de germahîya malbatî nebe û ew zarokên ku ji dê-bavên xwe yên ku divîyabû wan ji bo xwe bikin nimûne, ji wan bi mûameleya xirab re rûbirû dimînin ji însafa kolanan re têne terkkirin û wilo şemirandî dijîn. Dema wiha bibe jî ev zarok ji malê direvin û diçin dikevin navbera zarokên li kolanan; di demeke kurt de dikevin xefk û kemîna rêxistinên curecur ên sûckirinê yên her wekî çixare, alkol, tîner, narkotîk, fihûş û yên wekî wan. Ev jî zemîneke wisan kambax hazir dike ku civakê biherifîne. Hem jî ew dibe tetîkkêşer û şûrkêşer ji bo erozyona exlaqî ya ku heyata civakê şor û ziwa dike.

Lêbelê divê mirov bi jinberdanê re elaqedar rastîyekê bi kirp îfade bike; tabîî ye ku li gorî Îslamê

15. Elî el-Mûtteqî, IX, 1161/27874.

eqda nîkahê wekî ku di Katolîkan de jî wisa ye, ne eqdeke wilo ye asê ye ku “hîç bi ti awayan divê xirab nebe û di dirêjahîya temenekî temam de bi awayekî bêçare ew her were berdewamkirin..” Ji ber ku her peyman, berhema mirovên ku ew eqd girêdane ye, ji ber hinek mecbûrîyetan bi peymaneke nû ya ku wê di navbera terefan de were kirin helbet dikare ji holê rabe. Ev qaîde ji terefê Îslamê ve hatiye erêkirin û aqil û mentiq jî vê pêwîst dikin. Di rewşeke berevajî vê de heke heqê jihev-cudabûnê di zewaceke şaş û bê-îsabet de nebe, hingê heyat wê ji însanî re bibe jehr. Pevrebûn jî wê bibin esaret. Ew hevjînên ku nikaribin ji asêpirsên xwe re çareserîyê bibînin, di dawîyê de ewê bipekin nav teqana jîyîneke çelexwehrî û rêşaş. Ha ji bo vê Îslamê, dema lazimîyeke jêneger pêkwere jinberdan helal kiriye û ew ji mêr re hiştiye ku ew bêhtir mûsaid û amade ye bi îradeyî tevbigere..

Li gorî Îslamê bi mêran dana heqê jinberdanê wek qaîde, bi sebeb hissîbûna (hestyarbûna) jinan e. Heke na, heke di nîkahê de wek şert were danîn jin jî ti astengek jê re nîn e ku ew jî ji vî heqî re bibe xwedî. Ji vê re tewzîfa telaqê tê gotin. Ji bilî vê jî heke ev şert nehatibe danîn jî heke mecbûrîyeteke ciddî derkeve holê hingê jin, mafê wê heye serî li meqamê têkildar bide ji bo xwe ji mêrê xwe bide berdan.

Naxwe xwe parastina ji telaqên nepêwîst, hîç şubhe nîn e ku bi vê mûmkin dibe; dema mêr û jin li hemberî hev û din qedr û qîmetê xwe zanibin û ew dîsa li hemberî hev û din van qedr û qîmetên xwe biparêzin. Rojên bextewar ên hevalên heyatê; bîranên zirav û kûr, keyfxweşîyên semîmî, refah, aramî û lezzet, tim di sîbera pîvan û endazên îlahî de têne temînkirin. Ev jî, wê herdu terefan wek evd ji Heq re li hemberî hev û din bi sedaqet û semîmîyeta wan tecellî bike. Pêğemberê Xuda di hedîsên şerîf de dibêje:

"*Kî bi şevê ji xew şîyar bibe û xanima xwe jî şîyar bike û pevre yan jî her yek ji wan bi tena serê xwe du rekat nimêj bikin, ewê ji mêrên ku zehf zikrê Xuda dikin û ji jinên ku zehf zikrê Xuda dikin werin nivîsîn.*" [16]

"*Rahma Xuda li wî mêrî be ku bi şevê ji xew rabe nimêj bike, xanima xwe jî rake, heke ew ranebe jî avê bi ser çavên wê de bireşîne û wilo wê şîyar bike! Bi heman awayî rahma Xuda liwê jinêbe ku bi şevê rabe nimêj bike, mêrê xwe jî şîyar bike, heke ew şîyar nebe jî avê bi ser çavên wî de bireşîne û wilo xewa wî lê bibe!*" [17]

Nuqteya ku ji van hedîsên şerîf tê fehmkirin ev e; bi kurtî seadeta malbatê:

16. Ebûdawud, Tetewwû 18, Witr 13.
17. Ebûdawud, Tetewwû 18, Witr 13.

Bi van du destûrên mezin ên wekî;

**1. Semîmîyeta di navbera herdu terefan de**,

**2. Hev û din teşwîqkirina li ser teqwayê** ve bend e.

*Heke pêwîst be mirov van hemû xusûsên ku we vegotin li ser hev kom bike û hêlîna malbata îdeal û nimûne şanî bide, gelo li pêşberî me mîsalên serkeftî hene?*

Helbet, mûmkin e mirov gellek nimûneyan bide. Lêbelê di zirweya wan tevan de jî bêşiwar ew hêlîna seadetê heye ku Mezinê me Hezretê pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- ava kiribû.

Lewra Mezinê me pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- di her mesele û sefha û pêvajoya heyatê de çêtirîn mîsal û rêber e. Wî, ji hêla bextewarî û hizûra malbatî ve ji bo temamê însanîyetê hêlîneke nimûneyî damezirandibû ku wî ji her alîyan ve heyateke mûkemmel, bi feyz û bereket raxistiye ber çavan.. Yanî ew, ji bo hêlîna malbateke bextewar hem nimûneya mêrê mûkemmeltirîn e, hem jî nimûneya bavê mûkemmeltirîn e. Dêya me xanima mûbareka wî Hezreta Xedîce jî nimûneya hevser û dêya mûkemmeltirîn e. Dêyên me yên dîtir jî wisa bûne… Bi kurtî di hêlîna malbatî ya ku wî damezirandibû de nelêtîyeke/negatîfîyeke biçûçik-

tirîn jî ji wî nehatiye meydanê. Ev, serkeftineke ji xeyalê biwêdetir e. Bi heseb beşerbûna wan helbet di navbera wî û dêyên me de hinek meseleyên biçûçik-mûçik hatine jîyîn. Lêbelê bi xêra exlaqê bilindê wî û şexsîyeta îdeala wî tev jî bi xêr û bereketê bi encam bûne û di rewşên wiha de jî wî di xusûsa ku bila ew çawa tevbigerin de ji bo temamê ummeta xwe nimûne pêkanîye.

Li ser vî esasî hêlîna malbatî ya Mezinê me pêğemberê Xuda, wekî şexsîyeta çêtirîn û bilindtirîna wî bi xwe, bi her nêrînê ew hêlîna îdealtirîn û nimûnetirîn e.

Ew hêlîn, hêlîneke dinyayê ya wisan tije hizûr û sipehîtî bûye ku digel têde bi rojan xwarina germ nedihate pehtin jî her bêhna seadetê jê difûrî. Zêdebarî vê, di wê hêlîna mûqeddes de odeya xanimên wî bes ji mekanekî ew qeder biçûk îbaret bû bi qasî ku karibin serê xwe bixinê. Lêbelê bi lezzettirîn rizqê wê hêlînê; riza, sebr û teslîmîyet bû. Usûla terbîyê ya ku pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- di jîyana malbatî ya xwe de tetbîq dikir, dilên wan bi pêbendî û mehebbeteke bêdawî tije kiribû. Bi qasî ku dêyên me ji pêğemberê Xuda hez dikirin hîç ti jineke din nikare ew qeder ji mêrê xwe hez bike. Bi qasî ku Mezinê me pêğemberê Xuda ji xanimên mûbarek ên xwe hez dikir jî hîç ti mêrek nikare ew qeder ji jina xwe hez bike. Bi qasî ku Hezreta Fatima ji bavê xwe hez dikir hîç ti ewladekî/e din nikare ew qeder

ji bavê xwe hez bike. Bi qasî ku Hezretê pêğemberê Xuda ji keça xwe Fatima hez dikir, hîç ti bavekî din nikare ew qeder ji zarokê/a xwe hez bike.

Mezinê me pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- heta bi dereceya dawîn di navbera her yekê ji xanimên xwe de ku ew di meqamê dêyên mûmînan de ne, heq û edalet rîayet kiriye. Di vê xusûsê de çi ğeyret û hewldan ji dest wî hatibe,wî ew her şanî daye, feqet zehmetîya temînkirina edaleta mûtleq jî îtîraf kiriye, wî xwe bi vî awayî avêtiye ber penaha Cenabê Heq û gotiye:

"*Ya Rebbî, dibe ku ez bêhemdî xwe ji yekê ji wan ji yên din zehftir hez bikim. Ev jî dibe neheqîyek. Ji lewma ey Rebbê min! Di vê xusûsa ku ji dest min nayê de ez xwe diavêjim ber penaha rahma Te!..*" [18]

**Ey Rebbê me! Ji bo me û malbatên me heyateke teqwayê bi nesîbê me bike ku ew li ser**

---

18. Di vê dûa û nîyaza ku Mezinê me Pêğember nekarîn û zeîftîya xwe îfade kiriye de gellek hikmetê wê hene. Yek ji van hikmetan jî ji bo ummeta xwe ya ku wê di her hêlê de wî ji bo xwe bikin nimûne, temîn dike ku divê ew jibîr nekin; di nîhayetê de ew jî beşer bûye. Lewra hinek ji ummetên berê, bi sebeb ku rêz û îhtîrameke zêde zêde ji pêğemberên xwe re şanî dabûn ji ser bawerîya tewhîdê şemitîbûn û ew qeder zêdegavî kiribûn heta paşê pêğemberên xwe bi îlah kiribûn.. Ji ber vê dînê Îslamê, di hevoka şehadetê de ku bingehên îmanê pêktîne berî "**resûlbûna wî ji bo Xuda**" ya Hezretê Pêğember pêşî bi kirp li ser taybetmendîya wî ya ku ew "**evdê Xuda**" bûye, raweştîyaye. Tabîî ye ku di vê mijarê de bizavên wekî sade alîyê evdbûna wî xiştin ber deştan û bilindbûna resûltîya wî jî tine jimartin jî, cehaleteke mezin û nemehebbetî ye.

**evdînîyek û taeteke wisan be ku te razî bike, xanîyên me jî bike cenneta hizûr û seadetê! Me ji ezabê cehennemê biparêze ku hezar û yek amelên îsyan û ğefletê ew pêxistine!**

**Amîn!..**

# Ew Xusûsên ku Divê Jin di Nav Malbatê de li wan Diqqet Bike



*"Jina salîha, dema mêrê wê li rûyê wê binêre ew wî keyfxweş dike, ew daxwazên rewa yên mêrê xwe tîne cih û li cihê ku mêrê wê hazir ne be jî hem malê wî, hem jî namûsa wî mûhafeze dike."*

*(Îbnû Mace, Nîkah, 5/1857.)*

### *Bi nêrîna temînkirina hizûr û seadetê di hêlîna malbatê de ew xusûsên ku divê jin li wan diqqet bike çi ne?*

Berî her tiştî divê xanim, wek îcabeke aferîna me evdînîya ji Xuda re û teqwayê rîayet bikin, li ber çavan bigrin. Di vê xusûsê de digel li ber çavan girtina îbadetê, nimêj û nîyazê divê ew ji bo helal û heramîyê jî îtîna û baldarîyê şanî bidin.

Di nav malbatê de teqwa û îstîqameta xanimê; divê di vê mahîyetê de bibe ku ew mêrê xwe, zarokên xwe, lêzimên xwe û heta cîranên xwe jî ji bo xêr û hesenatan teşwîq bike. Xanimeke salîha, çîçekeke bêhn-cennet e ku seadet û bextewarîyê bi ser hawîrdorên xwe de dipijiqîne.

Ji bo xaniman wezîfa ji hemû wezîfan mûhîmtira ku di piştî evdînîya ji Xuda re, tê; bextewarkirina mêrê xwe û ferdên malbata xwe ye. Memnûn-kirina mêrê xwe û sih bi ser seadet û bextewarîya malbata xwe de ne-anîn, rizaya Rebbê me bi jinan dide

qezenckirin. Çawa Mezinê me Pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- gotiye:

**“Jina salîha, dema mêrê wê li rûyê wê binêre ew wî keyfxweş dike, ew daxwazên rewa yên mêrê xwe tîne cih û li cihê ku mêrê wê hazir ne be jî hem malê wî, hem jî namûsa wî mûhafeze dike.”**[19]

Naxwe jinek, divê li rêyên memnûn-kirina mêrê xwe bigere, wan bibîne û rizamendîya wî bêhn bike.

*Ez benî, heke em vê mijarê biçeke din vekin, divê jinek li mala xwe û di heyata rojane ya xwe de li çi diqqet bike?*

Dema jin li nav mala xwe be, divê îtînayê ji bo xwe şanî bide, divê ew temîz û liberxwe (lixwenêr) be. Di nêrîna zilamekî jirêzê de jî bi qirêjbûn û qermiçî-bûna jinekê têrê dike ku ew ji çavên wî bikeve. Naxwe jinek li cem zilamê xwe, divê xwe ji her cure menzara û dîmenên ku ji çavan re xweş neyên, dûr bigre.

Dilê zilamê ku tişta lê digre li mala xwe nabîne, wê li derve bi ber cihên şaş ve bişemite, here û di dawîyê de seadet û bextewarîya malbatî wê li zeîftîyê bikeve. Ji ber vê, divê jin li nav mala xwe, wekî gul-baq û guldesteyekê bibe ku ji çîçekên reng û bêhna

19. Îbnû Mace, Nîkah, 5/1857.

wan curecur hatibe berhevkirin; divê ew seadet û hizûrê ji hevserê xwe re bexş bike. Divê ew bike ku mêrê wê bêrîya saetên êvarê bike, ew êvarê ji vegerîna malê jî nefret neke.

Xanimeke salîha, divê bi rûkenî û li ber devê derî pêşwazîyê li mêrê xwe bike, dema mêrê wê ji malê derkeve, here jî wî bi xeberên xweş û dûayan bi rêwî bike. Heke çi qeder ew roj xanim zehf westiyabe jî divê vê westina xwe nede xuyakirin û divê ew li cem zilamê xwe rûyê xwe tirş û tehl neke. Divê ew tengasî û rehtîyên mêrê xwe pê re parve bike û divê ew ji zilamê xwe re bibe arîkar ji bo ew westin û perixîna xwe ji ser xwe bavêje.

Divê hevser, hevjîn diqqet bikin ku ew bi sebeb dilmanên zêde û gilehên lazim-nelazim hizûra hev û din xirab nekin. Di vê mijarê de ji nav eshabê kîram helwesta Ummû Suleymê ya li hemberî mêrê wê çi sipehî ye. Digel ku zarokê wê wefat kiribû jî dîsa vê rewşê, ew ji kirina xizmet û fedakarîyê ji bo mêrê wê asteng nekiribû. Hatiye rîwayetkirin; dema Ebûtalha ne li malê bû, kurê zehf nexweş ê Ebû-Talha wefat kiribû. Dema Ummû Suleymê dîtibû ku wa ye kurê wê wefat kiriye, wê bi xwe ew şûştibû û defin kiribû. Çi dema Ebûtalha hatibû malê, jê pirs kiribû, jê re gotibû:

“-Kurik çawa ye?” Ummû Suleymê jê re gotibû:

“-Êşa kurik hinekê sekinî, ez dibêjim hema wî îstîrahet kiriye.” Ummû Suleymê ji xelkê malê re jî gotibû:

“-Zinhar ji Ebûtalha re nebêjin kurê te mirîye, heta ku ez bi xwe jê re bibêjim!..” Bi vî awayî tenbîheke asê li wan kiribû. Piştre wê xwarin anî li ber mêrê xwe danî. Ebûtalha jî xwarina xwe xwar. Ummû Suleymê xwe xemiland û xwe ji mêrê xwe re nîşan da. Wan xwe pevre kişandin îstîrahetê. Çi dema li wan bû sibeh, di esnaya ku Ebûtalha dixwest ji malê derkeve de Ummû Suleyma ku xanimeke jîr û xwedî teqwa bû, jê re got:

“-Ey Ebûtalha, de ka li kirina vî cîranê me binêre, ji bo bikaranînê ew emanetê ku wergirtibû, dema min jê xwest, nexwestin bidin min.” Ebûtalha ev bersiv dayê, jê re got:

“-Ma hîç wilo dibe, wan baş nekiriye!” Vêca Ummû Suleymê jê re got:

“-Ey Ebûtalha, kurê te li dev te emanetekî Xuda bû, wî ew bi şûn de stand.” Ebûtalha ji nişka ve şaşomaşo bû, hinekî sekinî, piştre jî got:

“-Em yên Xuda ne, û bêşiwar emê li wî vegerin.” Dema ew ji bo nimêjê çû mizgeftê, tişta ku bûyî tev ji Hezretê Pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- re vegot. Resûlê Xuda jî jê re wiha dûa kir, got:

“-*Cenabê Heq, bereketê bixe vê şeva we*.”

Piştî vê dûayê hê salek derbas nebûyî Xuda kurek ji vê malbatê re îhsan kir. Mezinê me Pêğemberê Xuda xurme bi vî kurikê nûzayî da xwarin, dûa jê re kir û navê “Ebdûllah” jî lê kir. Dîsa hatiye rîwayetkirin ku bi bereketa vê dûayê neh yan jî heft kur ji Ebdûllah re bûne û tev jî xwendevan û hafiz bûne. [20]

*Xanimeke salîha, ji bo hawîreke malbatî ya tije hizûr divê di mûnasebetên bi mêrê xwe re çi tenikî û nazikîyên din li ber çavan bigre?*

Divê ew ti caran mêrê xwe îhmal neke. Divê ew di rêza ferdên malbata xwe de wî nexe rêza duduyan. Ji ber ku ev hal wê ji aferînê re dijber be, mêrekî normal wê bizaveke wiha ya jina xwe qebûl neke.

Ji bo memnûnkirina însanekî jî divê mirov wî baş nas bike. Ji ber vê divê xanim; mêrê xwe fehm bike, îdealên wî, têkilîyên wî, hestên wî û zewqên wî parve bike û hewl bide ku ji wî neqete.

Li hemberî vê, divê mêr jî li pêşberî jina xwe bi heman awayî hereket bike. Heke herdu giringîyê bi vê giringî-pevdanê nedin, wek îcabeke tabîî ya hevjînîyê ku “**pevrebûn, nuqteyên hevbeş û parvekirin**” her ku biçe wê her zeîf bibin û di navbera zemanî de hevjîn wê ji hev û din dûr bikev-

20. Buxarî, Cenaiz, 42, Aqîqe, 1; Mûslim, Edeb 23; Fedaîlus-Sehabe 107.

in. Heke di wextê xwe de tedbîr neyê standin, evê di piştî mûddetekê de halekî wisan bigre ku di navbera hevjînan de mehebbet û pevrebûn dikarin cihê xwe ji cudabûn û nefretê re bihêlin. Xirabtirîn demsala vê jî yextiyarî ye. Di dirêjahîya salên ku pevre derbas kirine de ew kesên ku hev û din nas nekirine û hewl nedane ku hev û din fehm bikin, ji hev cudabûna wan di demên yextiyarîya xwe de jî bi tenêtîyeke hezîn, hesret û nedameteke ku nikare bi şûn de vegere.

Xanim, divê di her karê wî yê xêrê û rewa de ji mêrê xwe re bibe arîkar û piştevan. Divê ew di rêz-girtina ji bo lêzimên mêrê xwe de jî teqsîr neke. Heke ew di rewşa tercîh û fedakarîyê de bimîne, divê ew hê zehftir nêzîkatîyê ji malbata wî re şanî bide.

Heyat ji surprîzan tije ye. Dibe ku zemanên felaket û buhranan, qeyranan jî çêbibin. Di zemanên wiha de divê ew li cem zilamê xwe bibe û hewl bide ku barê wî sivik bike. Mezinên me çi xweş gotine:

“*Bibe mahfûr, bila çil ling li ser te bigerin da ku tu bibî ser-taca li ser seran*.”

Ji vê re emsal çendîn gotinên pêşîyan û wecîze hatine gotin. Heke em ji van peyvan îlham bigrin û îfade bikin, divê di wextên tengasîyê de “heke xwîn ji devê wê bi dilop birije were, bila were gotin; min doşava tûyên şêmî vexwar.” “heke mil bişike biladi nav zendikê de bimîne.” “Divê bi kirasê bûkantîya xwe here hêlîna xwe, hêlîna xwe bi bextewarîyê tije

bike û ew ji vî derî jî bi kefenekî sipî û bêleke ji bo rêwengîya ebedî ya xwe derkeve."

Çawa Mezinê me pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- sebr, têgihiştin, teslîmîyet û fedakarîya xanima pêşî ya xwe Hezreta Xedîce di dirêjahîya temenekî temam de jibîr nekiriye û her zeman ew bi xêrê anîye bîra xwe.

Bi kurtî divê mirov ji însanan hez bike da ku mirov jî were hezkirin; divê mirov însanan bijimêre da ku mirov jî were jimartin. Divê mirov fedakar be da ku mirov li hemberî xwe sipehîtî û îkraman bibîne. Lêbelê di nav malbatê de pêşî ev tev ji xaniman werin. Tabîî xanima aqilmend, xwe bi mêrê xwe dide hezkirin û ew dibe avasaza rêya seadetê. Pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- di hedîsa şerîf de dibêje:

"*Ew jina ku bimre û mêrê wê jê razî be, ewê biçe cennetê*." [21]

Ev hedîsa şerîf hem wê mûkafata ku xanima salîha wê pê bigihe heke mêrê xwe memnûn bike, dide zanîn. Hem ew behsa cihê mêr di malbatê de dike hem jî ew behsa exlaqê jinê dike.

Pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- di hedîseke şerîfa din de dibêje:

21. Tirmizî, Rada, 10; Ji bilî vê jî li Îbnû Mace, Nîkah, 4'an binêrin.

“*Bilindbûna însanî di dînê wî de, muriwwet û şerefa wî di aqilê wî de, sipehîtîya nijad û sulaleya wî jî di exlaqê wî (yê ku bi nîkahê tê parastin) de veşartî ye.*”[22] Ew pîvan û endaz destnîşan kirine ku di tercîha hevjînan de divê mirov wan li ber çavan bigre.

Jina salîha, divê bi hezkirin û jimartina mêrê xwe tenê bes neke lêbelê di nav endazên rewa de ji bo eqreba û dostên mêrê xwe jî nêzîkatîyê şanî bide. Lewra ev bizava jinê wê mêrê wê memnûn bike. Lêbelê di vê de xusûsek heye ku divê were hessaskirin, ew jî îtaetkirina ji bo sînorên mehremîyetê ye ku Îslamê ew dîyar kirine. Dema jin li mala xwe bi tena serê xwe be, divê wî eqrebayê ku lê tê mehrê nexe hundurê mala xwe. Ev mijareke hessas e. Divê ti kes berçavka nîyeta temîz û xweşik nede ber çavê xwe û dîwarê mehremîyetê neherifîne û bi taybetî jin, divê xwe ji leke anîna ser xwe, dûr bigre. Lewra jin, wekî cileke sipsipî ye, lekeke biçûçiktirîn jî li wê dixuyê, bi ber çavan dikeve.

Mezinê me pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- erzû dikir ku xwe ji wan rewşên ku şubhe û gumanan bînin ser xwe, dûr bimîne, digot; “*..Xwe ji cihên ku tohmet lê hebin, biparêzin!*”[23]

Dîsa wextekî şevê, Resûlê Xuda, dema bi xanimekê ji xanimên xwe re li kolanê birêve diçû du

22. Darequtnî, III, 303.
23. Bûrsewî, Tefsîr, (Yûnus, 10/50)

kes ji Ensarîyan derketin hemberî wan, her wekî ku kesa li tenişta xwe bi wan bide naskirin, ji wan re got:

"*-Werin, ev, dêya we Safîye bintî Huyey' e*." Vêca li ser vê gotina eshabê wî:

"-Ya Resûlellah! Em Xuda, ji bizaveke ne guncawa ku Resûlê wî bike, tenzîh dikin."

Pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- ji wan re got:

"*-Şeytan di bedena însanî de wekî xwînê digere. Ez ditirsim ku ew xirabîyekê -yan jî şubheyekê- bavêje qelbê we*."[24] Bi vî awayî tenbîh kir ku mirov nebe sersebeb ji bo di bara xwe de şubhe û tohmetê di nav xelkê de bihêle.

Xanim, di karên meşrû û rewa yên mêrê xwe de divê tim li cem zilamên xwe bibin da ku bi xêra vê piştevanîya xanimên xwe hedena wan were û şewqa wan zêde bibe. Wekî ku malûm e, çi qeder xêr û sipehîtî werin parvekirin zêde dibin; çi qeder felaket û ğemgînî jî werin parvekirin kêm dibin.

Divê hîç ti zemanekî hevjîn jibîr nekin ku ew ji hev re hem li dinyayê, hem jî di rêwîtîya axretê de hevalên hev ên jîyanê ne. Berê her yek ji wan heyateke serbixwe ya wan hebû, bi zewicînê êdî ew herdu di heyateke hevbeş de, di qeder û çarenivîseke hevbeş de pişkdar dibin. Naxwe divê ew îcabên

24. Buxarî, Î'tîkaf, 11; Mûslim, Selam 23-25.

heyata hevbeş li ber çavan bigrin û divê ew di fetl û berwarên jîyanê de tim çavdêrîyê li hev bikin. Heke lingê yekî ji wan bişemite, divê yê/ya din jê re bibe kopal û dema ew bikeve jî divê bi destê wî/ê bigre û rake ser lingan..

Divê jin, li bizavên mêrê xwe diqqet bike û dema ew ferqê bixiyê ku wa ye mêrê wê di mijarekê de qeheriye, hingê bila wî karî mezin neke û wî negihîne sînorê mûnaqeşê. Lewra mûnaqeşeyên ciddî û dem-dirêj, mehebbet û îhtîrama di navbera wan de xirab dikin û hêlîna malbatê jî dixin xeterê. Di rewşên wekî van de mûnasib û guncaw e ku xanim di bizavên xwe yên li hemberî hevjînên xwe de li ser arambûn, sakinbûn û biterbîye-bûna xwe dewam bikin. Di dawîyê de mêr jî her wê şaşîya xwe fehm bikin û ewê li hemberî xanima xwe di nav mehcûbîyetê de hurmetkar bibin. Di rewşeke berevajî de digel ku ew şaş be jî ewê vê şaşîya xwe nebîne û ew şeytanê ku ketiye navbera wan jî, wê tovên kîn û dijminahîyê bixe navbera herdu qelban.

Dibe ku li hemberî hinek bûyer û weqaetan hissa hundurîn û dîtina însanan ya ku em jê re besîret dibêjin, were girêdan. Dibe ku jibîrkirin yan jî xetayên wan hebin. Heke xanimek bibîne ku mêrê wê di nav îhtiyaca îstîşara wê de ye, hingê divê ew pê bide hisskirin ku ew bi hemû semîmîyet û nîyeta başa xwe li dev wî ye. Divê ew hewl bide ku di mijareke wiha de çi zanibe, ya rast jê re bibêje. Divê

ew nêzîktirîn hevsira mêrê xwe be. Divê jibîr neke ku mêr û jin, du unsur in, hev û du temam dikin, xanimên Mezinê me Pêğemberê Xuda jî ku dêyên mûmînan e, zeman bi zeman bi fikrên xwe ji bo Mezinê me Pêğember bûne piştevan..

Mesela di esnaya Lihev-hatina Hudeybîyê de eshabê kîram li hemberî maddeyên vê sulha ku hatibû kirin ji ber ne memnûnîyeta xwe di bicihanîna fermana Pêğember de şermok û nejidil sekinîbûn. Ji bo vê helwesta wan, Mezinê me pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- jî heta tu bibêjî bes ğemgîn bûbû. Dêya me Ummû Seleme -radîyellahû anha- li wir bû, wê hedana Mezinê me anîbû û wê tewsîye lê kir ku fermana wî kirî ew li hêvîya ti kesî raneweste û ew bi xwe derhal wê bike, wê bîne cih. Lewra wê didît ku heta Hezretê pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- bi xwe fermana tiraş-bûn û ji îhraman derketinê neyêne cih, egera vegerîna wî ji qerara Hudeybîyê heye û bi vê sebebê jî eshabê kîram di nav bendewarîyê de bûne. Lewra wan bi pêkhatîya derveyî ya xwe ew dem hê hikmeta biryarên Hudeybîyê fehm nekiribûn û vegerîna ji wan çavnêrî dikirin. Di dawîyê de li ser tewsîya dêya me Ummû Seleme ya ku heta tu bibêjî bes di cihê xwe de, Mezinê me Pêğember tiraş bû, ji îhraman derket û dema eshabê kîram jî ev rewş dîtin, wan jî stûyên xwe xwehr kirin û ew jî ji îhraman derketin û ev mesele, hê rê li ber netîceyên tehl nevekirî, hate çareserkirin..

Dîsa dêya me Hezreta Xadîce, dema Mezinê me Pêğember wehya pêşîn wergirt, wê ew tesellî kiribû, ğemgînî û fikarên wî parve kiribûn û jê re bûbû arîkar ji bo ew bi Wereqe kurê Newfel re hevdîtinê bike. Wê bi vê fedakarîya xwe teqdîr û pêzanîna Mezinê me Pêğember wergirtibûye.

Di tarîxa Îslamê de di bara Hezretê Ûmer -radîyellahû anhû- de jî mîsaleke wekî vê tê gotin:

Hezretê Ûmer, li mizgeftê gotibû; jin heqmehra xwe zehf zêde dixwazin, ev jî zewacê zehmet dike û wî xwestibû sînorekî ji heqmahrê re deyne. Di wê esnayê de jinek di sefên paş de li mizgeftê bû û wê jî li vê axaftina Hezretê Ûmer guhdarî dikir. Ew rabû ser xwe û ev ayet[25] jê re xwend ku wê îşaret pê dida; jin çi qeder bixwazin dikarin ew qeder heqmehra xwe taleb bikin û wê îtîraz li Hezretê Ûmer kiribû. Vêca li ser vê gotina wê Hezretê Ûmer xetaya xwe fehm kiribû û gotibû:

*"-Jinê rast got, Ûmer şaş kir."* Û wî dîtin-nêrîna xwe guherand. [26]

Lêbelê li vir mijareke giringa din jî heye ku wê li serê were rawestin. Dema jin di mijarekê ji mijaran de îstîşare bike, çendan dîtin-nêrîna wê rast be jî divê ew xwe ji mezinkirin û tekebburê dûr bigre. Dema ew di bara mijarekê de fikrekê yan jî wesîyetekê li mêrê xwe bike, divê ew li hemberî wî ji hur-

25. Nîsa, 4/20.
26. Elî el-Mûtteqî, XVI, 536-537/45796.

metê neqete, divê îtîmad lê-nekirinê şanî nede, yan jî divê ew nekeve wê hewa û helwestê ku ew şîret û nesîhetan lê dike. Lewra zehf li xweşîya mêran naçe ku nesîhetan ji xanimên xwe bigrin. Welhasil jina salîha, dizane wê nîmeta aqil ya ku Xuda daye wê li hemberî mêrê xwe bi awayekî hessas bikarbîne.

Divê jinek, xwedî ew meharet û huner be ku pê bikare bikeve rûhê mêrê xwe. Di tarîxa me de ji bo vê çendîn nimûne hene. Gellek xanimên padîşahan, dilên mêrên xwe fetih û qezenc kirine, adeta ew di hukmranîya wan de bi wan re bûne şirîk. Bi xêra vê wan ji bo xwe li pey xwe wek sedeqeyên carîye çendîn mizgeft û mûesseseyên xêrê hiştine. Bi sebeb van xizmetên ku heta vêga jî hê berdewam dikin tim ew bi xêr û rahmê têne bibîranîn.

Dîsa heke jinek li cem însanekî din mêrê xwe şermezar û tenkîd bike, yan jî li cem mirovên din rabe şîret û nesîhetan li zilamê xwe bike, ev jî ji qaîdeyên edebê re dijber e. Mêrê wê çi qeder xetadar dibe bila bibe dîsa divê jina wî li pêşberî dîgeran wî mehcûb neke û xetadarîya wî teşhîr neke!.. Bi heman awayî heke mêr jî rabe li pêşberî dîgeran xetadarîya wê jina xwe mehcûb û teşhîr bike, ew jî bizaveke çewt û şaş e. Lewra Xuda di ayeta pîroz de dibêje: "**..Jin ji bo we wekî cilan e, hûn jî ji bo jinan wekî cilan e..**" [27]

Heke jinek, li hemberî kêmasî û qusûrên mêrê xwe, li dev mêrê xwe medh û pesnê mêrekî din jî

27. Beqere, 2/187.

bide, ev jî çewt û şaş e. Divê jin, gilehê mêrê xwe ji ti kesî re heta ji dêya xwe û bavê xwe re jî neke û divê ew diqqet bike ku mêrê xwe li cem ti kesî nexe rewşeke zor û zehmet.. Divê jin û mêr îxtîlafên xwe nebin ber destê ti kesî û ew hewl bidin ku wan di navbera xwe bi xwe de çareser bikin.

Em li derdorên xwe dibînin; sebebê ku hinek jin û mêr di hinek zewacan de dilşadî û seadetê bidest naxin, di bingeha wê de ev heye; jin qîmet nade mêrê, yan jî mêr qîmet nade jina xwe. Haleveku mêrjin dikarin hem ji bo hev û din bibin cennet, hem jî bibin cehennem. Heke jin hem ji Xuda re evdînîyê bike hem jî bersiva daxwazên rewa yên mêrê xwe bide û wî ji xwe razî bike, naxwe ev jina salîha, di rêya cennetê de ye.

### *Di bara jinên salîha yên wiha de wekî çi mizgînîyên Mezinê me Pêğember ji wan re hene?*

Mezinê me pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- ferman dike, dibêje:

"*Mûmîn, di piştî teqwaya ji Xuda de ew ji her tiştî bêhtir xêrê ji hevjîneke salîha dibîne. Heke ew fermanê li jineke wiha bike, ew jê re îtaet dike. Heke ew lê binêre, ew wî keyfxweş dike. Heke ew di bara wê de sûnd bixwe ku ewê tiştekî bike, yan jî neke, jina wî dê vê bîne cih û ewê wî ji sûnda wî xilas bike.*

*Heke ew ji hevsera xwe veqete, here cihekî dûr, ew jina wî hem namûsa xwe mûhafeze dike hem jî ew di xusûsa malê mêrê xwe de xêrdar û durust dibe..*”[28]

“*Dinya ji feydekeke berwext îbaret e. Çêtirîn heybera ku feyda wê temîn dike jî jina dîndar e.*”[29]

Sewban -radîyellahû anhû- rîwayet dike, dibêje:

Dema ev ayeta ha: “**Herçî ewên ku zêr û zîv li ser hev kom dikin û van di rêya Xuda de înfaq nakin, mizgînîya ezabekî ğemnak bide wan!**”[30] nazil bû, em bi pêğemberê Xuda re li seferê bûn. Hinekan ji eshabê kîram gotin:

“-Di bara zêr û zîv de tiştên lazim hatin xwarê. (Êdî em wan li ser hev kom nakin û emê wan înfaq bikin.) Xwezî me zanîbana ka çi mal bi xêrtir da ku me ji wî xêr kiribûna!..” Vêca pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- ji wan re got:

“*-Bi qîmettirîn tiştê ku mirov jê re bibe xwedî; zimanekî zikrdar, dilekî şukirdar û jineke mûmîna ku di îmana wî de ji bo mêrê xwe dibe arîkar..*”[31]

*Em di roja xwe ya îroyîn de wek maddî ji gellek tengasîyan û dîyardeyan*

28. Îbnû Mace, Nîkah, 5/1857.
29. Mûslim, Rada, 64; ji bilî vê jî li Nesaî, Nîkah, 15; Îbnû Mace, Nîkah, 5’an binêrin.
30. Tewbe, 9/34.
31. Tirmizî, Tefsîr, 9/9.

*(badîreyan) derbas bûne. Di nav malbatê de di mijara hebûn û nebûna mal de divê em dêhnê xwe bidin ser çi, da ku hizûr û dilşadîya malbatî xirab nebe?*

Berî her tiştî divê însan karibin xwe, kontrolkirina nefsa xwe hîn bibin û divê hewl bidin zorê li sînorên butçeya xwe nekin û hema çavê wan bi çi bikeve jî nebêjin her divê em vê bikirrin. Lewra ev, di dawîyê de ji bo ketina bin barekî giran û ji bo nerehetî û derketina krîz û qeyranên mezin dibe sersebeb.

Di roja me ya halê hazir de bi sebeb kartên krêdîyê her ku diçe ew berferehtir û gelempertir dibin, gellek malbat hizr pê dikin ku ew çi dibînin ew bi kartên krêdîyê yên xwe dikarin bi awayekî erzan û hêsan ji wan re bibin xwedî, êdî bi sebeb xercîyên bêpîvan ên ku kirine ketine girdab û gera deyndarî û ribayê û ew perîşan bûne.. Gellek hêlînên bextewar bi sebeb van wêran bûne, yan jî hatine ber wêranbûnê.

Hevjîn, heke çi qeder rewşa maddî ya wan pirr baş be jî dîsa divê ew malên xwe çarcur nekin û xwe ji îsrafê dûr bigrin. Ev, mûkellefîyet hem aîdê mêr e, hem jî aîdê jinê ye. Xuda neke, heye ku roj were êdî ew destpê bikin li wî malê ku bi hovane xerc kirine, bigerin. Cenabê Heq di ayeta pîroz de dibêje:

“**Mafê xizmên xwe, xizanan û rêwiyên ku di rê de mane bide û zinhar li cihê nepêdivî destbelaviyê neke. Lewra, destbelav birayên şeytanan e. Şeytan jî ji Xudayê xwe re pirr nankor bûye**.”[32]

Heke xwarin, vexwarin û cil û qîyafetên zêde hebin bila mirov li hewcedaran bigere, wan bibîne û bila mirov heq û para wan jî ji nav malê xwe ji wan re veqetîne. Lewra xweşkirina dilê feqîr û hewcedaran û qezenckirina dûayên wan, hêlîna geş û xweş dike û bereketê dixe rizqê mirovî. Divê tim û daîm li bîra mirovî be ku dibû em wekî wan bûne û ew jî wekî me bûne.

Divê di înfaqê de jî endaz û pîvana me her ev ayeta pîroz be: “**Heta hûn ji malê ku jê hez dikin înfaq nekin, hûnê bi birrê** (fezîleta rastî, xêr û qencîyê) **negihin**.”[33]

Dema mirov înfaqê dike jî ew tiştên ku mirov dide, ji wan cilên ku mirovî li xwe kiribin û ji wan tiştên ku kevin û qepalî bûbin zêdetir, bila ji wan tiştan bin ku di roja îroyîna me de qîmetê wan hebe û di dilê me de jî nirx û bihayê wan hebe..

Di hedîsa şerîf de bi îfadeyeke mecazî wiha hatiye gotin:

32. Îsra, 17/26-27.
33. Alî Îmran, 3/92.

*"Ewê ku înfaqê dike di serî de sedeqê dide destê Xuda; ji destê Xuda jî ew diçe dikeve destê hewcedarî."* [34]

Divê ev xusûs jî bi awayekî taybetî were îfadekirin; di heyata malbatê de li ber çavan girtina xerckirina xwe gir û bi endaz, di serî de wezîfa jinê ye. Heke jin di meseleyên wekî cil û bergan û xwarinvexwarinê de mûtewazî û bihelwest bibe, ji bilî van jî heke ew xwe dûrgirtina ji îsrafê di dilê xwe de baş bipejirîne, çendîn dahata wan hindik be jî dîsa wê di nav malbatê de destferehî, bereket û hizûr çêbibe.. Ji bo vê dema jin xwarinê bipijîne, bila bi besmelê destpê bike, bila her melzemê bi qasî îhtiyacê bikarbîne û bila wan daxwazên ew qeder zêde neke ku ewê zorê li butçeya malbatê bikin. Ev tevger û bizav, di nav malbatê de serkehnîya bingehîna seadet û bextewarîyê ne.

Di îro de ji ber ku ev pîvan û endaz li ber çavan nayên girtin, her roj bi tonan nan diçin, dikevin gemaşegehan, ev rastîyeke zehf tehl e ku bereketa me tine dike. Haleveku xanimeke îqtîsadkar û desthosta, sade ne nan bi tenê, lêbelê çawa ewê temîn bike ku her tişt bi qasî pîvana xwe biçe malê, aynî wisan ewê di nirxandina wan de jî bi îtîna bibe. Lewra sersebeb-bûna xirabbûna tiştekî û di sergu de werkirina wî berî xerckirina wî, şeklekî îsrafê ye ku di heyata malbatî de bes jin dikarin rê li berê bigrin.

34. Elî el-Mûtteqî, VI, 377.

Berê xanim, di xusûsa pîne-kirin û dirûtinê û tamîrkirina cil û bergan de, bi vî awayî jî xwe ji îsrafê dana paş de fewqelade bi diqqet û mahir bûn. Îro jî di qetîneke biçûktirîna cilan de jî, bi pirranî derhal kirrîna yeka nû tê tercîhkirin. Ev jî îsrafeke zehf xirab e.

Welhasil di malbateke dilşad û bextewar de ji hêla wezîfa xaniman ve xusûsa dawîna ku ez dixwazim bibêjim, wekî ku me berê jî dîyar kirî, ev rastî ye;

“Çûka mê, hêlînê çêdike.”

Heke xanim li hawîrdora vê rastîyê bi awayekî şûm û jîrane wan hereket û wezîfeyên ku dikevin ser milên wan bikin, maneya wê ev e; naxwe hêlînên malbatê bûne cennet. Êdî zanîn û girtina qedr û qîmetên jinan û parastina wan jî dikeve ser milên mêran.

# Mijarên ku Divê mêr di Nav Malbatê de li wan Miqate Bin



*Yek ji wezîfeyên ji hemû wezîfeyên dîtir giringtir ên mêran ev e; ew di warên dînî û exlaqî de jin û zarokan bigihînin, kamil bikin; wan bi awayekî wisan terbîye bikin ku ew ji bo seadet û bextewarîya dinya û axreta wan bibe sersebeb.*

### *Ew mijarên ku di hêlîna malbatê de divê mêr li wan miqate be, çi ne?*

Rûniştina seadeta malbatê li ser bingehên sağlem, xwe dispêre îdareya bavekî salih. Bavêsalih, ew bav e ku bi awayê ji hemû awayan sipehîtir wezîfeyên wekî van tîne cih; debara malbata xwe dike, terbîye û perwerdeya wê dike, malbata xwe mûhafeze dike, çavdêrîyê lê dike. Ev jî pêwîst dike ku divê ew mirovekî zana, jîr, biezmûn, şûm û bi taybetî jî bi-îman û exlaq-xweş be.

### *Ez benî, heke em vê mijarê hê bêhtir vekin, bavek mecbûr e, çi tiştan ji malbata xwe re dabîn û temîn bike?*

Mêr, dema biryara zewacê bide, berî her tiştî îhtiyaca wî bi jêdera dahatekê heye ku ew pê bikare debara xwe û malbata xwe ya ku berpirsîya wê xistiye stûyê xwe ji helalîyê bike û wê ji keda helala xwe bide xwarin û vexwarin.

Dîsa mêr, dema li derve kar dike û meşğûl dibe divê li helalbûnîya qezenca xwe diqqet bike. Xanima wî û zarokên wî ji xercîyên ku têne kirin bêxeber in, naxwe bi awayekî taybetî divê ew diqqet bike ku heramî û tiştên bi şubhe bi wan nede xwarin.

Dînê bilind ê me kulfet û barê temînkirina debara malbatê li mêr bar kiriye û hîç şubhe nîn e ku ji ber vê binbarîya wî jî para wî ji mîrasê zêde kiriye. Li ser vî esasî mêr, heke wî jêdereke dahat û debarê hebe, bila ew ji bo zewacê gav bavêje. Lêbelê ew însanê ku nikaribe debara xwe bi xwe bike ne guncaw û mûnasib e ku ew rabe dîgerên xwe meğdûr bike. Tevlî vê jî ew kesên ku îmkanên di dest wan de lawaz û zeîf bin jî dîsa difikrin ku bizewicin ji bo bikarin dînê xwe hê sipehîtir li gorî dînê xwe bijîn Ellah Teala arîkarîya wan dike. Lewra Cenabê Heq, ferehbûna lutfa xwe di bîra însanan tîne, bi vî awayî zewac teşwîq kiriye û wiha gotiye:

"**Ji navbera xwe nezewiciyan; ji koleyên xwe û qerwaşên xwe yên ku qencîkar in bizewicînin. Heke ew, xizan bin, Xuda dê ji ciwanmêriya xwe wan dewlemend bike. Lewra Xuda bi rehma xwe berfereh û zana ye**."[35]

Tişta ku ji vê ayeta pîroz tê fehmkirin ev e; ewê ku di nav civakê de hêza wî hebe, bikare bizewice demek berî demekê bila bizewice, ewên ku nikaribin

35. Nûr, 24/32.

bi derfetên xwe bizewicin jî divê ew jî (bi arîkarîya mislimanên xêrxwaz) werin zewicandin. Ev, wezîfa civaka Îslamê ye. Ev derîyekî mezin ê xêrê ye. Bi xêra vê, îffeta civak û ferdan tê mûhafezekirin.

Ew îffeta ku wesfeke fezîletê ye bi însanî hatiye dayîn. Mirov nikare bifikre ku îffet di heyber û mexlûqatên din de heye. Lêbelê însan, heke ew vê wesfa însanî ya xwe winda bike, êdî ew jî dibe ku ketiye sewîya mexlûqatên din.

Bêşiwar zeka, jîrîtî, hêz, qabilîyet, taybetmendî û temayulên ku Xuda dane însanî ji hev cuda cuda ne. Bi sebeb vê meslek û meşrebên curecur hatine meydanê. Her yek ji van meslekan ji bo berdewamîya riste û nîzama civakê lazim in. Naxwe hem îhtiyac bi van meselekan heye hem jî îhtiyac bi erbab û pîşedarên van meselekan jî heye. Wê di nav tevahîya civakekê de helbet qessab hebe, gezikvan (çopçî) hebe, doktor hebe, xwace jî hebe.. Naxwe divê her kes hewl bide ku li gorî îmkanên xwe malbatekê ji xwe re damezirîne. Dema ew vê malbatê ava dike jî divê di rewşa îctîmaîya (sosyala) terefan de hevkêşîyek hebe. Ev, sade ne îmkanên maddî, di aynî zemanî de ew hevkêşîya edeb, zanîn û urf û adetan jî îfade dike. Heke wiha bibe, hingê di navbera daxwazên li hemberî hev de wê cudahîyên ku hêlînê bihejînin, nebin. Lihevhatin wê zûtir çêbibe. Mesela mêrekî ku bê hebûna hêvkêşîyê zewicîbe, nikare heyateke di nuqta hevbeş de bi jina xwe bide jîyan-

din û çêdibe ew bibe sersebebê xusrana wê. Lêbelê bi xêra hezkirinên zehf zêde astengkirina xusranên wiha mûhtemel jî mûmkin e. Lêbelê ev, ew qeder îstisna ne, heta ku mirov dikare bibêje ew nîn in. Ji lewma divê lê were diqqetkirin ku wek prensîb û sereta zewac di navbera malbatên hevkuf û hevkêş de were kirin, ev diqqetkirina li hevkuftîyê wê her zeman bi feydetir û bi îsabettir be.

Maneya wê ev e; ji îmkanên maddî biwêdetir, ew însanên ku hestên manewî yên wan, ğaye û daxwazên wan ji hev nêzîk bin, pirr hêsantir e ku ew ji hev fehm bikin û ji hev re çavnas, aşna bibin.

Li alîyê din rewşa maddî ya malbatan, li gorî pile û dereceya kar û qezenca zilamî tê tertîb û tenzîmkirin. Ji bavekî, talebkirina tiştên ji hêza wî û qezenca wî zêdetir, ji bo dê û zarokên wê ne heq e. Bav, di nav derfetên ku qezenca wê têrê dike de wezîfedar e ku ji bo malbata xwe îhtiyacên wan yên wekî “**mesken, xurek û cilan**” pêşwazî û temîn bike.

Mesken; dixwaze bila bi kirê be, dixwaze bila bi awayê milkîyetê be, bila ew cihekî fereh û heke derfet hebe jî bila wê li semteke baş û li navbera cîranên qenc bibijêre ku ew bikare ferdên malbata xwe rehet bide jîyandin û wan têde bide hewandin. Heke derfet hebin jî rûniştin û îqamet-kirina li navbera cîranên bêexlaq û xirab û li cihên gemar û netendurust, ji bo ferdên malbatê neheqî ye. Ev xeta, wê bi derbasbûna

zemanî re zemînê hazir bike ku exlaq lawaz bibe û hêlîna malbatê jî wêran bibe.

Pîvana xurekê jî li gorî wê qezenca mêr e ku ew di encama xebateke hevkêş de bidest dixe. Di vê xusûsê de divê mêr ne tenbelîyê bike, ne jî xwe bixe bin barekî zêde giran. Wezîfeya mêr, di nava vê hevkêşîyê de temînkirina xurekê ye. Ev hevkêşî, divê ew wê di vê şeklê de damezirîne ku ew di xerckirinê de îsrafê neke; lêbelê ji lazimîyê zêdetir jî wê kêm neke, nebirre. Mixabin îsraf, di halê hazir de di roja îroyîn de problemek ji problemên mezintirîn e. Îro gellek mirov di mijara îsrafê de îhmalkar in. Haleveku heke mêr zengîn be jî dîsa divê ew her xwe ji îsrafê biparêze. Di rewşa berevajî de ewê di bin barê giranê îsrafê de perîşan bibe.

Xwarin, bi qasî ku nemire ferz e, xwarin bi qasî îhtiyacê mûbah e (yanî ne guneh e) lêbelê ji îhtiyacê zêdetir xwarin, heram e. Dostên Heq, îsrafa di xwarinê de, li gorî dereca teqwaya dilan wiha tesnîf kirine:

“Di şerîatê de piştî têrbûnê xwarin îsraf e.

Di tarîqetê de heta bi têrbûnê xwarin îsraf e.

Di heqîqetê de jî xwarina xwarinê û ğafilbûna ji vê ku ew li hizûra Xuda ye, îsraf e.”

Di xusûsa xwarin û fêkîyên ku zar û zêç ji wan hez dikin de divê bav hessas û şîyar bin. Ew zarokên ku li nav malê ji ber ku şerm dikin yan jî dilteng

dibin tiştekî naxwazin, bi taybetî jî divê ew îhtiyaca zarokên xwe yên keç li ber çavan bigrin.

Di îkramkirina ji bo mêhvanan de divê ew di nav pîvanên meşrû de comerdane hereket bikin. Ev, hem mezîyeteke exlaqî ye, hem jî ew îcaba şerefa însanîyetê ye.

Bavê malê, di xusûsa cil û bergan de mecbûr e ku ji bo xwe, ji bo xanima xwe û ji bo zarûzêçên xwe jî bi kêmasî du dest cilan yekî ji bo zivistanê yekî jî ji bo havînê temîn bike. Ji bo lixwe-kirina di rojên în, cejn û rojên wekî rêwresmên dîlanan keyfxweşker de jî dan-çêkirina cileke cuda jî meşrû û mûbah e, yanî ne guneh e. Dînê Îslamê xwe xemilandin jî di pîvaneke dîyarkirî de qedeğe nekiriye. Lêbelê di dereceyeke zêde de lixwe-kirina cilên zehf zêde rîyakarane û ji bo şanîdanê, xwe bi vê mezin kirin, serxwe ve çûn û xwe qurekirin, ji jor ve li mirovan meyzandin dînen hatiye qedeğekirin.

Di nav qîyafetan de lixwe-kirina cilên hevrîşmî û wergirtina zînetên wekî gustîl, saet û kordonê zêrîn ji bo mêran hatine heramkirin. Lewra ew tiştên zînetê ku ji bo jinan tenê hatine mexsûskirin, heke mêr jî rabin wan bikarbînin ew ji hêla exlaqî û rewîştî ve dibe sebeb ji bo çêbûna gellek zeîftîyên curecur. Divê di cilên zarokên kurik de jî bi giringî li ser vê mijarê were rawestin. Bi taybetî jî xetayeke zehf mezin e ku bi nêzîkatîyên cahilane yên wekî “bila hewesa xwe wergire!” mirov cilên dekolte, vekirî û

cilên wekî qîyafetên zarokên kurik li zarokên keçik bike. Bi derbasbûna zemanî re ev cil û lîbas, ji wan re dibin tiryakî, êdî heke ew bixwazin jî nikarin wan terk bikin û di dawîyê de dinyaya hundurîna zarokan ji wan re dibe jehr. Ji lewma divê mirov di wextê wê de tesetturê bi keçikan bide qezenckirin û wan jê re aşna bikin û ehemmîyeta vê bi wan bide fehmkirin. Di rewşeke berevajî de berêdan û tetbîqatên şaş, her dem şerefa jinîtîyê û heysîyeta wê xirab dikin. Divê were zanîn û hîç neyê jibîrkirin ku tesettur, çawa wesîleya parastina îffetê ye, aynî wisan ew ji bo jinê wesîleya zarafet û îhtîşamê ye jî. Xanimên jîr, şîyar û di şeklê ku pêwîst bike de jî bi tesettur in, her dem ji bo hawîrdorên xwe dibin îfadeya weqûrî û qîmetekê. Di dilan de her li hemberî wan hesta îhtîram û rêzgirtinê şîyar dibe.

### *Mêr, di terbîye û perwerdekirina malbatên xwe de bila li çi diqqet bikin?*

Yek ji wezîfeyên mûhîmtirîn in mêr ev e; ew jina xwe û zarokên xwe ji hêla dînî û exlaqî ve bigihîne, kamil bike; wan bi awayekî wisan bihavil perwerde bike ku ew ji bo seadeta dinya û axreta wan bibe sebeb. Çawa ev wezîfe di Qur'ana Pîroz de wiha tê eşkerekirin:

**“Gelî mirovên ku îman anîne! Xwe û malbata xwe ji agirekî biparêzin ku şewateke wî însan û kevir in**..” [36]

Çarçoveya vê wezîfê, her kes li gorî meqam û îmkanên xwe, pêşî ew ji hevjîn û zarokên xwe destpê dike, xizmetkarên li nav mala wî, cîran û xizmên wî, hevalên wî yên mektebê û heta gav bi gav memleketê wî tevan dixe nava xwe. Lewra malbat, di bin tesîra mirovên li hawîrdora xwe de dimînin, her wiha ew hawîra derveyî ya di nava xwe de jî pêktînin.

Bavek, divê ji bo ferdên malbata xwe giringîyê bi perwerdeya Qur’ana Pîroz bide û eşq û şewqa îbadetê bi zarokên xwe bide çêjandin û tâmkirin. Li alîyê din jî zerûrî ye ku bav di bara dinya û axretê de reftar û edeban, rêz û toreyan û usûl û urfan li zarokên xwe bide hînkirin. Di vê çarçovê de dema zarokên wî bigihin çağê mektebê jî divê wan bişîne fêrgehên havînî yên Qur’ana pîroz û di piştî xilaskirina mekteba destpêkî de divê Qur’ana Pîroz her bi zarokên xwe bide xwendin. Bi taybetî ev ji bo zarokên keçik hê elzem e. Divê neyê jibîrkirin ku mîrasa ji hemû mîrasan bi qîmettira ku dê-bav karibin ji zarokên xwe re bihêlin, mîrasa axretê ye. Xwezîya me bi wan dê-bavan be ku zarokên xwe dixin hafiz û bi îrfan û kultura Qur’anê tezyîn dikin!..

Pêğemberê Xuda di hedîsa şerîf de[37]dibêje:

36. Tehrîm, 66/6.
37. Ev hedîs, ji terefê Gonenlî Mehmet Efendî ve bi wesîleya cemîyeta hafiztîyekê zikr kiribû.

*“Kî Qur’ana Pîroz bixwîne û pê amel bike, roja qiyametê tacek li dê-bavên wî tê kirin. Nûra vê tacê, ji ronahîya ku dema taverojek li maleke dinyayê were danîn dide, hê sipehîtir e. Naxwe nûra wî kesê ku bizzat bi Qur’ana pîroz amel dike wê çawa bibe? Hûn li serê bifikrin!”* [38]

Îro ji bo hînbûna zimanekî bîyanî hezar û yek ked têne xerckirin, di navbera kolejan de qiyas tê kirin û xwe ji bo ti xercî û mesrefekê jî nadin paş. Li hemberî vê jî rewşeke çi ğemnak û hezîn e ku mirov fêrgehên Qur’anê piştçav bike, -heta wan biçûk bixe- zarokên xwe ji kelamê îlahî û ji rûhanîyeta wî mehrûm bike. Haleveku serkeftin û mûweffeqîyeta sipehîtirîn ev e; mesleke xêrdar li pey xwe bihêlin ku piştî em bimrin jî wê ji bo me herka heyata manewî ya me temîn bike û ewê li dûv me jî jime re bibin dûago.

Divê zarokên me bi awayekî wisan werin gihandin ku di keş û hewaya ji feyz û bereketa Qur’anê tije de, bi taybetî ji qissetên pêğemberan û ji peyam û mesajên îlahî yên di van qisseyan de xeberdar, werin perwerdekirin. Elzem e ku em bi heyecana îmaneke wiha zarokên xwe teqwîye bikin da ku di vê axir zemanê de zarokên me xwe ji koncalên rezaletê û ji afeta bêdînîtîyê biparêzin. Ji bo vê li kêleka perwerdeya Qur’anê, divê mirov li ser sîyera pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- yanî li ser heyata

38. Ebûdawud, Witr, 14.

nimûneyî û mûbareka wî jî himbiz bibe. Lewra wî, bi jîyîna nimûneyî û mûstesna'ya xwe ji bo Qur'anê tefsîra zindî ye. Ji bo mirov bikare bi jîyana Mezinê me Pêğember re temam bibe û bikare bi awayekî rastî sunneta wî talîm bikin jî, divê mirov bi jîyîn û exlaqê xwe li ser rêç û şopa pêğemberê Xuda birêve biçe û hewl bide ku xwe bi wî bişibihîne.

Zarokên me yên ku bînahîya çavên me ne, di netîceya ku dê-bav wezîfeyên xwe bicih nayênin û perwerdeya pêdivî ya manewî nadin ewladên xwe, wek zarokê medya û çapemenîya ku ji xirabîyê re têhn e, bi zêhnîyeteke maddeperest mezin dibin. Herçî ew zarok in, adeta televîzyon wan bi çiçikên xwe şîr dide, televîzyon şekl dide pora wan û televîzyon hest û xeyalên wan dîyar dike. Dema wiha bibe jî sade wezîfeya ğulamtîyê dikeve ser milên dê-bavan, yanî ew daxwazên zarokên xwe bînin cih.

Ji xwe nexasim rewşa zarokên me yên ku bi îmkanên wekî televîzyon, înternet û yên wekî van ketine koncalên programên xirab û der-exlaqî ku dil û hinavên mirovî ji bo wan dişewitin. Razî-bûna bi van halên ku kezeba mirovî dihelînin, ji bo dê-bavan sînyala ezabekî ye ku mirov nikare hesabê wan bide.

Hema em ji tişta besîttirîn destpê bikin; zarokê misliman, çi cihê dağ û mixabinîyê ye ku heta hîkayetên heyata gellek sporçî û artîstên xwecihî û bîyanî jiber dikin, wan ji bo xwe dikin nimûne û diferfi-

tin ji bo xwe bi wan bişibihînin. Lêbelê ew navên pêğemberan nizanin, haleveku ew di rêya heqîqet û seadetê de rêber in, wan nas nakin û ji exlaqê wan re bîyanî mezin dibin û di bara wan de ji peyamên Qur'anî îbretê nagirin. Maneya vê rastîya ğemnak ev e; ne em zarokên xwe perwerde dikin, lêbelê bîyanî wan perwerde dikin. Yanî barê mezinkirina maddî ya zarokan li ser milê dê-bavan e, lêbelê berêdana rûhên wan jî aîdê bîyanîyan dibe. Kulfet û zehmetîya wan, dê-bavên wan dikişînin lêbelê ber û menfîeta wan jî bîyanî diqurêfin û werdigrin. Heta ku ev ğalibîyet û serdestîya kulturî û perwerdeyî di dest xwe de bigrin, ev hal, wê sibeh rojê ji terefê wan ve li dijî me heta bi ğalibîyetên din jî here, Xuda neke.

Ji bo wê, divê em zarokên xwe di navbera pevçûnên perwerdeyî û cengên kulturî yên bêeman de di talîm û perwerdeyê de li hemberî tarîxê îmtîhanên xwe dîsa bi serkeftinê mohr bikin. Divê em zarokên xwe li gorî şeref û heysîyeta xwe perwerde bikin, bigihînin. Divê zarokên me ji dinyaya rûhî ya xwe heta bi cil û lixwekirina xwe, li ser kok û qurmên xwe geş û şîn bibin.

Îslamê di bara cil lixwekirina ji bo heysîyeta însanîyetê guncaw de hinek qaîde û rêz û rêç anîne. Yek ji wan qaîdeyan jî ev e ku divê qîyafet ne ew qeder teng, yan jî tenik û şefaf be ku xetên bedenê derxîne holê, yan jî bike ku laşê mirovî têde bixuyê. Dema Resûlûllah-sellellahû eleyhî we sellem-

Esma'ya xweha Hezreta Aîşe dît ku wa ye wê cileke ew qeder tenik lixwe kiriye, serê xwe ji wê vegerand û jê re wiha got:

"*Ey Esma! Jin piştî baliğ bibin, -rûyê wê û destê wê îşaret kir- ji wê û ji wê pê ve xuyabûna devereke din a wê rast nabe.*" [39]

Ev mijar, yek ji wan qaîdeyên bingehîn e ku Îslamê ew danîne ji bo wan bizav û tevgeran asteng bike ku şeref û heysîyeta jinîtîyê rencîde dikin. Ev yek ji wan xusûsa ye ku divê mêr û jin herdu pevre bi titizî wê li ber çavan bigrin ji bo sihê neyênin ser şeref û fezîleta ku jin bi aferîna xwe ji wan re xwedî ye.

Li alîyê din, dîsa yek ji wan xusûsên ku divê mirov lê miqate be ev e; berî zarok baliğ bibin, divê mirov odeyên kurik û keçikan ji hev cuda bike da ku kemal û gihana manewîya zarokan pêkwere û şexsîyet qezenckirina wan jî tam li wan rûne.

## *Wek çi berpirsîya mêran heye ji bo malbata xwe biparêzin?*

Mêr, divê malbata xwe ji her cure xirabîyan biparêze. Divê ew ferdên malbata xwe ji wan hevalan, ji wan ger û serdanan, ji wan weşanên xirab ên di televîzyonê de, ji wan kitêbên bêsecîye û bêsewîye û

39. Ebûdawud, Lîbas, 31.

ji wan rojname û weşanên ku wê nirxên dînî û sipehîtîyên exlaqî yên malbata wî xirab bikin, dûr bigre.

Xulase, wezîfeya parastina malbatê hem ji hundur ve û hem jî ji derve ve bi temamî bi mêr hatiye dayîn.

### *Gelo ew xusûsên din çi ne kudi esnaya sewq û îdareya malbata xwe de divê mêr li wan miqate bin?*

Divê mêr li sînorên dînî miqate be, heta mecbûr nebe divê her hewl bide di hawîrdorek û karekî de nexebite ku têde mêr û jin tevlîhev kar bikin. Heke ew li derveyî îradeya xwe mecbûr bimîne ku di mekanên wiha de kar bike jî, divê ew li çavê xwe û hereketên xwe miqate be. Divê ew edeb û hessasîyetên ku dînê me ferman kirine li ber çavan bigre. Heke ew di cih û statûyakarsaz de be, divê ew ji bo hawîrdoreke karê wiha tevlîhev nebe wesîle. Heke pêwîst bike divê ew ji bo mêr û jinan zeman û mekanên cuda cuda yên kar û xebatê tertîb bike û rê li ber ketina çewtî û şaşîyan bigre. Bi taybetî divê ew hewl bide wan mirovên ku ewê bi tena serê xwe bi wan re bimîne ji hevcins û hevzayendên xwe bibijêre. Divê ew xwe bi sebebên cuda cuda û behaneyên curecur ji wezîfedarkirina sekretêrên xanim û yên wekî van dûr bigre. Di roja îroyîna me de mixabin ev rastîyeke tehl e ku ev bizav û tevgerên şaş rê li ber hevberdan û ruxîna malbatî vedike.

Mêrekî aqilmend û dîrayetmend, dema gav diavêje pêpelinga mala xwe dizane aqilê xwe li ber derîzana derî bihêle; dema ew diçe kargeh û ticaretxaneya xwe jî dizane hissîyatên xwe li ber derîzana derî bihêle.

Divê mêr, di mûnasebet û têkilîyên digel malbat û zarokên xwe de di xusûsa karên dinyewî yên wan de xeta û qusûrên wan xweş bibîne û li wan bibûre, wan efû bike. Divê ew bi merhemet û helîmtîyê ji wan nêzîk bibe û ji wan re berbuhêr be. Divê ew ayb û sirrên xanima xwe ji her kesî veşêre.

Divê ew ji kêmasî û îhmalkarîyên dînî yên wan jî bi ciddîyet nêzîk bibe. Divê ew bi biryardarî bi ser neyênîyên wekî cehalet û sistahîyên wan de here. Divê ew di her halûkarî de ji bo daxwazên agahîyên dînî û temamkirina kêmasîyên xanima xwe û zarokên xwe titîzî û hessasîyetê şanî bide. Di vê xusûsê de Hem divê ew bi xwe kedê xerc bike, hem jî divê ew di vê xusûsê de ji perwerdekarên pispor û bilîyaqet ên ku divê feyde ji wan were dîtin jî, îstîfade bike. Ev jî peywir û wezîfek ji wezîfeyên bavan e.

Mêr, di karên nav malê de divê li hemberî hevsera xwe û ferdên malbata xwe bi peyvên nerm û xeberên xweş dilê wan razî û memnûn bikin û bi çehreyeke abûs, rûtirş û hovane wan ji cem xwe nede dûrkirin. Mezinê me pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- gotiye:

“**Qenctirînê we ew kes in ku li hemberî jinên xwe qenc bin**.” [40]

Divê mêr, bi jina xwe re di mijara debar û rêvebirîya malê de îstîşare bike û divê ew karên ji taqeta wê zêde jî bi wê nesipêre, jê re hewale neke. Divê ew dem bi dem di terbîya zarokan de ji xanima xwe re bibe arîkar. Lewra hem zarok, hem jî karên nav malê bi şev û roj zehf zêde jinan diwestînin. Di vî barê giran ê wan de ji bo wan arîkar-bûn, wê ji bo zêdebûna mehebbet û di hev gihiştina navbera wan de bibe wesîle.

Divê mêr, di hizûra jina xwe de û li pişt wê jî her jê re dûa bike.

Divê mêr ji xanima xwe bêxeber dernekeve neçe rêwîtîyên dûr. Dîsa divê ew wan kesên ku nas nake bêxebera jina xwe wek mêhvan neyêne malê. Divê ew li derveyî pîvanên meşrû ji xanima xwe nexwaze ku ew derkeve pêşberî nemehreman û xizmetê ji wan re pêşkêş bike. Bi qasî ku mûmkin bibe divê ew malbata xwe ji hawîr û qadên jin û mêr tevlîhev, dûr bigre.

*Bi hemû derd û barê wê ve berpirsîya sewq û îdareya malbatê li ser pişta bavan hatiye barkirin, dema ew bi awayekî rastî vê wezîfeya xwe bînin*

40. Tirmizî, Rada, 11. Ji bilî vê jî li Ebûdawud, Sunnet, 15; Îbnûmace, Nîkah 50’an binêrin.

*cih, gelo ewê bi çi bigihin, çi ji wan re hene?*

Dînê Îslamê, adeta malbat ji bav re bi emanet kiriye û di xusûsa pêşwazî û temînkirina hemû îhtiyacên maddî-manewî de hem tam wezîfe, hem jî tam selahîyet û desthilatî bi wî daye. Bi vê sebebê di nav malbatê de meqamê reîs û serdarîyê ji bav re hatiye terxankirin.

Bav, di asîmanê dilşadî û seadeta malbatê de taveroj e; dê, ew heyv e ku şewq û berqînokên dilên malbatê û perdeyên îffeta wan ji xwe re bi xêlî û sêhwanrohnîya zîvî kiriye; zarok jî wekî stêran li asîmanê wê fezîletê durr in.

Bavê ku hêza xwe, îradeya xwe, zanîna xwe û tecrûbeya xwe ji bo terbîye, hizûr û gihandin û kemala malbata xwe hesr û texsîs dike; helbet heta tu bibêjî bes ew ji bo xwe hurmet, îtaet, hezkirin û rêzgirtinê zehf zêde heq dike. Naxwe bê-îtaetîya wî, îsyan û nankorî û peyvên xirab ji wî re hîç layiq nabe.

Bi vê sebebê Mezinê me pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- gotiye:

"*Rizamendîya Xuda, di rizamendîya bavî de, ğezeb û ezabê wî jî di hêrz û ğeyda bavî de veşartî ye.*" [41]

41. Tirmizî, Birr, 3.

Divê di nav malbatê de xanim û zarok berê xwe ji îtaet û hurmeta ji bavê re ku ew di meqamê serdarîya malbatê de ye, hîç venegerînin. Lewra ew wextên ku ji bavan werin mehrûmkirin, tarîtîya mehrûmîyeta ji hemû mehrûmîyetan ğemnaktir û hezîntir e. Ehemmîyeta ku bav di nav malbatê de bi xwe re hildigrin, di nebûna wan de zehf kûrtir tê hisskirin. Ji ber vê ye ku dema ew sağ û li heyatê bin divê qîmetê wan were zanîn, divê jin û zarok ji bo qezenckirina dûayên wî hewl bidin, divê ew ji fermanên rewa yên wî re îtaet bikin û divê ew di hurmet û xatir-girtina wî de jî sistahî û qusûrê nekin..

# Mijarên ku Divê Jin û Mêr di Nav Malbatê de li wan Miqate Bin



*Dê-bavên ji hemû dê-bavan dilovantir û bi merhemettir in ew dê-bav in ku hem xwe hem jî ewladên xwe ji bo evdînîya ji Xuda re hazir û amade dikin.*

*Mêr û jin, bi hev re hêlîneke dadimezirînin, heyata xwe bi yek dikin û biryarê didin ku çi bi serê wan de were jî bi nîvî parve bikin. Dema ew heyatê parve dikin ew xusûs û mijar çi ne ku divê herdu teref jî li wan diqqet bikin?*

Li vir divê mirov balê bikişîne ser du nuqteyan:

**-Parvekirina dilşadî û keyfxweşîyan,**

**-Parvekirina bar û tengasîyên jîyanê**

Parvekirina hevbeşa ku em jê re heyata mûşterek dibêjin, divê ew di her halê heyatê de di keş û hewaya rûhanîyet û mehebbetê de berdewam bike. Çawa ew keyfxweşî û dilşadîyan parve dikin, divê aynî wisan keder, ğemgînî û îbtîlayan jî parve bikin; divê teref her dem ji hev re bibin piştevan, divê ew ji hev re bibin wekî herdu destên mirovekî ku ew bi xwe hev û din dişon û dîsa divê ew herdu ji hev re bibin serkehnîya hev-tesellî-kirin û hev-hedananînê..

Lewra jîyan, her dem li ser ewrên pembe dewam nake. Divê ew jibîra nekin ku jîyan, daketin-rabûnên wê, bager û tofanên wê, vîraj û fetlên wê hene. Rojên ku hê tên ji bo mirovan, bi mechûl û surprîzan tije ne. Qeder jî sirreke îlahî ye. Bi vê nêrînê serkehnîya piştevanî û hêza ji hemû hêzan mezintir, berî her tiştî îmana bi Xuda û pêbendbûna bi wî ye. Piştevanîya mezina duduyan jî ew hevjîn bi xwe ne ku bi hev û din ve kelîne. Divê were diqqetkirin ku heke însanên bêçare û bêhal, di mûsîbet û felaketên mezin ên ku bi serê wan de tên de ji nava malbata wan bi xwe ew piştevanîya ku hêvî dikin jê re neyê, dikarin bi herifîn û ruxanên mezintir re rûbirû bimînin. Lêbelê di wan hêlînên ku ji wan ferdên bi rûhê xwe gihayî û têgihiştî pêktên de badîre û dîyaredeyên ku bi serê wan de tên dikarin wan bi qasî sağlemîya malbata xwe bi hêsanî berteref bikin.

Sağlemîya malbatê, wek di dehma gihana rûhî de bi taybetî bi ehl-bûna wan ji bo pevre derbaskirina li hemberî hev û din ve bend e. Ev, ji bo encamên sipehîtî û xêran şertê ji hemû şertan mûhîmtir e.

Hezretê Mewlana dibêje:

“*Gulê, ji ber ku bi strî re xweş derbas kiriye, ew bêhna xweş qezenc kiriye. Vê heqîqetê ji gulê jî bibihîze. Binêre ew çi dibêje: «Ji ber ku ez bi strî re bûme çima bikevim ğeman, çima ez xwe bi dest ked-erê ve berdim? Min kenîn, ji ber ku pevrebûna bi wî strîyê xuy-xirab re tehemmul kiriye, bidest xistiye..*

*Ez bi wesîleya wî bi wan îmkanan giham ku sipehîtî û bêhna xweş ji êş û eleman re pêşkêş bikim..*"

Ev gul, ji me re jî dibêje;

"Tu jî wekî min bibe!"

### *Divê ew li çi diqqet bikin ji bo bikarin pêkhatina malbateke wiha tendurust, sağlem û xurt damezirînin?*

Berî her tiştî di malbatê de saedet, mijareke ku dikare bi dualîyan were bicihanîn. Bingeha vê jî evênhan:

1. Baş bi hev re derbaskirin,
2. Bi têgihiştinî û bi kamilbûnî hereket kirin,
3. Fedakar bûn, pêktînin.

Ev jî bi taybetî bes bi fezîleta exlaqî, dîrayet, zekawet, semîmîyet û hessasîyeta hevber mûmkin e.

Dîsa wekî ku mirovên berê jê digotin; "Husna mûaşeretê" ji bo baş pevre derbaskirinê divê di herdu alîyan de jî ev taybetmendîyên ha hebin:

1. Dîndarî,
2. Fezîlet,
3. Mehebbet,
4. Merhemet,

5. Sedaqet.

Zerûreta (bivê-nevê-bûna) hebûna van wesfan wek li hemberî hev hem di mêr de hem jî di jinê de, bi wesîleya karesat û facîayên malbatî yên ku her roj têne jîyîn bi awayekî hê eşkeretir derdikeve holê.

**Dîndarî** û **fezîlet**, çawa di civakê de wisa ne di malbatê de jî bingeha hemû wesfên sipehî ne. Ew hêlînên ku di wan de dîn bi awayekî rast û sipehî tê jîyîn û têde fezîletên exlaqî û mezîyet têne raêxistin, ji însanan re seadeta herdu dinyayan bexş dikin. Di rewşeke berevajî de di halên ku dûrketina ji dîn çêbûbe û exlaq zeîf bûbin de çawa ferdên malbatê zirarê ji wan dibînin, aynî wisan civak jî zirareke mezin ji wan werdigre.

Li vir, divê mirov mijara dîndarîyê rast fehm bike. Însan hem dîndar hem jî hov, bernebuhêr û bênezaket nabe. Lewra dînê Îslamê ji serî heta bi binî ji nezaket, zarafet û nezafetê (paqijîyê) îbaret e. Yanî ayîna[42] Îslamê edeba sipehî ye, edeba sipehî ye, edeba sipehî ye..

Çawa şair gotiye:

"*Edeb tacek bûye ji nûra huda,*
*Wê tacê wergire, emîn bibe ji her bela..*"

Hezretê Mewlana dibêje:

42. Ayîn; dîn, ol e.

"*Aqilê min xwe tewand ber guhê dilê min û jê pirs kir:*

*«-Dîn çi ye?»*

*Dilê min jî ev bersiv dayê:*

*«-Dîn, ji edebê îbaret e.»*"

Herçî **mehebbet** e, ew jî havên û xureka malbatê ye. Di rewşên ku mehebbet kêm bûbe û bi hovane hatibe perixandin de lerze û hej li malbatê dikeve.

Mehebbet, divê dualî bibe. Lewra mehebbet, wekî mîsala derxûnên hevgirtî yên di fîzîkê de dilan ji bo dan û standina tesîrê dixe rewşeke mûsaid û amade. Însan çi qeder hez bike, ew qeder tê hezkirin.

Li alîyê din, çi qeder mehebbet zêde bibe divê ew qeder tevger û peyv jî zirav bibin bi nezaket, zarafet û hurmetê werin xemlandin. Mehebbet, divê bi ti awayan nebe laûbalîtî, divê daîmî çarçoveya edebeke dîyar li ber çavan were girtin. Mehebbet, merhemet û hemû hestên wekî van, divê tim li ser îtîdalê bibin. Mehebbeta zêde zêde çawa zirarê dide, aynî wisan bi temamî mehrûmkirina hezkirîyên xwe ji mehebbetê jî dikare berê wan bide hinek cihên din ji bo van hestên xwe tetmîn û têr bikin.

Mehebbet di plana nefsanî tenê de hiştina wê û derbasbûna wê ji tixûbê xwe, çawa ew dikare rê li ber çavnebarîya zêde zêde û zext û fişaran veke, aynî

wisan kêmbûna wê jî dibe sersebebê îhmalê. Her yek ji van herdu rewşan jî ji bo hêlîna malbatî afet e.

Bi aynî awayî **merhemet** jî, divê ew jî ji zêdegavî û îhmalê dûr bibe. Merhemeta zêde zêde însanî lawaz dike, berê wî dide ser vê şaşîyê ku ew li hemberî xetayên zirarbexş û ruxaner jî xweşbîn û mûsamehakar bibe. Ev ne merhemet e, lêbelê lawazîyeke qelbî ye.

Li alîyê din dema merhemet kêm bibe jî hişkbûnîyê dide qelb û însanî bi ber zulim û zordarîyê ve diajoyê. Merhemeta bi rêya navîn di qiwameke navbera şîrîn û dijwarîyê de jî berhemdar dibe û seadetê tîne malê. Dê-bavên ji hemû dê-bavan dilovantir û bi merhemettir ew dê-bav in ku hem hev û din, hem jî zarokên xwe radikin nimêja sipêdê û ji her nêrînê ve cîgerpareyên xwe ji bo seadeta axretê hazir dikin.

Herçî **sedaqet** e, ew jî yek ji wan mijaraye ku divê herdu teref pevre îhtîramê ji hev re şanî bidin. Sedaqet, bi maneya xwe ya peyvî, rastî ye, rast bûna însanî hem di peyvên xwe de hem jî di karê xwe de maneya wê ev e; ew derewan neke. Bêşiwar ji hêla sihhet û tendurustîya zewacê û berdewamîya wê ve zehf giring e ku hevjîn, di her halûkarî de li ser rastîyê dewam bikin û xwe ji her bizav û peyvên ku pevbawerbûna navbera wan xirab dikin, dûr bigrin.

Mijareke zehf mûhîma dîgera ku divê hevjîn lê miqate bin jî ev e; ew xwe ji pev-bawer nebûna

zêde zêde û ji çavnebarîyan biparêzin. Lewra yek ji tiştên ku zehf însanan nerehet dikin, îtîmad li wan nekirine. Heke di vê mijarê de gellek sebebên ciddî derkevin meydanê berî sûc xistina stûyê hev, divê ew li hev-rûniştin û pevre-xeberdanê biceribînin. Heke na divê ew meseleyên biçûk-miçûk mezin nekin û wan nexin problemên mezinên ku êdî mirov nikaribe xwe ji nav wan derxîne.

Dîsa ji hev re sadiqbûna mêr û jinê, çavên xwe û dilên xwe nedana ser însanên din e ku ew jî ji hêla selametîya malbatê ve yek ji wan şertên nebe-nabe ye. Ji bo mirov nekeve tehlûkeyên wiha şert e ku mirov hessasîyetê ji wan esas û qaîdeyan re şanî bide ku Îslamê ew di bara mûnasebet û têkilîyên mêr û jina ji hev re bîyanî de, danîne. Kirina wan bizavên ku însanan bixin şubhe, zen, şiwar, gotegot û wesweseyan, hem şeref û îtîbara însanî xirab dikin, hem jî hêlîna malbatê dixin xeterê.

Tezahureke dîgera sedaqet û pevbendîyê jî ev e ku herdu teref ji dê-bavên hev û din re ğayet hurmetkar û ehlê xizmetê bibin. Li ser vî esasî, divê keçên me yên bûk û xortên me yên zava jî çawa hurmet û elaqê ji dê-bavên xwe re şanî didin, divê aynî hurmet û elaqê ji xezûr û xesûyên xwe re jî şanî bidin. Sibehrojê ew jî dê di aynî nuqtê de bibin. Heke ew bi xetakarane bizav bikin bi tabîreke erebî: “**Men deqqe duqqe!**” yanî “kî çi bike ewê jê re bibe mûxateb.” Ya rasttir mîsaleke din ji bo vê peyvê; “ewê

bike wê bibîne.” Wê ew bi xwe bibin. Yanî wan çi kiribe di rojekê ji rojan de ewê heman tiştî li pêşberî xwe bibînin.

*Di zewacan de temînkirina debarê wezîfeya mêra ye. Baş e, gelo di xusûsa li ber çavan girtina malbatê ya ji bo îqtîsad û teserrufê de jî mesûlîyet û berpirsî sade ya mêr tenê ye?*

Dînê Îslamê, di bara pêşwazîkirina li xercî û mesrefên debara malbatê de wezîfe li ser mêr bar kiriye. Lêbelê ev, nayê vê maneyê ku divê ew her cure daxwazên ferdên malbatê derhal bîne cih. Îhtiyacên meşrû û zerûrî, divê bi qasî derfetan werin dabîn û temînkirin. Heta heke ew zengîn bûbe jî ne rast e ku her daxwaza însanî ya dibe-nabe jî were pêşwazîkirin û bicihanîn. Lewra kirina her tiştê ku hatibe xwestin, bi derbasbûna zemanî re daxwaz û îştahan dinepixîne û dikare ji tetmîn nebûna nefsê, harbûnî û heta îsyana wê re bibe sebeb jî. Nefseke wiha, her ku biçe wê xwedbîn bibe û ewê xwediyê xwe di girdab û gera xwe tenê hizirînê de helak bike, bibe nemanê. Ewê malbatekê tevî bi hemû ferdên wê ve ji xwe re dîl û yexsîr zen bike. Ewê destpê bike her tiştî îstismar bike, ji bo berjewendîya şexsî ya xwe bikar bîne.

Bi kurtî ew însanê ku îmkan û derfetên wî zehf hebin û ew jî van derfetan di îstîqameta arzûyên

nefsê de bikar bîne, nefsa wî adeta wê bibe wekî “hespekî” ku liğab û gemê qebûl nake. Bi vê sebebê digel ku derfet û îmkanên wî bi zehfî hebin jî dereng xistina hinek daxwazên zêde zêde şert e ji bo însan ji hêla manewî ve kamil bibe, lingê wî li erdê sabit û cihgir bibe, rastîyên heyatê bibîne û rizamendîya Xuda qezenc bike. Divê neyê jibîrkirin ku sebra eslî, sebra di dema hebûna derfet û îmkanan de ye. Lewra hebûna derfetan bi berdewamî regez û unsura tehrîkê ye.

Her tişta xwestî derhal bicih neanîn û di rêya gihandin û kamilkirina însanî de şopandin û taqîbkirina metodeke perwerdê, di aynî zemanî de hikmeteke îlahî ye. Cenabê Heq, hinek caran taleb û dûayên evdên xwe qebûl nake, hinek caran wan texîr û dereng dixe, hinek caran jî wan qebûl dike. Meqsûd ji vê ev e; bende bi temamî xwe bi vê dinyaya fanî û mirok ve girênedin, di nav nîmetan de nekevin harbûnîya serxweveçûnê û mûhtacbûna xwe ji Xuda re fehm bikin. Lewra însan, dema di nav hezar û yek texlît diltengîyan de be, dema ew bi hêvî û emelên xwe negihabe jî naxwaze ji dinyayê biqete. Ji xwe nexasim heke her daxwazên wî bicih werin, heke ew bi hemû xeyalên xwe bigihe, ewê bi ti awayan nexwaze ji dinyayê cuda bibe here. Ew dikare ber bi xetayên mezintir ve heta bi ber îsyanê ve jî were ajotin. Çawa ji ber ku Adem -eleyhisselam- nexwestiye ji cennetê veqete, derkeve “zelle” kiriye û ew ji bo dinyayê hatiye peyakirin. Bi vê

nêrînê, di perwerdekirina zarokan de û di bicihanîna daxwazên wan de divê mirov hem wan demên zor ên ku dibe ew di paşerojê de li wan rast werin, hem jî roja hesabê li ber çavên xwe bigre û bi awayekî endazmend û bipîvan hereket bike.

Tabîî ye ku ji tixûbê pêwîst zehf zêdetir kêmkirina xercîyan û kar gihandina bi nemerdî û xesîsîyê jî, berê xwe vegerandina ji hinek îhtiyacên zerûrî-heyatî jî ne bizaveke rast û meqbûl e. Divê ew di navbera van herdu halan de xeteke rêya navîn taqîb bike. Xuda di ayeta pîroz de dibêje:

“(Ew bende) **dema xerc dikin ne îsrafê dikin, ne jî nemerdîyê dikin, di navbera herduyan de rêyeke navîn digrin**.” [43]

Ev rêya navîn, hevkêşîya heyatê ye. Xesîsî û nermerdî çi qeder xirab be, îsraf yanî bi destbelavî çarcur kirin û xerckirin jî ew qeder xirab e. Mêr yan jî jin, çi qeder îmkanên wan berfereh bin jî bi ti awayan maf û heqê wan nîn e ku malê xwe çarcur bikin û wî bi îsrafeke destbelavane û hovane xerc bikin.. Heqê ti kesî nîn e, bibêje: “Mal yê min e, ez çawa bixwazim ezê wisan wî xerc bikim..” Ellah Teala ew mal bi emanetî daye wan û ewê roja qiyametê jî ji wan re bibêje; *“we malê xwe li kuderê û li çi tiştî xerc kir?”* Ewê hesabê her cure xerckirinê yek bi yek ji wan bipirse.

43. Furqan, 25/67.

Çawa Xuda di ayeta pîroz de dibêje:

“**Heqê lêzimên xwe, xizanên xwe û rêwîyan bide. Li cihê nepêwîst jî bi destbelavî îsraf neke!.. Lewra ewên ku wiha bi destbelavî îsraf dikin, hevalên şeytên in. Şeytan jî li hemberî Rebbê xwe zehf nankor e**.” [44]

Îslamê her texlîtê îsrafê ji bo her kesî qedeğe kiriye. Destbelavîya di nav malbatê de jî çi ji mêr be, çi ji jinê be hîç ferq nake. Ew nexweşîyeke xirab e, her divê were astengkirin. Heke ev nexweşî li rûhê însanekî hatibe bikaranîn, zor e ku êdî ew însan di nav hizûr û rehetîyê de bijî.

Ev îbtîla, di roja me ya îro de jê re “harbûnîya xerckirinê” tê gotin. Însan bi tişta heyî bes nake, temakarî û îhtîrasa ji bo her tiştê nû û cihêreng normalîze dike. Pertalên malê, telefon, qîyafet, araba û tiştên wekî van di gellek qadên din de jî, digel ku îhtiyac bi wan nîn e dîsa pertalên di dest xwe de bi yên nû diguherîne, dibêje; “moda” ye, qîyafetên taze û nû ji xwe re dikirre û tiştan werdigre, hewl dide ji bo cilan ji hinek markayan lixwe bike.. Ev tişt tim û daîm zeîftîyên însanê di pençeyên vê nexweşîyê de ne. Netîce jî xusran e! Dema îmkanên wan netêr û kêm bin jî deynan werdigrin, kartên krêdîyê bikar tînin û bi taybetî jî tevlî ribayê dibin. Encama mirovên ku hewl didin ji bo arzû û hewesên xwe tetmîn û têr bikin, zehf xirab dibe. Mirovên wiha zêdebarî vê

44. Îsra, 17/26-27.

jî ji ber ku di teqana deynan de têne veşartin,vêca radibin bi nêzîkatîyên wekî; “arîkarîya min nakin!” derdorên xwe îtham dikin.

Ev hal, netîceyeke ğemnak ya bikar-neanîna aqilî û hestan bi awayekî hevkêşane ye. Ji lewma divê mirov berê xwe nede ser harbûnîya xerckirinê; lêbelê divê berê xwe bide ser bereketa sebrê. Lewra Xuda, hindikî jî gellekî jî tim û daîm ji însanan re bexş dike ji bo ew ji hikmetekê, îmtîhanekê re bibin wesîle, naxwe ji bo ew ji sebr û şukrê re bibe wesîle. Divê mirov bifikre ku wek dinyewî xurt be jî hindikbûna îmkanan zehf bêhtir evdî ji Rebbê wî nêzîk dike. Daîmî dema îmkanên wî xilas dibin însan dibêje; “eman ya Rebb!” û Xuda tîne bîra xwe. Tişta ku însanî dike însan jî, hest bi nekarîna xwe kirina wî ye. Mezinê me pêğemberê Xuda -sellellahû elkeyhî we sellem- gotıye:

“*Ya Rebbî, min bi awayekî layiq tu nas nekirî, min bi awayekî layiq evdînî ji te re nekir*.” Di nav nekarînê de bi Rebbê xwe îltîca kiriye.

Dostên Heq, li gorî sewîya qelbî ya mûmînan, pîvanên qiyafetên wan wiha diyar kirine:

-Di şerîatê de qiyafet, ji hêla helal û heramî ve tixûb nebûrandin e.

-Di tesewwifê de qiyafet, ji tixûbê îhtiyacê biwêdetir neçûn e.

-Di heqîqetê de jî, ji cil û bergan re mehebbet û elaqeyeke zêde zêde şanî-nedan e. Yanî lixwe-kirina cilên sade û temîz e, digel vê jî meşğûl nekirina qelbî ye.

Heke însan, bi rastî di dîtina cihê ku diravên xwe lê xerc bike de dikeve zorê û bi vê sebebê berê xwe dide ser îsrafê bila ew vê jibîra xwe nederîne; bila ew destê xwe yê arîkarîyê ji bo mirovên ji xwe hewcedartir dirêj bike. Lewra heke ew ji xwe arîkarîyê dike hingê bila wê arîkarîya xwe hîn zêdetir bike. Lewra ev hem îcaba însanî ye, hem jî îcaba dînî ye. Însanê difikre ku di diravên wî qezenc kirin de heq û para feqîr, hewcedar û sêwîyan jî heye, ew nikare serweta xwe bi hovane xerc bike. Îslamê çawa ew prensîbên ku dîyar dikin ka dirav ji kîjan cihan têne qezenckirin, danîne aynî wisan ew qadên ku ew dikare malê xwe li wan xerc bike û ew qadên ku ew nikare malê xwe li wan xerc bike jî dîyar kirine.

Xuda di ayeta pîroz de gotiye:

“**Di rêya Xuda de xerc bikin! Xwe bi destên xwe neavêjin tehlûkê. Ya ku hûn bikin, sipehî bikin! Ellah ji mirovên ku** (kirinên xwe) **sipehî dikin, hez dike**.” [45]

Divê hîç ev neyê jibîrkirin; di zeman û mekanekî ku însan di nav birçîtî û sefaletê de diferfitin

45. Beqere, 2/195.

de qurûşeke tenê ya ku li îsrafê were xerckirin jî li axretê hesabekî giran ê wê heye.

Li ser vî esasî însan, nîmetên ku bidest xistine her şev berî raze bila wiha tefekkur bike û ji bo wan jî ji nîmetbexşê xwe Cenabê Heq re şukir bike. Divê ew vê mijarê bihizire;

Di demeke ku çendîn însan di rewşeke birçî û tî de ne têr nivistin, di demeke ku bêjimar kes hene di nav tehlûke yan jî îhtiyacê de dihejin de di hewcenebûnî û asayîşê de bûn, bi sebeb felaketan di mewsima zivistanê de çendîn însan hene ku bi awayekî ji êwirgeheke germ mehrûm li qûntara çîyayên Hîmalaya'yê şeva xwe derbas dikin bi awayekî rehet xwe li ser nivîna xwe dirêj kirin, hem nîmeteke çi mezin e, hem jî mesûlîyeteke çi mezin e..

Ha divê di heyata me de ji bo tefekkura mûhasebeyeke wiha ku her roj berî razanê were kirin wê cihek hebe ku hîç neyê îhmalkirin. Çawa Hezretê Ûmer -radîyellahû anhû- gotiye; "*berî hesab ji we were pirsîn hûn hesabê ji nefsa xwe bipirsin*." [46]

Hezretê Ûmer -radîyellahû anhû- dîsa gotiye:

"*Heke li kenarê Dîclê mêşinek bikeve avê û bixeniqe, Xuda wê hesabê wê ji Ûmer bipirse*." *"Ya Ûmer! Te îro ji bo Xuda çi kir?"* Wî bi îfadeyên wekî van hesab ji nefsa xwe pirs kire û wî mûhasebeyeke wijdanî ya kûr dikir.

46. Tirmizî, Qiyamet, 25/2459.

Ha di wan însanên ku di nava xwe de vê hesta mûhaseba nefsê zindî digrin de taybetmendîyek dertê holê ku ew hizûra rûhî û asayîşê temîn dike ku ew taybetmendî jî “qenaet” e!...

Qenaet zengînîya ji hemû zengînîyan mezintir e. Sewîya zengînîya dilî ya însanekî, bes bi qenaetkarîya wî tê pîvan. Însanên qenaetkar, dizanin bi îmkanên di dest xwe de bes bikin. Di xusûsa hê ji wan zêdetir (xwestin) de îhtîrasên zêde yên wan nîn in. Ev jî dibe sebeb ku ew bi rûhê xwe rehet bibin û bi qederê jî razî bibin. Lêbelê divê ev jî bi ti awayan wek tenbelî û berê xwe vegerandina ji heyata kar û xebatê neyê fehmkirin. Tam berevajî vê tişta ku em hez dikin bibêjin ev e; piştî kar-kirina di nav pîvanên meşrû û hêvkêş de razîbûna bi lutfa Xuda ye. Ewê ku bi tişta di dest xwe de razî be, ew bi qasî taqeta xwe hewl dide arîkarîya dîgerên xwe jî bike. Lêbelê ew kesê ku tişta di dest xwe de bes û kafî nabîne, her dem hê bêhtir dixwaze ji xwe ew arîkarîya dîgeran nake; lêbelê her dem çavnêrî dike ku dîger bi xwe arîkarîya wî bikin.

Civaka esrê seadetê ku ev fezîletên me jimartin û çendîn fezîletên din jî têde dijîyan, civakeke wisan bûye ku bi ufûqa “**wuslet**”ê gihabûne. Ew serdem, serdema feyzdara ji nêzîk ve û ji dil û can naskirina Xudê Teala û Resûlûllah -sellellahû eleyhî we sellem- bûye. Di wê civakê de menfîet û îhtîrasên dinyewî ji dilan hatibûne deranîn. Mal û can bes wek

wasîteyeke nêzîkbûna ji Xuda û Pêğemberê wî hate bikaranîn. Di navê de îman bû lezzet û merhemet her berefeh bû. Êdî xizmet-kirina ji mexlûqatên Xuda re bû terzeke heyatê. Hevhal-bûna bi halê pêğemberê Xuda ji bo eshabê kîram bû îdeala ji hemû îdealan mezintir. Kîjan tewsîye û îqaza ku pêğemberê Xuda ferman kiribe wek fermaneke pîroz bi hurmet û îtîna heta hetayê ew bi taca ser seran hate kirin.

Civakek temam bi pîvanên qenaetê jîya. Xer-ckirina zêde zêde, luks, îsraf, goştxwerî û rîyakarî terzeke heyatê bûye ku nesl û civaka sehabîyan ew nas nekiriye. Dilan ev heqîqeta; “**sibe wê qûnağa vê nefsê mezar be**” îdrak kir. Mewla û pêğemberê wî di navenda dostanîyê de hatin bicihkirin. Ew ci-vaka ku berê nizanîbû bixwîne û binivîse, dema berê xwe da ser tehsîla Îslam û Îmanê di medenîyetê de bi zirwe bû. Hemû qelb di nav hesta “**Ellah ji me dixwaze em çawa bibin? Resûlûllah arzû dike di me de çi bibîne?**” jîya. Heyat bi rizaya Xuda ve hate girêdan. Merhemet û şefqet kûr bûn; hessasîyeta ji heq û edaletê re bi zirwe bû. Ji bo sehabîyan, wextên heyatê yên bizewqtirîn û bimanetirîn, bûne ew zem-anên ku di wan de peyam û mesaja wehyê ji însanan re dihatin gihandin û teblîğkirin. Îro em jî divê bi taqîbkirina karwanê vê fezîleta wan bigihin bilind-bûna manewî û divê em wek civak jî bigihin heman hizûr û sipehîtîyan.

Dê û bav, ha divê bi vê mûkemmelîyetê werin stran û divê ew bi heman awayî sêlek û zarûzêçên xwe jî terbîye û perwerde bikin. Bi taybetî jî divê ew hîç ferq û meylê di navbera ewladên xwe de nekin. Çi di navbera kur û keçan de, çi jî di navbera zarokên xwe yên ji heman zayendan de edalet û yeksanî (wekhevî)yê li ber çavan bigrin. Dibe ku însan nikaribe hezkirina di nava xwe de tixûbdar bike, lêbelê ji hindikahî ve divê ew di dan-xuyakirina vê hezkirina xwe de ferqdarîyê li holê nedeyne. Mesela dema ew tiştekî ji yekî re bikirre, bila wê ji yê din re jî bikirre. Dema ew yekî ramûse bila yê din jî ramûse û bila yekî ji wan îhmal neke. Welhasil divê ew bi ti awayan nebe sersebeb ku tuxmê hesûdî û çavnebarîyê di navbera zarokên wî de geş û cihgir bibe.

Divê dê-bav cîranên xwe jî ji însanên çak (baş) bibijêre. Divê ew bala xwe bide ser mûnasebetên xwe yên bi cîran û lêzimên xwe re ewên ku exlaqê wan xirab û dînê wan zeîf bin. Yanî dema ew bifikre wan îrşad û îqaz bike jî divê ew zarokên xwe neavêje tehlûkê.

# Li Dor Perwerdeya Zarokan



*Heke bera em bixwazin zarokên me ji eyb û qusûran xalî bin, divê em hewl bidin ku her yek ji dê-bavan jî bêeyb û bêqusûr bin.*

### *Divê malbat di perwerdeya zarokan de wekî çi li ber çavan bigrin?*

Pêşî divê em bînin bîra xwe ku ji bo me tevan zarok sipare û emanetekî îlahî ne. Ew gulpikên giranbiha ne, ku ji cewhera hebûna me dirêj bûne, zîğ dane. Bi dilên dilovan, di nav malan de pêşî mûzîka dilşadîyê bi dengê zarokên nûza destpê dike ku ew dilan aram dikin.

Zarok çawa di hedîsa şerîf de hatiye îfadekirin; ew *“çîçekên cennetê”*, *“fêkîyên dilan”* û *“bexşîş û ajareke îlahî”* ne.

Li ser vî esasî zarok, kerem û nîmeta Rebbê me ne, ew çi xweş nîmet in!.. Ma hîç ew dilşadîya gihayî tê jibîrkirin, ewa ku dema zarokê me yê nixurî, yê pêşî tê dinyayê, ewê ku me dike dê, me dike bav?

Lewra çîriskên keyfbûrandin û sefaya di kenê wan de dişibihe paqijî û beriqînîya bihiştê. Xwedîkirina zarokan, terbîyekirina wan, perwerdekirina û hedîye-kirina wan ji bo civakê, ji bo her dêyekê karê ji hemû karan çêtir e. Lewra dilê dê, mekteba

pêşî ye ku têde her zarok perwerdeya xwe û terbîya xwe werdigre. Zarokên salihan ku cehd û xebat ji bo perwerde û terbîya wan tê kirin, li axretê di navbera dê-bavên xwe û cehennemê de dibin perde û hîcab. Wezîfeyeke ji hemû wezîfeyan giringtir ji bo dê-bavan perwerdekirina zarokên xwe bi xêr û fezîletên fitreta Îslamê ye. Ew zarok ajar û nîmeteke Heq Teala ne, ji dê-bavan re hatine bexşkirin.

Her wiha perwerdekirina zarokan li ser îman û îstîqametê û wek welatparêz rakirina wan û ders û talîm-dana wan, ji bo her dê-bavî berpirsîya ji hemû berpirsîyan mezintir e. Perwerdekirina zarokan bi tore û edebên Îslamê wesîle ye ji bo xêr û hesenat di deftera amelên dê-bavan de werin nivîsîn û heta di piştî wefata wan de jî ew defter wê her vekirî bimînin..

Zarok di hêlîna malbatê de fêkîyekî bêhempa yên dilşadîyê ne, ew di navbera dê û bavê de sağlemtirîn û bikoktirîn peywendî ye. Bi rastî ew ji Xuda, ji bo her dê-bavî emanetekî giranbiha ne.

Mezinê me pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- di hedîsên şerîf ên xwe de berpirsîya mirovan wiha eşkere dike:

**“Hûn tev şivan in û hûn ji şivantîya xwe jî berpirs in. Lîder şivan e û ew ji şivantîya xwe berpirs e. Mêr di bara ehlê mala xwe de şivan e û ew ji şivantîya xwe jî berpirs e. Jin jî di bara mala mêrê xwe de şivan e û ew jî ji şivantîya xwe**

**berpirs e. Xizmetkar di bara malê xwediyê xwe de şivan e û ew ji şivantîya xwe berpirs e. Hûn tev şivan in û ji şivantîya xwe jî berpirs in**."[47]

Ev berpirsî û mesûlîyet di vê ayetê de jî warid bûye, hatiye:

"**Gelî yên ku îman anîne! Xwe û ehlê xwe ji agirekî mûhafeze bikin ku şewateka wî însan û kevir in; li ber wî agirî hinek melaîketên dilhişk û dijwar wezîfedar in; Xuda çi fermanê li wan bike bêemrîya wî nakin û çi ferman li wan were kirin wê dikin, bicih tînin**."[48]

Pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- berpirsîya ku di vê ayetê de warid bûye wiha tefsîr kiriye, gotiye;

"*Xuda çi li we qerdeğe kiribe, hûnê wê li ehlê xwe qedeğe bikin. Xuda çi ferman li we kiribe hûnê wê fermanê li wan jî bikin. Ev, wê di navbera wan û êgir de bibe parêz.*" [49]

*Di perwerdeya zarokan de divê mirov ji kuderê destpê bike? Gelo lêdana zarokan û cezakirina wan cureyek ji vê perwerdê ye? Di perwerdeya zarokan de ew karên ku divê malbat wan li ber çavan bigre, çi ne?*

47. Buxarî, Wesîyet, 9/839; Sahîha Mûslim, el-Îmare, 20.
48. Tehrîm, 66/6.
49. Alûsî, Cild 28/156.

Perwerdeya zarokan pêşî divê ji perwerdekirina dê-bavan destpê bike. Lewra ev perwerdeya mezin, ew terbîye û talîm e ku derfet bi her dê û bavê gihayî bexş bikin ji bo ew bikarin wê bicih bînin. Ew dê-bavên ku bikarin sifetê mûrebbî yan jî perwerdekar qezenc bikin. Vêca ew dê-bavên ku bi xwe bê perwerde bin wê çawa bikarin zarokên xwe perwerde bikin?

Şair ev hewcedarîya dê-bavan bi perwerdê wiha daye nasîn û gotiye:

*Ew kalê bi arîkarîyê hewce be*

*Ew bi xwe wê çawa arîkarîya dîgerê xwe bike!*

Ji bo vê, heke perwerdeya zarokan bi perwerdeya dê-bavan destpê bike hingê wergirtina fêkîyên berhemdar mûmkin dibe. Çawa şair gotiye:

*Bav sitûna malê ye, divê rizqê wî helal be,*
*Dê dilê malê ye, divê ew guleke ğayet germ be.*

**Şair Seyrî**

Di ronahîya van heqîqetan de, bi kurtî em dikarin wan karûbarên ku divê dê-bav di perwerdekirina zarokan de li wan miqate bin wiha rêz û xulase bikin:

**a-** Divê dê-bav «**navekî sipehî**» li zarokê xwe bikin. Divê ew nav rûhanîyetê îşaret bike. Lewra navê sipehî, heqekî pêşîn ê zarokaye li ser dê-bavên wan. Lewra nav bandorê li navokê dike. Yanî

ew navê ku li zarokî hatibe kirin sifetê wî li ser wî zarokî xuya dibe.

Çawa ew rîwayeta ku Taberanî tedwîn kiriye jî vê rastîyê îfade dike, dibêje:

"*Rojekê pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- gazî kir hêştirek hate anîn, got:* "*Kî wê vê bidoşe?*" Zilamek rabû ser xwe, pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- jê re got: "*Navê te çi ye?*" Zilamî jê re got; **Merre** ye. Pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- jê re got: "*Tu rûne.*" Piştre got: "*Kî wê vê bidoşe?*" Zilamek rabû ser xwe, pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- jê re got: "*Navê te çi ye?*" Zilamî jê re got; *Harb* e.. Pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- jê re got: "*Tu rûne.*" Piştre got: "*Kî wê vê bidoşe?*" Zilamek rabû ser xwe, pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- jê re got: "*Navê te çi ye?*" Wî jê re got; *Ye'îş* e. Pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- jê re got: "*Tu wê bidoşe.*"[50]

**b-** Ji bo zarok di hawîreke geş û xweş de xwedî bibe, divê diqqet lê were kirin ku luqme û parîyên ew jê dixwe ji helalî bin.

**c-** Dema zarok mezin dibin bi awayekî berdewam digel zarokên ji xwe mezintir dipeyivin, wan teqlîd dikin û hereket û reftarên xwe ji wan digrin. Ji ber ku xusûsîyeta teqlîdê raser û zal e, ewê ku teqlî-

50. Taberanî, el-Mûcem, 22/277; el-Mûwetta, el-Îsti'zan, 24/3569/794.

da mirovekî dike çi xuy û bizavên wî hebin, wan jî teqlîd dike û wan ji xwe re dixe nimûne. Ji bo vê tiştê ku ji zarokan re werin rapêşkirin jî bila ew ji tiştên sipehî bin û ew hal û bizavên ciwan bin ji bo zarok wan jî ji xwe re bixin nimûne.

Mesela zarok di hawîreke mûnaqeşe û pevçûnê de be, exlaqê wî xirab dibe û tebîetê wî hişk û dijwar dibe. Lêbelê dema zarok li hawîreke aram û seqamgîr be, ew ji xwe re exlaqê xweş û tebîetê nerm û nazik digre û ew wisan mezin dibe.

**d-** Divê dê-bav bêyî agahî û xebera zarokên xwe tim û daîm hal û hereketên wan û reftar û bizavên wan kontrol bikin. Bi taybetî divê mecal ji wan re neyê hiştin ji bo ew li cihên nependî û goşeyên tenha çewtî û xetayan bikin ku ew neşên li ber çavên xelkê wan xeta û çewtîyan bikin. Lewra di rewşeke wiha de şexsîyeta wan lawaz û bêîrade dibe û kesayetîya wan averê dibe. Xuyahîya pêşîna vî halê xirab jî di şexsîyeta wan de wek derew û rîyakarî xuya dibin.

**e-** Divê dê-bav reftar û bizavên qenc ên zarokên xwe «teqdîr» û «xelat» bikin. Lêbelê divê ew çavên xwe ji xetayên zarokên xwe jî negirin. Lewra dema reftar û bizavên erênî werin xelatkirin ew di şexsîyeta zarokan de koka xwe kûr berdidin û sağlem dikin. Li hemberî vê jî dubarekirina “xetayên ku ew di bara wan de neyên şîyarkirin” jî di aynî

wextî de ew xeta û çewtî dibin beşeke xwezayî ji şexsîyeta zarokan.

Ji ber vê sebebê, divê di bara xetayên qiyafet û cil lixwe-kirinê de di salên biçûkîtîya zarokan de bi taybetî ji bo keç-biçûkan sistahî û ğemsarî neyê kirin. Lewra ew tiştên ku ji însanî re bibin adet, dibe ku paşê ew li ser wan bi israr dewam bike û êdî dest ji wan berdan mûmkin nebe.

**f-** Divê dê-bav bi dubare dubare cezakirina zarokên xwe wan nexin rewşeke erzşikandî û bêqîmetkirî êdî ew bibin zarokên lêdanxwer. Her wiha dema ew bêhemdî xwe firağekê yan surahîyekî yan jî cêrekî bişkînin ne rast e ku mirov li erza wan bide û bi wan de biğeyide. Lewra ev rewşên halo ji rêzê ne dibe ku em dê-bav bi xwe jî bûyerên wisan bikin. Di helwesteke wiha de zarok bawer û fehm dikin ku li erza wî hatiye xistin û îtab lê hatiye kirin ji ber ku ew ne xurt e. Lewra dema em tiştekî wiha dikin ti kes bi me de nağeyide û li erza me naxe. Hem jî ev helwesta ha di zarokan de li hemberî nirxên durust ên perwerdeyî yên din de jî ku kîjan dê-bav bidin bertek û reaksîyoneke tund tîne holê. Kengê firsend were dayîn ewê bandoreke xirab têde çêke. Ji ber vê divê em pirr bi baldarî û diqqet hereket bikin. Divê em di rûdanên besît ên di nav malê de her wekî şikandina firağan, îstîkanên çayê û yên wekî van -ku em mezin bi xwe jî dikarin bêhemdî xwe wan bikin- jî li hemberî zarokên xwe bizavên dijwar û

nedilovanane nekin. Divê em şîyarî û îqazên xwe jî bi zimanekî nerm û xeberên xweş îfade bikin.

Digel vê jî bi awayekî qet‘î çênabe em li hemberî xeta û ğeletîyên zarokan ğemsar û mûsamehakar bibin. Lewra ew xeta û ğeletî wê bandora xwe li ser tebîet û exlaqê zarokan bikin. Lêbelê ya giring ev e; em pê bidin qebûlkirin ku ew kirina wî xeta bûye û ew ne mafdar bûye. Divê ceza, berêdan û qedeğeyên ku li serê têne sipandin jî û ew terbîye û perwerdeya ku ji zarokan re tê dayîn jî ji xeta û bizavên çewtên wan re guncaw û mûnasib bin. Lewra ev, di pêkanîna zarokan de dibe arîkar ku ew xetayên xwe îtîraf bikin. Lewra rabûna bi cezadanê bêyî îsbatkirina xeta li serê û dan pê iqrarkirina bi gunehê xwe, berhemdar û bihavil nabe. Mesela heke zarok li cihekî derewan bike û dê-bavên wî, wê li serê îsbat nekin û pê nedin îtîrafkirin mûmkin e ku ew xwe heqdar bawer bike û ji ber ku dê-bavên wî ew li serê îsbat nekirine û jê re îzah nekirine jî vêca ew bi xwe rabe wan îtham bike û xetayên xwe jî bixe stûyê wan.. Ji bo vê:

**g-** Dema ferman, qedeğe û rêz û tore li zarokan werin hînkirin bi qasî têgihiştina wan divê sebebên wan ferman û qedeğeyan ji wan re werin şerhkirin û ew werin iqnakirin.

**h-** Divê dê-bav edebên mûaşeretê (usûlên mûamelê) û bingehên exlaqî li zarokên xwe hîn bikin. Bi taybetî divê malbatên zengîn zarokên xwe

ji teserrufatî û danstandinên îsrafkarî, xwe mezinkirin û tekebbura li hemberî hevtemen û hevaldersên xwe qedeğe bikin. Lewra ev danstandin, bi zemanî re ahengsaz û adetî dibin. Divê dê-bav tewazû û nefsbiçûkatîyê li zarokên xwe bidin hînkirin û divê qisseya “Qarûn” ya ku di sûretê Qeses de derbas bûye bi zimanekî ku ew fehm dikin ji zarokên xwe re vebêjin.

**i-** Her wiha divê dê-bav di çarçoveya tixûbên dînî de firsend û keysê bidin zarokên xwe ji bo ew “zarokatîya xwe bijîn”. Lêbelê divê azadî zehf ji wan re neyê dayîn. Lewra rehetîya zêde rûhê ezperestîyê di wan de geş û bilind dike, dibe sersebebê tenbelbûna wan. Her wiha zext û fişara zêde jî dibe sersebeb ku zarok bibin xwedî şexsîyeteke bi xwe nebawer, lawaz û qels. Zext û fişara zêde zêde ne ku tenha dibe sersebeb ji bo zarok bibin xwedî şexsîyeteke bi xwe nebawer û qels, her wiha ew carina serdide û dibe sersebeb ku zarok li înad û rikdarîyê siwar bibin û bibin serhildêr û îsyankar. Her wiha zarok di piştî bigihin hinek salên mûayyen de wek encama wan zext û fişarên zêde bi awayekî taybetî li ber dê-bavên xwe radibin û li şîret û gotinên wan guhdarîyê nakin. Bi van sebeban divê bi uslûbeke hevkêş wextên wan bi reftar û bizavên wisan werin tijekirin ku bibe wesîle ji bo ew bibin însanê baş.

**j-** Divê dê-bav ajar û nîmetên Heq Teala di bîra zarokên xwe bixin û bikin ku hemd û şukir-kirin ji

wan re bibe adet û hîndekarî. Divê dê-bav hewl bidin ji bo hawîra civakî ya zarokên xwe di şûveke rûhanî de normalîze bikin û ji sîyera Mezinê me pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem-nimûneyan ji wan re bide ji bo ew fezîlet ji wan re bibin tebîet.

**k-** Divê dê-bav hîn di salên biçûkatîya wan de zarokên xwe ji bo kirina nimêj û taetê û amelên xêrê hîn bikin. Mesûlîyeta îbadetê û giringîya amelên xêrê li zarokên xwe bidin fêrkirin.

Bi kurtî heke em bixwazin zarokên me ji eyb û kêmasîyan xalî bin pêşî divê em dê-bav jî hewl bidin ku ji eyb û qusûran xalî bin û em bi xwe ji zarokên xwe re bibin nimûne.

Perwerdeya zarokan pêşî divê bi vê destpê bike; divê dê-bav di dilê xwe de ji zarokên xwe yên mewcûd hez bikin. Divê dê-bav bi vî sifetê wan ji zarokên xwe hez bikin; ew li cem me emanetên Xuda ne. Divê ew vê hezkirina xwe jî ji bo gihiştina dilşadîya dinya û axretê bikin wesîle. Heke em li dûv xwe kinês û nesleke qenc perwerde nekin wê qebra me ğerîb û bêkes bimîne. Divê em jibîr nekin ku sibehrojê wê mala rasteqîne ya me qebr be. Tefekkur û temennîyeke çi sipehî ye, ya di wê çarîne ya ku şair Seyrî di rêya mûhaseba sibehrojê de nivîsîye:

*Nepirse, gelo dahî ji nû ve têne cezakirin*

*Bila paşeroj li hev bitewe û ezma rabûrîyê were îdrakkirin*

*Bila her dê, careke din Fatîh û Selîman biwelidînin*

*Dergûş vala maye, ey sibehroj, xwedî bendên ğerîb!*

### *Ew hessasîyeta ku divê dê di bara perwerdeya zarokên xwe de li ber çavan bigre û wê bide xuyakirin çi ye?*

Di mîsalekê de tê gotin: “Dê mektebek e.” Wê dê bibe “perwerdekara pêşî û mezintirîn”. Ev perwerdekarî jî bi vê çêdibe; ew nimûneyên sipehî û xweş ji zarokên xwe erz dike, bi vî awayî di rûhên wan de hinek berhem û eserên sabit dihêle. Lewra ew li malê zehf zêde bi zarokên xwe re dimîne.

Naxwe her gotin û peyva ku ji devê dê derdikeve wekî wê kelpîçê ye ku di avakirina şexsîyeta zarokî de tê danîn û lêkirin. Dilê dê yek ji beşên dersê ye ku zarok têde hîn dibe. Dê, mezintirîn serkehnîyên dilovanî û rahmê ne. Perwerdekirina zarokên ji terbîya dê mehrûm zehf zor û zehmet e. Kesên xwedî şexsîyeta bilind ji nav wan zarokan dertên ku dêyên salîha bi terbîye û perwerdeya wan rabûne.

Her dêya salîha ya fedakara ku barê rabûna bi wezîfe û erkên giranbiha hildide ser pişta xwe, her wekî karûbarên nav malê, terbîya zarokan û xizmeta mêrê xwe di dirêjahîya temen û emr de hêja ye ku

însan zehf jê hez bike, xatirekî kûr jê re bigre û jê re spasî û şukirê xwe pêşkêş bike.

Mislimanên rêzdar û xwedî fezîlet li alema îslamî di bara rêzgirtina ji dê-bavan re bi taybetî ji bo dê nimûneya ji hemû nimûneyan bilindtir raxistine ber çavan. Di serê van de jî Mezinê me pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- tê. Ew her hefte diçû serdana şîremaka xwe Helîme û wî cubbeyê mûbarek ê xwe li ser axê radixist û dixwest şîremaka wî li serê rûne. Çi dema şîremakên wî dihatin hundurê odeya wî, yan jî ew jê derdiketin ew her ji ber wan radibû ser xwe û wan jî hurmet û sîyaneta xwe jê re didane xuyakirin.

Çawa divê bi awayekî taybetî ew dêyên ku firsenda wan heye zehftir têkilîyan ji nêzîk ve bi zarokên xwe re deynin, divê ew di bara perwerdeya zarokan de ku ew bînahîya çavên wan e, xanimên sehabî ji xwe re bikin nimûne û li pey rêç û şopa wan herin. Yanî ew xanimên sehabî ku li ber destê terbîye û perwerdeya Mezinê me pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- rabûbûn û êdî bûbûne dêyên nimûneyî, ew zarokên xwe yên ku di dîdar û lîqaya pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- de dereng mabûn û ew zarokên wan yên ku ji demeke dûv-dirêj û mêj ve çav bi pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- neketibûn şîyar dikirin..

Li ser vî esasî dêya Hezretê Hûzeyfe -radîyellahû anhû- îtab lê kiribû ji ber ku çend rojan wî

pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- nedîtibû. Ew bi xwe wê hîkayeta xwe wiha vedibêje:

“Dêya min ji min pirs kir;

Cara dawî ya ku te mezinê me pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- dîtî kengê bûye?

Min jî jê re got:

Ji çend rojan ve min nekarî herim hevber wî.

Ew zehf ji min hêrs bû û bi awayekî xirab îtab limin kirin. Min jî jê re got:

Dayê firsendê bide, li min hêrs nebe, ezê bi lezûbez herim cem pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem-, ezê pê re nimêja meğribê eda bikim û ezê jê bixwazim ji bo ew hem ji bo min hem jî ji bo te lêbûrînê bixwaze.”[51]

Di rêya vê terbîye û perwerdê de divê em zarokên xwe ji dudilî, hîlebazî, şeytanî û îsrafê biparêzin. Divê em navên sipehî û şîrîn li zarokên xwe bikin. Divê em Qur’ana Pîroz bi wan bidin naskirin. Divê em derfeta tamijîya îbadetê ji Xuda re bi wan bidin çêjandin. Bi taybetî jî divê em di hê di salên biçûkatîya wan de kirina nimêjê li wan bidin hînkirin. Divê em bikin ew dilên paqij ên zarokan ku hê nelewitîne, zewqê ji wê dilşadîya ku bi arîkarîya hewcedaran û bi înfaqê çêdibe, ta‘m bikin. Di van

51. Tirmizî, Menaqib, 30; Ehmed bin Hembel, Mûsned, c. 5/391-2.

karûbaran de divê em bi dereceyeke zehf mezin xwe ji reftar û bizavên şaş û nerewa biparêzin. Yanî divê em xwe ji nelêyîtî û neyênîyên ku ezperestîyê zêde dikin, biparêzin. Lewra zarok jî ji bo hemû reftar û bizavên li cem dê-bavên xwe aynî wekî vîdeo û kasêtên qeydkirinê meyla qeydkirin, teqlîd û jêgirtinê dikin û ew nizanin ka ew reftar û bizavên dê-bavên wan rast in, yan jî nerast in. Mesela, heke em li ser vê bûyera ku tê, tefekkur bikin, emê sûretekî bikişînin ka çawa teserrufatîya xirab di bara înfaqê de dorê li aqilê zarokê besît û negihayî digrin:

Wêjezanekî li erza hewcedarekî yextiyar û nexweş dida. Di wezîyeteke perîşan de ew hatibû ber derîyê wan. Edebîyatzan jî li ber keç-biçûka xwe bû. Keçbiçûka wê bi besîtî û dilpakî jê re got:

"Ey bavê xweşewîst ê min! Çima tu dilê vî belengazî dişkînî?"

Bavê dilhişk jê re got:

"Keça min, tu li van nemeyzîne! Evên ha, ji vê şerm nakin û ew xwe di stûyê mirovên din de dikin bar! Dema mirov mal dide wan jî ew îsrafê dikin û wî di tiştên heram de xerc dikin. Heta dibe ku evên ha jime jî hê dewlemendtir bin."

Ji ber ku ew kesê hatibû ber derîyê wan mirovekî zehf mûhtac bû, çi dema wî di xwestinê de israr kir û got:

“Ji bo Xudê, sedeqekekê!” Bavê wê hêrs bû û bi dengê bilind got:

“Bêşermo, ji vir dûr here!”

Ji bo vê, ma ev keçbiçûka ku bi çavên serê xwe ji vê bûyer û van teserrufatî û xeberên tehl û ne xweşên bavê xwe re bûye şahid çendîn ew di serê pêşî de ji hessasîyatan tije bûbe jî lêbelê dema ew mezin bibe, nabe keseke ku arîkarîya hewcedaran nake?. Li tenişta vê jî êdî ma ewê nebe ku ew hest bi hewcedarîya wan nake, ew wan hiss nake û wijdana wê dê ji bo êş û elemên wan naêşe?

Ji bo vê, bavê merhûm ê min **Mûsa Efendî** -quddîse sirûh- dema dixwest sedeqe û tiştekî bide hewcedarekî car caran ew dida destê zarokan û dikir ku ew herin wê sedeqê bidin hewcedaran û wî hewl dida înfaq-kirin û sedeqe-dan ji bo zarokan bibe adet û hîndekarî. Carekê dema wî ji bo xizmeteke giring sedeqe û arîkarî kom dikir, çavê wî li ser kurikekî heft-salî yan jî heşt-salî bû, ew li kêleka wî zehf jê nêzîk bû. Her wekî ku wî kurikî hest bi van awirên wî kiribû û wî jî xwe amade kir ji bo ew jî wekî mezinan înfaq bike, wî jî destê xwe bi berîka xwe ve dirêj kir û wî tebab û miqdarekî hindik ji diravên di berîka xwe derxistin û ew xistin sindoqa sedeqan, ew daneke mezin ji dilekî biçûk bû.. Mûsa Efendî -quddîse sirûh- ev kurik li tenişta xwe dît, hêdîka destê xwe bi ser serê wî de bir û anî. Piştî ew hemêz kir jî bi uslûbeke nazik jê re got:

“Kurikê min, te pirr baş kir, ev bîstek bû çavên min li ser te bûn. Heke te tiştek nedaba, te ev kalê xwe ğemgîn dikir!”

Ev nimûne hemû çi xweş îzah dikin ka helwest, reftar û exlaqê mezinan çawa xwe di zarokan de jî didin xuyakirin.

Li alîyê din jî di hedîsên şerîf de bi sifetê wan ku ew ji kurbiçûkan cuda ne, bi awayekî xusûsî ji bo keçbiçûkan wesîyet hatiye kirin. Lewra îhtiyaca keçbiçûkan ji kurbiçûkan bêhtir bi xizmet, îhtîmam û elaqê heye.

Pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- di hedîsên şerîf ên xwe de dibêje:

*“Kî debara sê keçan bike, wan terbiye/perwerde bike, wan bide zewicandin û qencîyê li wan bike, jê re cennet heye.”* [52]

*“Kî debara du keçan bike heta ew bigihin ber zewacê, ew roja qiyametê tê û ez û ew wiha ne ‘û telîyên xwe bi hev û din ve dan.’”*[53]

Di vê hedîsa şerîf de îzaheke mûbarek heye, ew mûamela bi zarokan re bi taybetî jî mûamela bi zarokên keçik re eşkere dike.

Herçî tişta ku di terbîye û perwerdeya zarokan de divê em bi awayekî taybetî lê miqate bin, mesela

52. Ebûdawud, Edeb, 121/5147; Îbn Henbel, c. 3, 97/11924.
53. Mûslim, Birr, 149/2631; Tirmizî, Birr 13.

lêdanê ye. Ev lêdana zarokan reftar û bizaveke çewt e ku mirov bi ti awayan nikare wê qebûl bike. Di esil û esasê de ji ber ku wan adetên xirab û kevneşopîyên neçê kesb kiribin mirov dikare usûl û qaîdeyên çavtirsên li ser zarokan tetbîq bike; lêbelê hîç çênabe ku lêdan jî di navbera van usûl û qaîdeyan de hebe. Lewra lêdana zarokan, wê bibe sersebeb ku xortên paşerojê newêrek, tirsonek, bêar û bêşerm bin.

Bi îlawe li ser van pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- bi tundkarî û lêdanê terbîye-kirina însan û heta heywanan jî qedeğe kiriye.

Li ser vî esasî pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- hêştireke ku hê ji bo lê siwarbûnê nehatî perwerdekirin ji bo Hezreta Aîşe -radîyellahû anha- hedîye kiribû û tenbih lê kiribû ku divê ew bi lêdan û tundkarîyê wê perwerde neke. Pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- jê re gotibû:

*"Şefqet, di çi karî de bibe wî sipehî dike û ew ji çi jî were kişandin wî berbat dike."*[54]

Welhasil dêya salîha, hemêzeke rahmê ye ku bi şîyan û qudreta îlahî fereh dibe. Ji bo vê pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- gotiye:

*"Cennet, di bin lingên dêyan de ye."* [55]

Cewhera fezîletê di hêlîna malbatê de ku ewê reftara xiraba ferdan û hiddeta bêzarker bi taybetî

54. Mûslim, Birr, 78/4952; Ebûdawud, Edeb, 10.
55. Eş-Şîhab, Mûsned, 119.

jî ji bo zarokan bihelîne û ji holê rake, dilê dê ye. Tovên çîçekên dilşadîyê ji bo dilên dêyan hatine hiştin û sipartin.

Ji lewma pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- bi kirp û israr li ser hezkirina dê sekiniye. Dema jê hate pirskirin; ji her kesî bêhtir kî ji min ku xizmet û hurmetê heq dike? Pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- sê caran li ser hev jê re got: *“Dêya te!”* Piştre jê re got: *“Bavê te!”*[56]

*Jin, divê li hemberî zarokên mêrê xwe yên ku ne ji wê ne; lêbelê ji jina wî ya berî wê ne, çawa mûamele bike?*

Divê ew wan biparêze û guhê xwe bide ser wan her wekî ku ew zarokên wê bin û ji wê bi xwe bin. Divê ew bi hezkirina xwe, îhtîmama xwe, rahma xwe û xizmeta xwe bexîltîyê li wan neke. Mezinê me pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- îhtîram daye xuyakirin û wî di dirêjahîya heyata xwe de her di dilê xwe de hezkirina xwe ji **Fatima bint Esed** dêya Hezretê Elî -radîyellahû anhû- mûhafeze kiriye. Lewra wê di zarokatîya wî de ew xwedî kiribû û aynî wekî dêya esilî ya wî îhtîmam şanî dabû. Dema vê xanima salîha wefat kir, mezinê me pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- hate ser cenazê wê û li ber serê wê sekinî.Wî ev peyvên

56. Binêrin: Buxarî, Edeb, 2; Mûslim, Birr, 1, 2; Îbnûmace, Wesaya 4; Ebûdawud, Edeb, 120; Tirmizî, Birr, 1.

xwe yên ku tên, di hizûra Heq de wek şahid ji bo fedakarî û xizmetên wê gotin:

*"Dayê, rahma Xuda li te be! Piştî dêya min tu bûyî dêya min. Te ez têr dikirim, te ez dinixumandim, te cil li min dikirin, te tiştên xweş li xwe men dikirin û te xwarin dida min, te bi vê rizaya Xuda û mala axretê dixwest."*

Piştre wî ferman kir ku ew sê caran were şûştin. Çi dema ava ku kafûr di navê de bû gihayê, pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- bi destê xwe ew av xist nav ava şûştina wê. Piştre pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- gomlekê xwe ji xwe kir, ew lê kir û ebayekî ku li ser wî bû jî jê re kire kefen. Piştre pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- Usame bin Zeyd, Ebûeyyûb el-Ensarî, Ûmer bin Xettab û lawekî reş gazî kirin, wan qebr dikolan. Wan jê re qebr kolan, çi dema ew gihan bergorê, pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- ew bi destê xwe kola û axa wê jî bi destê xwe jê deranî. Çi dema qebr temam bû, pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- dîsa xwe berda navê, wî bi xwe ew di qebra wê de dirêj kir û wî ji vê xanima salîha re dûa kirin. [57]

Ev hezkirin û hurmeta mezinê me pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- û şukrê wî ku li hemberî hemêza dêyeke wiha dilovan hest pê kiriye

57. Taberanî, el-Mûcemû'l-Kebîr, c. 24/351-2/871; Hakim, c. 3/116-117.

û îfadekirina wî ya vê wefadarî û şukrê, ji bo me bi xwe jî çi îbret û nimûneyeke sipehî ye! Li alîyê din ev çi rewşeke sipehî ye, dêyekê sêwîyek ew qeder baş li ber pêsîra xwe xwedî kiriye ku mehrûmîyeta wî ya ji dê jî pê bide jibîrkirin. Wê ew di hemêza şefqet û dilovanîya xwe de xwedî kiriye û wê bi vê dilovanî û qencîya xwe, bi mûamela xwe ya nazik û bi peyvên şîrînên xwe di dilê vî yetîmê hest nazik û dilşikestî de textek ava kiribû. Ew dêya mezin, wê bi wesîleya wan dûayan di rahma îlahî de ğerq bibe. Bi sebeb van bîranên şîrîn ên ku wê di qelbê vî yetîmê ku di dirêjahîya temenê xwe dilşikestî bû de hiştibûn.

Bi heman awayî heke bav heyata xwe digel zarokên xwe yên ji jinên xwe yên ku berî jinên xwe yên vêga derbas bikin divê nehêlin ku ferq bikeve navbera wan û zarokên wan yên esilî.

*Ez benî, em dikarin hinek nimûneyan ji mûamela mezinê me pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- ya bi zarokan re bigrin ku ew bandorê li me jî bikin?*

Belê, Mezinê me pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- tim û daîm hezkirineke zehf kûr ji zarokan re dida xuyakirin, wî destê xwe bi ser serê wan de dibir û dianî û wî bi telîyên mûbarek ên xwe pora wan şeh dikir. Wî ji mirovên ku hezkirina xwe

ji zarokan re nedidan xuyakirin jî, hez nedikir û wî ew bi dilhişk û qesawetê didane nasîn.

Li gorî Hezreta Aîşe -radîyellahû anha- rîwayet kiriye, gotiye; «Bedewîyekî ji rahm, şefqet, letafet û ziravîya Îslamê dûr ji bo serdana Mezinê me pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- di navbereke ku ew diçû nav nevîyên xwe de, hatibû balê. Ew ji hezkirina dijwara pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- ji bo zarokan, ketibû dehşetê û gotibû: Ya Resûlellah! Ma hûn zarokan maç dikin? Em bi xwe wan maç nakin.»Vêca pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- ji dilhişkîya vî bedewî yê ku li hemberî van ewladên ku jê re nîmetên Xuda ne, ğemgîn bûbû û ji wî bedewîyî re gotibû:

*“Ma ez dikarim çi ji te re bikim, heke Xuda rahm ji dilê te kişandibe!”* [58]

Bi mûcibê vê hedîsa şerîf; divê qelbê mûmînî bi mehebbet, şefqet û rahmê li hemberî zarokan ku emanetê Xuda ne, tije be. Divê ew têbigihe ka ewê şefqet û mehebbetê çawa bide xuyakirin ewê berê wan bide kuderê.

Mezinê me pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- daye xuyakirin ku divê ev hemû rewşên kederdar ên zarokan werin tehemmulkirin. Wî ev jî bi gotina xwe ya ji Ummû Fedlê re gotibû, dema wê

58. Buxarî, Edeb, 22/5998.

xwestibû li nevîyê xwe yê biçûçik bixe ku wî carekê pêve mîz kiribû:

*“Te ezîyet da pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem-, te ew şil kir”.*

Wî jê re got:

*“Rahma Xuda li te be, te kurê min êşand.”*[59]

Pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- dest bi nimêjê dikir û nivîyên wî jî di hemêza mûbareka wî de bûn. Paşê dema ew diçû sicûdê, Hûseyn dihat li ser pişta wî siwar dibû, wî jî sicûda xwe dirêj dikir. Pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- ji bo mirovên ku dixwestin bikevin navbera wî û zarokan jî digot:

*“Dest ji zarok berdin bila ew îhtiyaca xwe bibîne.”*

Her wiha nûra hebûnê pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- dema dengê girîyê zarokan dibihîst, nimêj kurt dikir. Carekê ji bo girîyê zarokekî nimêja xwe kurt kir, di navbereke ku li malê nimêj dikir de jî ji ehlê mala xwe re got:

*“Ma hûn nizanin ku girîyê wan ez ğemgîn kirim.”*

Hezretê Enes ku ji deh salîya xwe pê ve tam deh salên xwe di xizmeta pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- de bûrandine, vedibêje;

59. Îbnûmace, Tabîr, 10/3923.

*“Min deh salan xizmet ji pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- re kir. Qesem bi Xuda ye, wî hîç ji bo tiştekî ku min kirî negot; te çima ew wiha kir?! Yan jî bila te wiha bikira?!”* [60]

Di dawîyê de ew zarokên ku di hizûra mezina pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- de mezin bûn bi ciwanî û fîraseteke cipûcuda xemilîn. Di vê xusûsê de li wir rîwayeteke Sehl îbn S‘ad heye vê rastîyê wiha îfade dike, dibêje:

Vexwarinek ji bo Mezinê me pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- hate anîn, wî jê vexwar, li rexê rastê wî zarokek hebû, li rexê çepê wî jî kalemêr hebûn, Mezinê me pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- ji zarokî re got; *“Tu destûra min didî ku ez wê bidim van..”*

Zarokî jê re got; wellahî, ya Resûlellah! Ez para xwe ji te Pêştir nadim ti kesî! Vêca pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- ew xiste destê wî. [61]

Ev hedîs ji hêla îzharkirina qedr û qîmetê ku pêğemberê Xuda daye zarokan û verêhtina mehebbeta hevber û dualî ve pirr mûhîm e.

Pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- hate serdana me, ew bi şev li dev me ma û Hesen û Hûseyn jî razayî bûn. Hesen av xwest, pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- rabû ber meşka

60. Buxarî, Sewm, 53, Menaqib, 23; Sahîha Mûslim, Fedaîl 82, 51/2309.
61. Buxarî, Eşrîbe, 19/2451.

me, av jê xiste qedehê û piştre av dayê, Hûseyn destê xwe avêtîyê ji bo jê vexwe, wî nehişt pêşî ew jê vexwe û bi Hesen destpê kir. Hezreta Fatima jê re got; ya Resûlellah! Her wekî ku tu ji herduyan bêhtir ji wî hez dikî. Pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- jê re got: *"Na, lêbelê pêşî wî av xwest."* Piştre pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- ev peyvên li jêrê tên, gotin:

*"Di danê de wekhevîyê di navbera zarokên xwe de bikin. Heke min kesek di ser kesekî re bigirta, min jin di ser (kuran) re digirtin."* [62]

Bi rastî pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- ehemmîyeteke zehf mezin bi terbîye û perwerdeya zarokan daye. Wî di vê xusûsê de bi gellek hedîsan eshabê xwe dane hînkirin. Ew di hedîsên xwe de wiha dibêje:

*"Qedrê zarokên xwe bigrin û wan rind perwerde bikin."* [63]

*"Bavekî ji perwerdeyeke sipehî ti mîraseke çêtir ji zarokê xwe re nehiştiye."* [64]

*"Heke zilam zarokê xwe perwerde bike, ev ji bo wî ji dana sa'ek sedeqe çêtir e."* [65]

62. Binêrin. Îbnû Henbel, c. 1/101; Îbnû Hecer, el-Metalîbû'l-Aîlîyye, c. 4/69; Taberanî, el-Mûcemû'l-Kebîr, c. 11/354/11997.
63. Îbnûmace, Edeb, 3/3671.
64. Tirmizî, Birr, 33/1952.
65. Tirmizî, Birr, 33/1951.

*"Dema însan bimre amelê wî qut dibe; lêbelê ji sê tiştan tenê qut nabe; sedeqa carîye, îlmê ku menfîet jê tê kirin, yan jî ew zarokê salihê ku jê re dûa dike."* [66]

*"Heqê zarok li ser bavê wî ev e ku navê sipehî lê bike, rind şîr bidiyê û wî rind perwerde bike."* [67]

*"Kî debara sê keçan bike, wan terbiye/perwerde bike, wan bide zewicandin û qencîyê li wan bike, jê re cennet heye."* [68]

*"Kî debara du keçan bike heta ew bigihin ber zewacê, ew roja qiyametê tê û ez û ew wiha ne 'û telîyên xwe bi hev û din ve dan.'"* [69]

*"Kî bi tiştekî ji van keçan were îmtîhankirin, vêca ew jî qencîyê li wan bike, ew jê re ji êgir dibin perde."* [70]

*Gelo wekî mezinê me Enes -radîyellahû anhû- hinek sehabîyên din jî hene ku zarokatîya xwe di bin terbîya Mezinê me Pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- de derbas kiribin? Ji*

66. Mûslim, Wesîyet, 14/1631; Tirmizî, Ehkam, 36/1367.
67. Beyheqî, Şûabû'l-Îman, c. 6, 11, 401-402/8300.
68. Ebûdawud, Edeb, 121/5147; Îbnû Henbel, c. 3/97.
69. Mûslim, Birr, 149/2631; Tirmizî, Birr 13.
70. Binêrin: Buxarî, Zekat, 10, Edeb, 18; Mûslim, Birr, 147; Beyheqî, Şûabû'l-Îman, c. 11, 142/8308.

*kerema xwe hinek nimûneyan ji wan ji me re vebêje?*

Zehf asayî (tebîî) ye ku gellek sehabîyên wisan hebin. Bêşiwar di serê van de jî mezinê me Hezretê ‘Elî -radîyellahû anhû- tê. Dema ew hate îmanê hê jî di salên zarokatîya xwe de bû. Mezinê me Hezretê ‘Elî yê kurmamê pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- ji nav wê terbîya mûbareka Mezinê me pêğemberê Xuda, dilê xwe bi îlm û marîfetê tije kir û ew bû dergehê îlmê. Wî destpêka sîlsîleyeke tesewwifî pêkanî ku ewê heta roja qiyametê jî her dewam bike.

Birayê wî Hezretê Caferê Teyyar jî mîsaleke cipûcuda ye ji bo mehebbeta pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem-. Hezreta Fatima keça pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- jî bû şahjina ummetê û wê ji xwe re leqeba «**Dêya Bavê xwe**» wergirt. Ji ber ku wê hevaltîya dirêja wê bi bavê xwe re û reftar û bizava bilinda ku wê di temenê xwe yê biçûkatîyê de daye nîşan. Herdu kurên wê mezinên me Hesen bû taca serê eşrafan û mezinê me Hûseyn jî bû taca serê sadatan.

**Mûsab bin Ûmeyr** jî cîrantîya pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- ji bo xwe bijard û wî temamê serweta hevbeşa malbata xwe red kir. Ew di rêya Îslamê de ji bo mirovên dîger jî di fedakarî û tefekkurê de bû nimûneyeke bêhempa. Hezkirina wî ji pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- ew

ajot ser vê ku di vê rêya heq de rûh û rewanê xwe feda bike.

Hê di bîst salîya wî de **Usame bin Zeyd** ji terefê pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- ve wek fermandar ji bo artêşa Îslamê hate tayînkirin.

Bi rastî gellek sehabe hene ku em dikarin wan ji zarokan bijimêrin û ew di hemêza pêğemberê Xuda de perwerde bûne. Lêbelê ewên ku me di van mîsalan de zikr kirin ji xwe têrê dikin, ne hewce ye em hê bêhtir wan zêde dirêj bikin.

*Ez benî, heke destûra we hebe, em hez dikin piçekê li ser salên zarokatîya şexsî ya we biaxivin. Mesela, ji salên zarokatîya we ti bîranîn hene ku hîç we jibîr nekirine yan jî hûn nikarin wan jibîr bikin?*

Helbet li cem her însanî ji zarokatîya wî gellek bîranîn hene ku ew nikaribe wan jibîr bike. Hinek ji van bîranînan jî tesîr û bandorên zehf kûr li ser însanî dihêlin. Ez dixwazim li ser çend bîranînên xwe biaxivim ku wan jî tesîr û bandoreke zehf zêde li ser min hiştine.

Zarokatîya min li «**Erenköy**»ê derbas bûye. Di wê demê de li dora malan cihek hebû li navê gellek park û bostan hebûn. Zêdebarî vê jî li wir mêhvanxaneyek hebû, li qata jêrê bû û gellek serdan û zî-

yaretên semîmî û tije heyat hebûn. Bi taybetî jî di heyva Remezanê de bangên ji bo îftarê ji mala me re pirr dihatin.

Herçî însan bûn, di rojên cuda cuda de û ji çînî û grûpên curecur ji bo îftarê dihatin bangkirin: Rojekê şifêr dihatin gazîkirin. Rojeke din karker dihatin gazîkirin. Rojeke din çopçî û malkêş dihatin gazîkirin. Rojeke din pîşesaz dihatin gazîkirin, rojeke dîtir mamosta dihatin gazîkirin... Piştî îftarê jî hedîyekek ji wan re dihate pêşkêşkirin ku bi navê "**kirêkirina diranan**" dihate naskirin.

Hinek caran ev hedîye qumaşên cilan bûn. Carina jî hinek dirav bûn di nav zarfekê de bûn, tabî ev jî li gorî rewşa mirovê ku hatibû gazîkirin dibû. Piştî nimêja terewîhan jî çayê dihat vexwarin û her kom û grûpê ji karûbarên xwe xeber dida. Ew dem, sipehîtirîn wext bûn ku têde qelbê mirovan tevlîhev dibûn û dilên wan bi hev xweş dibûn.

Yek ji wan karên ku di serdema zarokatîya min de bala min kişande ser xwe jî peywendîyên xweş ên di navbera cîranan de hebûn. Cîranî mûamela xizm û lêzimên xwe bi cîranê xwe re dikir. Em zarok bûn û em jî diketin navbera cîranên xwe û lêzimên xwe. Cîranên dewlemend ji bo hewcedaran wekî hemêzeke hezkirin û mehebbetê bûn. Akincîyên taxê, her îhtiyaca feqîr û miskînan temîn dikirin, heta bi hevkarî cihêzê bûkatîyê jî ji bo keçên sêwî amade dikirin.

Di wan wextan de êşa ziravê zehf belav bû. Antîbîyotîk jî nebûn. Nexweşên êşa ziravê li deverên nav daristanên darkejan (çaman) dihatin dermankirin. Xelkê taxê jî ji bo van ciwanên ku bi êşa ziravê ketibûn şefqeteke mezin nîşan didan. Lewra dermankirina ciwanên ku bi êşa ziravê ketibûn bes li nav daristanên darkejan ew jî bi bêhnkirina darkejê dihate kirin. Gellek caran jî hê di temenekî ciwanîyê de haletên mirinê diqewimîn. Cîran û akincîyên bi merhemet ên taxê jî ji wan re xwarinên ku xwînê çêdikin, hazir dikirin û îkram dikirin.

Ji bo her malbatê karê yekem zîyaretkirina nexweşan bû. Di van serdanan de her kesî li gorî rewşa xwe ya maddî ji nexweşan re bi xwe re xwarinên wekî şorbe û mûhellebîyê jî dibirin û ji nexweşî re pêşkêş û îkram dikirin. Herçî zîyaret bûn, ew kurt bûn û keyfxweşî jî dixistin dilê nexweşan.

Cenaze jî wiha bûne. Bi awayekî bi komel kon û çetr ji bo xwendina Qur'anê û dûakirinê dihatin vedan û heta sê rojan xwarin ji bo mala cenazeyî re dihatin pêşkêş û îkramkirin.

Berî pêncih salan zehf kêm berfgîr (dolaba qeşayê) peyda dibûn. Ji bo hînik-kirina avê cêr, kedûn û sewîl li ber bîrên di nav bexçeyan de dihatin daleqandin. Malbatên ku berfgîrên wan hebûn jî êvarê qeşa ji cîranên xwe re hedîye dikirin. Bi taybetî jî wan ev hedîye bi zarokan re ji cîranên xwe re dişandin. Ev jî ji bo zarokan hê di salên biçûkatîya

wan de qadên perwerdeya dîgerğemî, hevkarî û xizmetê dihatin jimartin.

Di biçûkatîya min de sahilê «**Erenköy**»ê vala bû. Li cihên ku têde behr û bejî bi hev digihan kêmzêde bi qasî du metreyan qadeke sêlihî/qûmî hebû. Me li wir digel zarokan xanîkên sêlihî çêdikirin. Piştî mûddetekê em bi hev re diketin îxtîlafê, em pev diçûn û me ji hev re digot: *“Te cihê min girtiye!”* û *“Na, ji xwe tu bi xwe hatî tixûbê min!”* Piştre pêleke ava behrê dihat li xanîkên me yên ji wê sêlihê didan, me nedikarî di wan xanikan de bi hev re şirîkatîyê bike; lêbelê av dihat li wan dida, ew xirab dikirin û li ber xwe dibirin..

Ev bîranîn îro dikin ku em li ser vê tefekkur bikin; di navbera mezin û biçûkan de bes derecekeke tenê ferq heye. Çi qeder temenê însanî bi pêşve here emel û hêvîyên curecur wî meşğûl dikin, ew emel û hêvîyên ku nayên bawerkirin û ew lerze û hejînên vala ne; lêbelê di dawîyê de her kesek bi zelzeleyekê yan jî bi pêlekê nefesa dawî ya xwe dide û ew ji heyatê cuda dibe û diçe ebedîyetê..

Bi hikmeteke zehf zêde ev miqdarê dawîya heyatê ji bo wan mirovên ku di bara tenzîma îlahî de korîtî li wan ketiye çi qeder xapîneke êşdar û ğemnak e!

Di zemanê zarokatîya me de dema zehftir bi heyecana ku me hestpêkirî ew roj bûye ku têde bi şeklê esilîyê wê hem jî bi dengê bilind ezana Mûhemmedî

hate xwendin. Her kesî bi rêya şîyarbûna zû ya di wê şevê de çavnêrîya bangê dikir. Her wekî ku ew şev, amadekarîya ji bo sibeha îdê bû. Heta dêya min hê ji êvarê ve em şîyar kirin û ji me re got:

«**Di vê sibehê de ezana esilî wê bi dengê bilind were xwendin; bila em sibehê zû şîyar bibin ji bo em ji vê wextê nemînin!**» Ehlê malê ketin nav hewa û atmosfereke cuda cuda ya îsar û dîgerğemîyê.

Her wekî ev sibeh ew dem bû, ew zemanê ezana pêşî ya ku mezinê me Bîlal -radîyellahû anhû- çûbû li ser banê Kabê bang dabû, wê jî wisan bi hest û heyecana manewî dilême nixumandin. Ew her wekî bayê sibehê bû ku olan û dengê banga li Medînê dida xuyakirin. Lewra bang ji bo milletê me îştiyaq, bêrîkirin, meyl û heweseke tam cihêwaz bû.

Li ser vî esasî em hemû carina dema ji Tirkîyê diçin welatekî din vê îştiyaqê dijîn. Dema em li welêt vedigerin qelbê însanî di keyfxweşî û heyecaneke mûmtaz de ğerq dibe.

**XudêTeala Qur'ana Pîroz, banga şerîf, alaya me, welatê me û milletê me ji her cure xirabîyan mûhafeze bike, wan ji hemû xirabî û neqencîyan biparêze.. Amîn!..**

*Gelo hinek şexsîyetên din jî hene ku di serdema zarokatîya we de bandor û tesîreke kûr li we kiribin?*

Du kesayetîyên zehf rêzdar hebûn, di salên zarokatîya min de bi awayekî taybetî bandora wan li ser min zehf mezin e. Ew jî dêya min û bavê min in.. Bi îlawe li ser van jî, tabîî hawîreke xweş û sipehî hebû..

Dêya min şexsîyeteke bimbarek bû, ew xwedî rûhekî ferîşteyî û melaîketî bû. Wê, hê ji dema nermîya neynokên me ve, yanî hê ji dema ku bêhna şîr ji devê me dihat ve gellek gencîneyên hêja di alema dilên me de dane komkirin. Wê bi her navgîn û wesîlê hezkirin û mehebbeta ewlîya dixiste dilên me û wê bi feraseta xwe fezîletên nûranî di bexçê dilên me de diçandin. Digel ku wê ji du zarokan re xizmet dikir û ew bi hinek kar û meşğûlîyetên din radibû jî dîsa wê Qur'ana Pîroz jiber dikir. Yanî di piştî wîladeta birayê min de wê hewldana xwe ji bo hifz û jiberkirina Qur'anê zêdetir û himbiztir kir. Vê hewldana wê jî tesîreke zehf limin kir. Îşqa wê ji bo Qur'ana Pîroz û hewldana wê di rêya heq de bandoreke pirr zêde li min kir.

Herçî bavê min e, ew ji bo min di hemû waran de şexsîyetekî îdeal bû. Têde hemû sifetên qenc hebûn; îşqa Xuda, wecd, îman, îxlas, teqwa, exlaqê xweş, weqûrî û yên wekî van. Ew xwedî hessasîyeteke zehf kûr bû. Ew însanekî ufûq fereh û bilind bû. Mesela di wê wextê de axaftin li ser vekirina lîseya îmam-xetîban hebû. Ji bo derçû û mezûnên lîseya îmam-xetîbê ti paşwexteke dinyewî tine bû.

Lêbelê bavê me bi dilşadîyeke zehf zêde navê me di wê lîseyê de qeyd kir. Wî kir ku em sala paşîyê jî di mektebeke hundurîn de bixwînin. Wî di rojên tatîlê de em bi xwe re li mizgeftan, Seraya Topkapîyê û li cih û mekanên tarîxî yên din digerandin. Wî bi qasî sewîya aqilê me û asta têgihiştina me, ew xizmet û fedakarîyên ku bav û kalên me di rêya dîn, îman, welat û millet de pê rabûbûn û amelên manewî yên esilî yên wan jî ji me re vedigotin.. Li rexê din berê me dida ser vê ku em jî bibin nesleke ji wan re layiq û hêja. Her wiha wî ji dil û can dixwest em car caran biçin serdana seydayên mezin û wî di aqilê me de şefqet, dilovanî û terbîye diçandin. Zêdebarî vê jî wî mirovên xwedî dilên nimûne û îdeal jî bime didane nasîn.

Herçî hezkirina bavê min ji feqîran bû, ji xwe ew jî her wekî behra fereh û okyanûsê bû. Dema wan her xizmeteke ku wî ji wan re pêşkêş kiribû, qebûl dikir, wî ji bo vê qebûla wan ji wan re spas dikir. Dema wî hedîyekeke maddî dida, ew di nava zarfeke zarîf û giranbiha de teqdîm dikir. Heta wî li ser zarfê jî ev hevoka ha dinivîsî: *"Ji bo we bi qebûlkirinê kerem kir, ez ji we re spas dikim!"* Ev rewşa wî netîceyeke siriştî bû, ji ber ku wî ji bo xatirê Xaliqê zulcelal bi letafet, nezaket û mehebbet bi mexlûqatan re mûamele dikir. Wî bi dêya min re xwarin ji nexweşan re çêdikirin û pev re ew ji nesağan re dibirin şîfagehan, dibirin nexweşxaneyan. Wan xuyahîyên rahmê di wan salên zû û virnî yên min de di

rûh û gîyanê min de wekî nexş û nîgarekê kar dikirin; lêbelê min ferq nexistiyê. Bi kurtî dêya min û bavê min ji bo min rahm û bereketeke mezin bûne.

Her wiha ji nav mûhîmtirîn bûyer û bîranînên zehf ên ku bandora wan li ser min çêbûye jî bi îlawe li ser van bûyer û weqaetên ku li salên zarokatîya min vedigerin, ew salên talebetîya min tên, ku min hingê di lîseya îmam-xetîban de dixwend.

Nexasim em di warê seydayên ku di polên dersên me de pişkdar dibûn de şensdar bûn. Em ji rûkenîya bimbareka wan zehf fêr bûbûn û ew xweşbextî hîç jibîra me naçe. Hinek ji wan seydayên me jî ev bûn:

Seyda «**Celaleddîn Oktem**» e. Ew kesekî di heftê salîya xwe de bû. Hem jî wî ji ber êşa felcê bi lerz û reerînê dûçar bûbû. Digel vê jî ew dihate pola mektebê, li ser milê yekî ji hevdostên me pal dida û wî bi heyecana xortekî di bîst û pênc salîya xwe de ders ji me re şerh û îzah dikir.

Seyda «**Ebdûlqadir Keçeoğlû**» ye, ku ew jî bi esilê xwe ji cemaeta Rûman bû; lêbelê îman jê re bûbû qismet. Ew bi leqeba «**Yaman Dede**» dihate naskirin. Piştî wî pazdeh deqîqeyan rêz û rêçên zimanê Farisî şerh dikirin, wî du malik ji Mesnewîyê jî dixwendin. Wî bi girî hemû ders şerh dikirin. Bin herdu çavên wî wekî birkê çûbûne navê. Dema hêstirên wî ji wir dibarîn û xwe bi rûyê wî ve berdidan xwarê, wan rûhanîyeteke cipûcuda belav dikirin. Qelbê wî bi temamî cihêwaz bû û ew bi hezkirina

pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- mişt û tije bû. Dema jê re dihate gotin:

*“Tu çima ev qeder ji Mewlana hez dikî?!”*

Wî ew bersiva ku ji alema qelb vedirêht, dida, digot:

*“Ewladê min, ezê çawa ji Mewlana hez nekim, ma ne ew e, yê ku bi destê min û dilê min girtî û ez birim ber derîyê pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem-?!”*

Gellek tişt hatin û çûn, me ji wê rojê û heta bi vê rojê her ji wan îstîfade kir. Lêbelê ji wê rojê hinek berhem û eser mane ku di qelb de peyda bûne û wî ew di rûh û gîyanê me de dane xuyakirin. Ew lerzeya ku pê digirt hê jî li ber çavê min e, ku dişibiha hirîya payîzê û girîyê wî yê her wekî avrêhtîya biharê bi taybetî dema wî malika; *“Me bi xweşikahîya xwe ferehnak bike, ez şewitîm, ya Resûlellah!”* ji ne‘atê meşhûrê ku nivîsîbû, dixwend.

Me seydayekî din hebû, ew sibehê di saeta heftan de dihat û ji me re şorbe li ser sifrê didanî.

Me seydayekî dîtir jî hebû, dema wî qetek nanê li ser sifrê mayî didît, bi awayekî sipehî nesîhet û şîret li me dikirin, lêbelê bêyî ku li erza ti kesî bide, wî wiha digot:

*“Binêre, lawê min! Gellek hewcedar hene, nikarin vê nîmetê bidest bixin. Heke em hurmetê ji vê*

*nîmetê re bigrin û em ji bo wê hemd ji Xuda re bikin, ewê vê nîmeta xwe ji me re hîn zêdetir bike. Heke em qedrê wê negirin, ewê wê ji dest me bistîne."*

Herçî seydayê me «**Nûreddîn Topçû**» bûye, ew seydayê me yê grûpa felsefê bû. Dema wî di nav civakê de ferdên xwedî ezperestî û xwedbîn didîtin pirr pê ğemgîn dibû. Ji bo îhya nekirina îslamê di heyata ferd û civakê de kedermend dibû û wî ev heyret û dehşeta xwe jî wiha îfade dikir, digot:

*"Ev mirovên ha çima ev qeder giringîyê bi tesewwifê nadin?!"*

Me seydayekî din hebû, wî dersa xeta sipehî (destnivîsa sipehî) dida. Lêbelê wî bi xwe ji xwendekaran re hem qamîş/çîtik hem jî hibr hazir dikir.

Me seydayekî dîtir jî hebû. Ew bi şev li razangehê digerîya û lihêfa kê ji ser çûbûwî dîsa lihêfa wî bi ser de dikir.

Me hinek seyda jî hebûn, wan di piştî dersa dawî de dersên îzafî didan ji bo kêmasîya xwendekarên ku ji tehsîla dersên xwe dereng mabûn, telafî bikin. Wan bi heyecaneke naweste her hewl û cehd dikir ji bo ders û talîmeke baştir ji her xwendekarî re dabîn û temîn bikin.

Herçî ew karê ku hemû seydayên me ji her tiştekî din bêhtir hewl didan li me bidin hînkirin, dersa naskirina keyfîyeta bikaranîna rûh û mal bû.

Wan ev ders jî ji me re bi reftar û bizavên xwe erz dikirin.

Ji wan rojan heta bi îro tam çil sal derbas bûn. Lêbelê heta îro jî bandorên wan mirovên baş ên di wan rojan de hê jî ji ser me xîç nebûne, neçûne. Ji ber ku bandorên manewî û mûbarek di aqil û qelbê me de heta vêga zindî û bi bandor in.. Ez her wextê ji bo mirovên ku ew dem û an sipehî kirine, dûa dikim. Cenabê Heq ji wan tevan razî be! Lêbelê sipehîkirina vî zemanî û zemanên paşerojê jî.. Ev jî dikeve ser milên me.. Cenabê Heq me tevan ji bo vê serfiraz bike!.

*Ez benî, dema em werin ser van rojan, gelo ew xeter û tehlûkên ku îro li benda zarokên me ne, çi ne? Gelo mesûlîyet û berpirsîya dê-bavan li hemberî van xeter û tehlûkan çi ye?*

Xetera ku di serê van xeteran de tê jî ku îro li benda zarokên me ne, bi awayekî ji rûhê manewî dûr (bê-exlaqî) perwerdekirina wan tê. Yanî girtina pencereya uxrewî ye, hem jî wekî netîceyeke talîma ku berê wê li dinyayê tenê ye. Yanî heyata qelb bi lawazîyê dûçarbûn e. Divê em bizanin ku kîjan nifş bi taybetmendî û fezîletên uxrewî şîn nebe, nikare hest bi asayîş û hizûrê bike, çendan ew tûr û çentê xwe bi dosyayên pêbawername û dîploma'yan tije jî bike.. Di civakê de ew qeder nimûneyên ğemnak ji

kêstek û dinyaperestan hene ku nayên jimartin. Îro gellek adetên zehf xirab jî hene. Bi taybetî jî di wan mirovên ku gîyanên xwe ji bo pençeya tevzênerîyan teslîm kirine, neparastina rûmeta jinîtîyê û binpêkirina wê îffet û namûsa ku bi berdewamî jehra wê bi alîyê nifşên biçûk ve tê weşandin û reşandin..

Ev hemû bi şeklekî zehf eşkere nîşan didin ka ew xeterên ku li benda zarokên me ne, çi qeder zehf û xeternak in. Heke em vê xeterê dibînin, naxwe divê em baştir têbigihin ku çareserî bi cihkirina îmanê û exlaqê mezin û xweş di singa wan de mûmkin dibe. Ew dilên ku nûra wehyê nas nekiribin, ewê çawa bikarin hest bi dilşadîya rasteqîne bikin û pê bigihin? Divê em li ser wê hesta bilinda şairê îstiqlalê Mehmed Akîf Ersoy ya di vê xusûsê de rawestin:

*Îman çi mezin e, ew cewhera îlahî!*

*Dilê zingarî yê bêîman di singê de abes e..*

Ne serwextbûna di bara karûbarên dînî de tarîtîyeke zehf tirsnak e! Lewra însan çi nizanibe jê re dibe dijmin. Dûrbûna ji dîn, însanî ji hessasîyetên rûhanî mehrûm dikin û asoya wijdanîya wî jî teng dikin. Ew nûrên hundurîn û derveyî dimevirîne. Ew însanî ji hikmetên hûr ên Kîtab û Sunnetê û ji nûra rûhanî mehrûm dike. Ew dike ku însan wan cewherên ku ji terefê Xaliq ve wek nîmet jê re hatine îkramkirin, jidest bide û ew însanî dike kîsekî çermî yê ku ji goşt û hestîyan tije ye. Heta ev jî dike ku însan bes menfîeta xwe tenê difikre.

Qisseyek heye di navbera xelkê de tê rîwayetkirin, zehf naskirî û pêzan e. Çi dema bav kurê xwe yê ji dîn, dîyanet û fezîletê mehrûm dibîne, jê re dibêje; *"kurikê min, tu hîç nabî zilam!"* Zarok jî li hemberî bavê xwe înadê dike, diçe mekteban, tehsîla xwe temam dike û dibe walîyê bajarekî.. Ew zilamên xwe dişîne pey bavê xwe û wî ji bo dîwana xwe bang dike ji bo wê peyva wî bîne bîra wî. Dema bavê wî tê dîwana wî, ew ji bavê xwe re dibêje:

*"Bavo! Te ji min re digot; tu hîç nabî zilam. De bibîne va ye, ez bûme walî!."* Vêca bavê wî li kurê xwe dinêre, bi şeklekî manedar jê re vê bersivê dide, dibêje:

*"Kurê min! Min ji te re negotibû; tu nikarî bibî walî; min ji te re digot; tu hîç nabî zilam. Heke tu bûbayî zilam, te bavê xwe ji bo dîwana xwe bang nedikir, tu bi xwe diçûyî ber lingên wî!.."*

Aynî wekî vê mîsalê ye, îhmala terbîya dînî meraz û nexweşîya îbadetê ji maddê re diwelidîne, heta ew bi xwe jî sebebeke bingehîna dûrbûna ji dîn e.

Hebandina maddê ne felsefeyek e, lêbelê şemitînek e. Ew ne hikmetek e, lêbelê nexweşî û tarîtîyek e. Ew tevizandina hessasîyetên manewî ye, civak kirina bes laşekî zindî ye. Bi îfadeyeke din; berî mirinê definkirina di bin kevir û axê de ye.

Divê qelb ji îqaz û şîyarîyên Qur'ana Pîroz re were teslîmkirin ji bo mûmkin bibe beşerîyet bigihe şerefa însanîyetê.

Ellah Teala nîmetên xwe yên ji hemû nîmetan mezintir ji me re wiha dide zanîn, dibêje:

"**Rahman, Qur'an daye hînkirin, însan aferandiye, ew ji bo beyanê** (xwe îfadekirinê) **daye fêrkirin. Taveroj û heyv bi hesabekî digerin. Giya û dar jê re diçin sicûdê. Wî asîman bilind aferandiye û mîzan danîye**." [71]

Naxwe tu jî vê mîzanê xirab neke.

Rebbê me yê ku dinya bi mîyar û mîzanên îlahî û bi şehînên Qur'anî yên ji mîyar û nîzama kaînatêre berevajî, xemilandine ji me re dide zanîn; wekî van mîzanên li dinyayê di piştî mirinê de jî hinek mîzan hene. Dinya û axret bi hemû mîzanan tije ne. Heyat û mirin bi temamî mîzanên hessas û cuda cuda ne, ku hîç şaş nabin.

Zerûrî ye ku hemû rewş û halên me di çarçoveya mîzanan de bibe. Divê ji bo nifşên ku hê tên nimûneyek ji bo îbadetê, nimûneyek ji bo hal û herEketan, nimûneyek ji bo reftar û bizavan û nimûneyek ji bo exlaq hebe. Di ayeta pîroz de ev hatiye gotin:

71. Rahman, 55/1-7.

**“Kî, bi qasî giranîya zerreyekê xêrekê bike, ewê hemberê wê bibîne. Kî bi qasî giranîya zerreyekê şerekî jî bike, ewê jî hemberê wî bibîne**.” [72]

Di demeke ku dinya bi mîyar û mîzanên îlahî tê xemilandin de û Qur’ana pîroz jî van mîzanan ji me re eşkere dike, rewşa wan kesên ku di tarîtîyê de dijîn û rewşa wan mirovên ku li derveyî van mîyar û şehînên îlahî dijîn jî çi qeder di ğefleteke dehşetdar û ğemnak de ne!.

Di ronahîya vê ayeta di sûretê Rahman de zerûrî ye ku mirov sirrê aferînê, Qur’an û ubûdîyetê bi şeklekî rind û ciwan ji zarok û ewladên xwe re bide hînkirin û şerhkirin.

Bi kurtî; divê em zarokên xwe di çarçoveyeke wisan sağlem de perwerde bikin ku mekan û meqamê pak û birûmetê wan bi awayekî wisan baş biparêze ku ew tewazûn, hevkêşî û ahenga îlahî ya di kaînatê de wekî ku di vê ayetê de hatiye zikrkirin, xirab neke. Bêşiwar ev jî wê di mala malbatê de ji dilên pispor ên dê-bavan xuya bibe.

Nesla ku wiha xuya bibe, ew encama keda wan dê-bavaye ku bi awayekî jidil û ciddî li ser paşwexta zarokên xwe difikrin. Tabîî ye ku em paşwexteke ebedî qesd dikin ku di heman demê de ew heta bi dilşadîya heta hetayê jî dirêj dibe; ne ku paşwexteke tixûbdara heta bi îro ye. Mixabin, di rêya xilaskirina

72. Zelzele, 99/7-8.

rojeke tenê de ku ev jî bi navkirina paşwextê bi navê vê rojê, paşwexta zarokên me di tehlûkê de tê avêtin. Gellek tiştên çewt û şaş hene, tev jî zarokên me di erda heq de bi ber guneh û îsyankarîyê ve dikişkişînin ku ew jî bi vê mazeretê pêktê; “paşwexta zarokên me zehf giring e, divê em çi bikin!”

Lewra heke em zarokên xwe hinekê bi hestên manewî perwerde bikin. Cenabê Heq wê bi vê tebabê paşwexteke ronak ji wan re dabîn û temîn bike. Ferehbûna Osmanîyan ji bo 24 mîlyon kîlo metreyên çarçikî, ji vê rêbazê derdibe. Yanî piştevanîya Xuda di wextên zor û zehmet de bi vê rêbazê ve bend e. Serkeftina cenga Çanaqqaleyê û serkeftina cenga serxwebûnê jî bereket û xuyahîya vê heqîqetê bûne.

Şair **Mehmed Akîf** çi xweş îfade kiriye, gotiye:

*Divê em yekser îlhamê ji Qur’ana Pîroz wergirin,*

*Divê em Îslamê bikin ku bi îdraka serdemê, biaxive!.*

Di vê rewşê de em mecbûr in zarokên xwe wisan perwerde bikin ku ew mizgînber in, ji bo wê xêraku ewê bidest bixin hem ji bo xwe hem jî ji bo malbatên xwe. Ya ji vê jî giringtir ev e; em zarokên xwe heta bi dawîyê bi rêya terbîya bi exlaqê Qur’anê, fikrê wê û îstîqameta wê perwerde bikin ku ew ji bo dînê xwe,

ji bo welatê xwe û ji bo milletê xwe bibin mizgînber in xêrê.

Şair **Mehmed Akîf** vê rewşê di van malikên xwe de çi xweş îzah dike, dibêje:

*Millet ğerq bûye ji bo heq pasevan nîn e,*

*Heke tu bibî pasevan ev welat hîç ğerq nabe.*

Ev jî wekî me îfade kir; berî her kesî wezîfeya pêşîna dê-bavaye. Divê em bizanin ku serkeftinên zehf û mezin wekî cenga Çanaqqale û cenga îstiqlalê çawa ew di zahirê xwe de bûne berhem ji bo fermandar, ğazî û şehîdên ku di wan serkeftinan de rolek leyistine, aynî wisan ew ji hêleke din ve jî bûne berhem ji bo dê-bavên ku bi terbîye û perwerdeya xwe ewladên xwe rakirine û ji bo berevanîya ji welêt şandine cengê..

Li ser van encaman, şair bi hesret rewşa hêlîna malbatê ya îro îşaret dike; ka divê ew çawa bibin:

*Ey bavo, herifîn li mala ye, ne li çîya ye,*
*Carina jî televîzyon guvaştina li ser rûhê zarok e!*
*Bila ji nû ve gul bêne çandin, bila mal bibe cenneta însên,*
*Ey dayê! Ev wezîfe ya te ye, hezkirinê di malan de bicih bike!..*

**Şair Seyrî**

*Hinek malbat hewl didin ji bo zarok ji wan re çêbibin, hinek mirovên din jî hene, ew hîç naxwazin bibin xwedî zarok, adeta çi di dest wan de hebe ji bo vê xerc dikin, gelo ev bizaveke rast e?*

Ew kesên ku dizewicin û bê hebûna sebebekî zerûrî û rewa zarokan naxwazin, her wiha ewên ku hewl didin bi desttêwerdanên curecur ên di malzaroka dê de wan tine bikin, yan jî di tinekirina neslê de dibin sersebeb, bi kîjan mentiqê, bi kîjan wijdanê îzahkirina hewldana wan ji bo pûçkirina cewhera nesla însanî ya ku ew ji temamê mexlûqatan bilindtir e, mûmkin dibe.. Di demekê de giya û heywan bi hezaran delîlên curecur pêşkêş dikin ji bo nesla xwe bidin dewamkirin. Heta mar bi rêyeke pêbawerane bi hiştina wan li cihekî tenha hêkên xwe diveşêre û wan diparêze.

Pirr ğemnak e ku bilindtirîn bûnewer (hebûn) li kaînatê însan, ji hestên vê şefqet û merhemetê mehrûm be, hem jî di hemberî heywanan de ku ew di çarçoveya hesta parastina kinêsa xwe de kar dikin!

Xuda di ayeta pîroz de balê dikişîne ser temaşegehekê ji sahne û temaşegehên roja qiyametê, wiha dibêje:

**"Dema ji keça ku hê bi sağî hatî kuştin û veşartin were pirskirin: Ew ji bo çi sûçî hatiye kuştin?"**[73]

Mixabin, ji însanîyetê re şerm û fehêt e ku ew cînayetên berî hezar û çarsed salan rûdane, di roja me ya îro de jî bi awayê «jiber-xistin»ê werin dubarekirin. Hinek dê-bav di sedsala me de bêyî ku zerûretek hebe sirf ji bo rehetî, refah û ezperestîya xwe hewl didin zarokê xwe di rewşa cenînî'ya wî de ji ber xwe bixin!! Her wekî bi qasî nîvê wan keçên ku hê bi sağî di axê de hatine definkirin bi guneh û cînayeteke modern ew jî bi derxistina rûhê zarokên berşîr ên bêguneh ên di malzaroka dêya xwe de bêsebeb dikin qurbanî û wan ji nav dibin. Her wiha ew bi vê kirina xwe bi ehlê cahilîyetê re dikevin pêşbazîyeke wehşî ya barbarane.. Ev di meqamê pêşî de înkara nîmeta îlahî ye.

Bi îlawe li ser vê, ne malûm e ka ewên ku wiha dikin wê bi kîjan surprîzên dijwar ên heyatê re rûbirû bimînin. Ewên ku vî sûcî dikin divê li ser tişta ku ji bo vî zarokî wê li wan peyda bibe rûbide baş bifikrin dibe ku ew bi destê wan bibe sersebeb ji bo ew sibehrojê di heyatê de bi tena serê xwe bimînin. Heke dê-bavên wan bi xwe jî di dema rabûrî de ew nexwestibûna, heke dê-bavên wan jî heman encam ji bo wan guncaw dîtibûna, wan îro nedikarî li

73. Tekwîr, 81/8-9.

heyatê mewcûd bibin. Divê ew ji bo vê hesabekî baş bikin..

Bi sebeb mehrûmbûna ji dîn û îmanê, tarîxa alemê gellek carên bêjimar ji bo temaşegehên felaketê bûye şahid û dîtiye ka nifşeke xwedbîna ku heyatê di planeke seresereyî ya sade de dijî; ewa ku li cemê ji bilî bersivdana arzûyên ezperestî û zatî yên xweti fikreke din nîn e û ewa ku xatir ji şeref û rûmeta însanîyetê xwestibe, çawa dibe sersebeba felaketan!.

**Cenabê Heq, bi damezirandina hêlîna malbata me ya li ser xêr û xweşîyê nîmetên xwe bi nesîbê me bike. Ew bi qismetê me bike ku em nifşên wisan ji van malbatên nimûneyî perwerde bikin ku ew ji bo xêrê mizgînbexş bin û bi vî awayî em xizmetê ji ummeta Mûhemmed** -sellellahû eleyhî we sellem- **û temamê beşerîyetê re bikin..**

**Amîn!**

# Cihê Jinê di Îslamê de û Hînkirina Keçan



*Fezîlet û îffeta jinê, civakê dike cennet. Ew nifşên ku di wê bihiştê de radibin û mezin dibin jî di civakan de dibin serkehnîya aştîyê. Ji bo vê, jina salîha di nav malbatê de ji bo civakê wekî avîzeyeke camî ye.*

*Cihê jinê di Îslamê de çi ye? Jin di roja me ya îroyîn de, halê hazirxwe diavêjin ser caddeyan û bi navgînên curecur û peyvên zêrîn li dilşadîyê digerin. Divê jin li kuderê, li asayîş û dilşadîyê bigere?*

Cenabê Heq, jin ji hêla pêhis û hestan ve ji mêr zengîntir aferandiye. Ev zengîntirîya wê ya di pêhis û hestan de jî bi mûcibê wezîfeyeke esasî ye ku Xuda ew bi jinê sipartiye. Ev peywir û wezîfe çavdêrî, parastin, terbîye û perwerdeya neslê ye. Dema ew ji tixûbê vê tenzîma îlahî derkeve, hingê ew bi xwe dibe ku heqaretê li fitret û aferandinîya jinê dike.

Di sedsala me de pêşbirka biserxistina wekhevî û yeksanîya di navbera mêr û jinan de hatiye destpêkirin. Ev pêşbirka ha, li dijî xusûsîyetên di aferîna herdu zayendan de ye. Vê pêşbirkê peywirên jinanî û dayîktîyê bêkar kirine, hizûr, dilşadî û aramîya malbatê berze kiriye, jîyana civakê hejandiye û kesayetîya ferd û takekesan winda kiriye.

Lewra aferîna fîzîkî, bedenî, gîyanî û aferandinîya mêr û jinan ne wekhev e. Vêca wekhevî wê di kirin û hiqûqan de çawa bibe? Ya giring hevkêşî û yeksanîya di maf û peywiran de ye; lêbelê ne wekhevîya di hemû qad û mecalan de ye.

Cenabê Heq, ji bo her yekî ji mêr û jinan qabilîyet û jêhatinîyên cuda cuda bexş kirine. Wî gellek wezîfe û peywir di navbera mêr û jinan de dabeş kirine da ku ew hev û din temam bikin. Dema mêr û jin bi maddî û manewî li hev kom bibin, wê gihiştineke guncaw ji bo emanca aferînê xuya bibe û wek encama vê, wê malbat û civak jî bi asayîş û aramîyê bigihin.

Gihiştina jinê bi parastin û pêşvebirina taybetmendî û xusûsîyetên sipehî yên ku Xuda jê re bexş kirine, xuya dibe. Dema jin berê van xeslet û mezîyetên xwe yên ku ji wan re xwedî ye, bide ser awayekî ji tenzîma îlahî re berevajî, çendan ew heqîqeta xwe û şerefa xwe biparêze jî dîsa ewê qedr û qîmetê xwe tine bike, ewê xweşikîya xwe, edeba xwe û ziravî û zarafeta xwe winda bike.. Bi vî awayî ewê ji bo têkdan û jinavçûna jîyana civakê jî bibe sersebeb.

Jîyîna jinê bi awayekî bi aferîna wê re ahengsaz wê civakê bike cennet. Jin di malbatê de ji bo civakê her wekî avîzeyeke camî ye. Dema em rûpelên tarîxê wergerînin emê bibînin ku civak bi jinan avasaz bûne û carina jî heta tu bibêjî bes bi destên wan civak xirab û wêran jî bûne.

Heke rê ji jinan re ji bo dilşadîya wan werin xuyakirin divê ew rêyên jîyanê bi perçeyên caman tije nebin.

Dilşadîya jinê di jîyana wê de bi parastina şerefa wê di bin çavdêrîya malbata wê de mûmkin dibe.

*“Cennet di bin lingên dêyan de ye.”* [74], [75]

Ev hedîsa şerîf ji mezinê me pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- ji bo dêya rasteqîne çi mizgînîyeke mezin e!

Jina bêhnpak û qenc hemêza rahmê ye, ew bi şîyan û qedera îlahî fereh dibe. Jin, di nav malbatê de serkehnîya dilşadîyê ye. Ew bînahîya keyfxweşîyê û dilpakîyê ye. Ew ji bo ferdên malbata xwe merkez û navenda şefqetê ye. Ew ji bo tecellîbûna navên Rebbê me yên “**Rahman**” û “**Rahîm**” li dinyayê cihekî cihêwaz û bingehîn e.

Bi qasî dêyên me ku pêşî mûddetekê em di zikên xwe de, piştre li ser zendên xwe û paştir jî heta bi mirina xwe di dilên xwe de hilgirtine ti mexlûqekî din nîn e ku mûsteheq be em ew qeder jê re hezki-

74. Eş-Şîhab, Mûsned, 119; Suyûtî, Qamûsa Seğîr, c. 1/125.
75. Herçî hedîseke wekî vê ye, ew jî wiha ye: Sehabîyek bi navê «Cahime» hate cem pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- jê re got; ya Resûlellah! Ez dixwazim biçim ğezwê, ez hatime şêwra xwe bi te bikim? Pêğemberê Xuda jê re got: “**Dêya te heye**?” Wî jê re got; belê. Vêca mezinê me pêğemberê Xuda jê re got; “**naxwe tu here balê, lewra cennet li ber lingên wê ye**.” Nesaî, Cîhad, 6.

rin û hurmetê şanî bidin. Dêya me ya ku birêxistin, terbîye û perwerdeya zarokên xwe hildaye ser milên xwe, di dirêjahîya temenekî temam de hezkirina zehf mezin, hurmeta kûr û şukir û spasîyê heq dike.

Gelo pîvan û endazek heye ku mirov pê bikare tixûbên şefqeta fereh û pevgirtî ya di gîyanê dêyekê ji dêyan de dîyar û tayîn bike? Wê xwarin nexwariye lêbelê bi zarokên xwe daye xwarin. Wê cil li xwe nekirine lêbelê ew li zarokên xwe dane kirin. Ew ranezaye lêbelê zarokên xwe dane razandin.. Dê-bavên me hemû jîyana xwe dane rawestandin ji bo di bahoz û bablîsokên jîyanê de toz û ax li ser me nedeyne, gelo mûmkin e ku mirov bikare heqê wan ji stûyê xwe eda bike?

**Hezretê Mewlana** dibêje:

*“Li heqê dê şîyar be! Wê bike taca ser serê xwe! Lewra heke dêyan êşa zayînê û wîladetê nekişanda, zarokan ji xwe re rêya hatina dinyayê nedidît.”*

**Hezretê Îmamê Ezam**, welîyê mezin, alimê fiqha îslamê qazîtîya Beğdadê red kir da ku ji bo zulmê nebe alet. Xelîfe Ebûcafer el-Mensûr ji bo sezapêdanê ew avête girtîgehê û bi sezaya hedlêdanê jî li hukm lê birrî. Her roj hijmara hedlêdanê çend caran zêde dikir. Herçî mezinê me Îmamê Ezam bû, digel zêdebûna jana ku di bin çovan de bi wî digiha jî, dîsa wî bi nerehetî xeber ji hevdostên xwe re dişand û jê re digot:

*“Dêya min wê çi bike heke ew vî halê min zanibe?”*

Wî gellek nimûne pêşkêş kirine ku tev nîşan didin ka ew çi qeder zehf ji dêya xwe hez dike, ew dibêje:

*“Hema bila dêya min a ezîz vê rewşa min nebihîze. Lewra ew hîç nikare xwe li ber vê jana êşdara min bigre!.. Ez jî hîç nikarim xwe li ber ğemgînîya wê bigrim!”*

Hezkirina dêya wî bi ti awayan nekiriye ku ew di bin çov de hest bi êş û elemê bike.

**Hezretê Behauddîn Neqşebendî** bi vê gotina xwe mîsaleke nêreber û mûşexxes ji bo ferehkirina hezkirina dê pêşkêş kiriye:

*“Ewên ku têne serdana qebra min, pêşî bila werin serdana qebra dêya min!”*

Herçî **Mela Camî** ye, wî jî gotiye:

*“Ezê çawa ji dêya xwe hez nekim haleveku wê ez mûddetekê di bedena xwe de hilgirtime, wê mûddeteke din ez li ser zendên xwe hilgirtime û wê di dirêjahîya jîyana xwe de jî ez di dilê xwe de hilgirtime!”*

### *Çi giringîya dêyan di terbîye û perwerdekirina neslê de heye?*

Pêzanîna paşwexta ku çavnêrîya milletekî ji milletan dike ka ewê çawa bibe, ne mûcîze ye,

mirov dikare wê bizane. Naxwe ji bo vê, meyzandina li xortên wî milletî kafî ye. Xortê her sedsalê di alemeke bi heyecan û cuda de dijî, ew dikare taqet û enerjîya xwe di awayekî ji tebîetê xwe re guncaw de xerc bike. Ev jîyan, dibe her wekî nebzê temamê milletekî jî. Yanî her millet ji xwe re şeklekî ji bo alema hissî û fikrî ya ciwanê xwe mûtabiq û ahengsaz werdigre. Heke ciwanê milletekî enerjîya xwe di rêya xêrê, gîyanê manewî û fezîletê de xerc bikin, wê paşwexta wî milletî helbet ronak û xweş be. Bi berevajî vê heke ciwan enerjîya xwe û hêza xwe di ezperestîyê de yanî di hêza zulimkar de xerc û berze bikin, wê paşwexta wî milletî sirgun, derbederî û têkçûn be. Naxwe di terbîye û perwerdekirina ciwanan de peywira ji her peywirê mezintir dikeve ser milê dêyan, divê ew xwedî manewîyateke bilind bin ji bo ew şeref û rûmeta milletê xwe li ser milên xwe hilgirin. Lewra dê, nifşan perwerde dikin. Welîyên Xuda û fetihkaran pêşî rênîşanên xwe ji dêyeke fezîletmend û qenc wergirtine.

Ji bo vê nimûneyên ji her nimûneyan sipehîtir, sehabîyên xanim in. Wan ewladên xwe ji bo fedakarî-kirina bi canên xwe û malên xwe, hîn kirine. Wan dilê ewladên xwe bi mehebbeta mezinê me pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- tije kirine. Her wiha wan ji nû ve bi sedsalên geş û xweş û aramîyên ku pêkanîne îsbat kirine ku civakên xurt ji malbatên xurt têne holê. Malbatên xurt jî berhema hinek xanimên fezîletmend in ku talîm û tehsîleke

zehf a rûhanî û manewî wergirtine, yanî ew ji astenga nefsê derbas bûne.

*Gelo çi rola dersên Qur'ana Pîroz di talîm û hînkirina keçan de heye? Divê mirov di terbîye û talîma ku wê di van dersan de were dayîn de li çi miqate be?*

Divê temamê sazîyan bi taybetî jî fêrgehên jiberkirina Qur'ana Pîroz ku tehsîl û talîma manewî û rûhî didin, bibin mala şefqet, cangorî û xizmetê. Her wiha zerûrî ye ku rahm, îşq, dilovanî û xizmet ji kome-malûmatên sade zehftir cihê xwe di wan dîwaran de bigrin. Lewra kîjan mûallim bêhest be, ew nikare mehebbetê bixe dilê şagirtê xwe. Kîjan perwerdekar nikaribe îşq, wecd û îmanê bi dilên biçûçik û bêguneh bide hisskirin, kîjan dersdar nikaribe hezkirin û kûrahîya Qur'ana Pîroz biçêje, ew di bin fişar û zexta webalekî mezin de ye. Lewra her xanîyê ku malê mûşterek ê dewlet û milletî be, xwendekarên wî jî li cem wê sazîyê emanet in. Dema xwendekar talîma metlûb wernegire, berpirsî li ser binbarê wê dibe.

Di zemanê me de ku pirranîya însanîyetê bi dûv maddîyatê ketiye, divê dersdarên Qur'ana Pîroz bi awayekî taybetî îhtîmameke zêdetir bi feqihên xwe bidin. Divê mûallim û mamosta berî her tiştî dilê feqihî bi hezkirina seydayê wî tije bikin û divê ew

berî dest bi “Elîf û Be”yê bikin, divê heqîqeta “elîf”ê bidin hînkirin. Divê bi wergirtina nûran ji mehebbeta Xuda û Pêğemberê wî, dilên biçûk bi çêja rûhî cîla û rohnî bikin. Divê mamosta, letafet, şefqet û temamê pakîyên îslamê di wan dilên paqij de bidin xuyakirin.

Hewldan û cehda her mûallimî carekê rola dadger dileyize, careke din jî rola celladî dileyize. Ew bi uslûbeke tirsnak hewl dide feqihan kontrol bike. Kîjan ğafil û yên wekî van bi qijkirina birhê xwe rabe Qur’ana Pîroz bide hînkirin, encama talîma wan wê binketin û xusran be.

Xetayeke din ji îhmalkirina ku li hemberî Qur’ana Pîroz were şanîdan bêhtir nîn e ku heyata rûhî ya însanî reş bike.

Divê mûallim û hifzkarên ji talîmê berpirs di van mal û fêrgehan de hewl bidin ku bibin însanên xizmetkarên gihayî. Însanê xizmetkarê gihayî ew kes e ku dilê xwe bi feyza rûhî tije dike. Yanî ew xwedî hêvî ye, xwedî mezîyetên exlaqî ye; xwe dî mezîyetên wekî rahm, şefqet û îffetê ye, ew ji kîn û nefretê dûr e. Însanê xizmetkar ew kes e ku di nav her mirovan de bijî lêbelê her dikare hebûna xwe û îmana xwe mûhafeze bike. Heta di hewa û atmosferên fitnê de jî divê ew di rewşeke wisan de bibe ku bikare tesîrên baş li ser mirovên li hawîrdora xwe bike; lêbelê ew bi ti awayan di bin tesîra mekrohîyan û xuyên xirabên dîgeran de namîne.

Bi kurtî ehlên xizmetê yên heqîqî ew kes in ku dikarin dilên xwe bi her awayan ji fikra mal, milk, meqam û menfîetê dûr bigrin.

Di gotineke bi hikmet de ev şîretên ha hatine kirin:

“Dinya bi sê tiştan dibe cennet:

**1. Bi înfaqkirina bi dest, ziman û dil e;**

**2. Bi eybdar-nekirina bendeyên Xuda û efûkirina wan e;**

**3. Bi zulimê hember-nedana zulma zalimî û wergirtina wesîleyekê ji bo hîdayeta wî ye**.”

Di gotineke bi hikmeta din de jî hatiye gotin:

Sê komên mirovan heqîqeta xwe fehm dikin, ew jî ev in:

✓ Ewên ku azarê nadin ti kesî.

✓ Ehlê tewazû û dilnizmîyê ku ji gotina navên xwe û sifetên xwe şerm dikin.

✓ Ewên ku bi çavê Heq li emanetê îlahî û li mexlûqatan dinêrin.

Piştre tu dîmenên gul û çîçekan çawa dikî bike însanê ji her însanî hişktir û dijwartir jî ji bo dîtina wan tebessum dike, ji wan re dikene. Naxwe divê dilê wî mirovê ku ji însanan re dibe nimûne û rêzan jî wekî gul û çîçekan be. Divê ew keyfxweşî û dilşadîyê bi ser hemû aferîndeyan de biweşîne û ew

bibe ku heta qelbê ji her qelbî hişktir û xirabtir jî li hemberî wî nerm û şîyar bibe.

Divê li dev me hedefa fêrgehên Qur'ana pîroz ji talîm û hînkirinê bêhtir terbîye û edeb-bexşî be. Divê ew xanîyê fezîletê be. Lewra dêyên ku wê rûpelên şerefa paşerojê tije bikin, ewê bes qezenca van sazî û mûessesan bin. Dema ew keçên ku ji van fêrgehan mezûn dibin û derdiçin û ji surprîzên jîyanê re rûbirû dibin divê ew karibin zarafet û sipehîtîyên Îslamê bidin xuyakirin.

Divê fêrgehên Qur'ana Pîroz hewa û atmosfera rûhî ya herdu Fatima'yan bidin hewandin.

*Ez benî, ev herdu Fatima kî ne? Ji kerema xwe hûn dikarin wan hinekê îzah bikin ka ew kî ne?*

Belê, Fatima'ya yekem ew Fatima ye ku Heq Teala fezîleta wê di sûretê Însan ayetên 8-11'an de daye zanîn.

Malûm e di zarokatîya xwe de herdu mezinê me Hesen û Hûseyn nexweş ketibûn. Mezinê me 'Elî-radîyellahû anhû- û mezina me Fatima-radîyellahû anha- li xwe nezir kirin ku ew sê rojan rojî bigrin. Di roja yekê de dema dikirin îftara xwe bikin belengazek hate berê derîyê wan sekinî û ji wan re got:

*“Silav li we ehlê mala Mûhemmed be! Ez belengazek ji ewladê mislimana me, xwarinê bidin min, bila Xuda jî li ser sifrên cennetê xwarinê bide we!”*

Wan xwarina xwe danê. Wan ew roja xwe wisan bê xwarin derbas kir û ji avê pê ve tiştek tam nekirin. Wan ji bo roja duduyan jî nîyeta xwe li rojîyê anî. Di roja duduyan de jî wextê îftarê sêwîyek hate ber derîyê wan sekinî û ji wan re got:

*“Silav li we ehlê mala Mûhemmed be! Ez sêwîyek ji ewladê mûhacira me, bavê min şehîdketiye, xwarinê bidin min.”*

Wan xwarina xwe danê. Ew roja duduyan jî bê xwarin man û ji avê pê ve tiştek t‘am nekirin. Wan ji bo roja were jî nîyeta xwe li rojîyê anî.

Çi dema roja sisêyan jî hat di heman wextê îftarê de yexsîrek hate ber derîyê wan sekinî û ji wan re got:

*“Silav li we ehlê mala pêğembertîyê be, hûn me yexsîr dikin, me girêdidin û hûn xwarinê nadin me, xwarinê bidin min lewra ez yexsîr im.”*

Wan xwarina xwe danê, ew sê şev û sê rojên xwe bê xwarin man û ji avê pê ve tiştek tam nekirin. Vêca ji bo vê helwesta wan ev ayetên sûretê Însan nazil bûn, hatin xwarê:

**«Ew, digel ku pêdiviya wan pê heye û jê hez dikin jî dîsa xwarinê didin xizan, sêwî û yexsîran.**

**Ji wan re dibêjin: Em bes ji bo rizamendîya Xuda xwarinê didin we; em ji we ti perûyekê û ti spasiyekê jî naxwazin. Em vê qencîyê dikin, lewra em ji Xudayê xwe ditirsin da ku ew me di rojeke rûtirşker û tehlker de ji tirs û ezabê xwe ewle bike. Ha ji ber vê Xuda, wan ji ezabê neqenciya wê rojê diparêze, rûsipehîtî û dilşadiyê dide wan. Xuda, di hemberî sebra wan de bihiştekê û cilên hevrîşimî dide wan**.»[76]

Di van ayetan de sê tişt bala me dikişînin ser xwe:

**Ya yekê**; Bi çavê Xuda meyzandina li mexlûqatên Xuda û bi rahmkirina li wan, mûmkin dibe. Ew bi ketina dilê sêwî, xizan û êsîran mûmkin dibe. Di vê xusûsê de mezinê me Ebûbekr el-Werraq wiha dibêje:

*"Kî, înfaqê nake ew cennetê nafikire! Kî ji feqîran hez nake ew nikare bibêje; ez ji pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- jî hez dikim. Herdu jî derewîn in!"*

**Ya duduyan**; Bi înfaqkirina ji bo rizaya Xuda mûmkin dibe. Li ser vî esasî mezinên me Hezretê Elî û Hezreta Fatima-radîyellahû anhûma- gotine:

76. Însan, 76/8-12.

**“Em bes ji bo rizamendîya Xuda xwarinê didin we; em ji we ti perûyekê û ti spasiyekê jî naxwazin.”**[77]

Divê em jî wekî wan ji amelên ku em pê radibin û dikin ti hemberekî ji mirovan çavnêrîyê nekin û divê em her tiştî ji bo rizaya Xuda tenê bikin.

**Ya sisêyan**; Ev mirovên îdeal û nimûneyî dibêjin;

**“Em vê qencîyê dikin; lewra em ji Xudayê xwe ditirsin da ku ew me di rojeke rûtirşker û tehlker de ji tirs û ezabê xwe ewle bike.** “[78]

Bi îlawe li ser vê divê dilê mûmînî bi tirsa ji Xuda tije be.

Di hemberî vê îxlas û xizmeta wan de jî Heq Teala ferman dike, dibêje:

**“Ha ji ber vê Xuda, wan ji ezabê neqenciya wê rojê diparêze, rûsipehîtî û dilşadiyê dide wan.** ”[79]

Mîsala duduyan ya ku alema qelbê Fatima dide xuyakirin jî wiha ye:

Dema pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- li Kabê li cem ruknê Yemanî nimêj dikir, Ebûcehl hat û ew li wir bi tenê dît, pê keyfxweş

77. Însan, 76/9.
78. Însan, 76/10.
79. Însan, 76/11.

bû, hevalekî xwe bilez şand ji bo pizanê hêştiran jê re bîne wî jî ew jê re anî û dayê. Dema pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- çû sicûdê, wî ew pizanên ku giranîya wan kêm-zêde 70-80 kîlogram bûn avêtin ser pişta wî. Ebbas mamê pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- li wir bû, lê ew hê misliman nebûbû. Mezinê me jî nedikarî dengê xwe derîne û hewar bike, lewra ew ji dijwarîya mûşrikan ditirsîya.

Di wê navberê de Hezreta Fatima derbas dibû. Ew jî hingê kêm-zêde neh, yan jî deh salî bûye, ew bilezûbez hat û wê destpê kir ew qirêj û çepelî ji ser mezinê me pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- paqij kirin. Hêstir ji çavên wê dibarîn, mezinê me pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- jî hedana wê dianî û jê re digot:

*"Keça min, negrî!."*[80]

Hezreta Fatima, li hemberî wê tirsa ku heta esabîyet û rehgirîya lêzimtîyê jî nekarîbû xwedîtîyê lê bike, jineke çavnetirs û xwedan şehamet (tijefehm û bicesaret) bû. Wê, Xuda û pêğemberê wî li ser her tiştî tercîh dikirin û wê ji her tiştekî din bêhtir ji wan hez dikir. Ji bo vê sebebê ji mezina me Fatima re "**dêya bavê xwe**" hatiye gotin.

Dema em tên cem Fatima'ya duduyan, ew jî ew Fatima ye ku dema mezinê me Ûmer diçû ji bo

80. Binêrin: Buxarî, Selat, 109, Cîhad, 98, Cezîye, 21; Mûslim, Cîhad, 107.

cînayeteke mezin bike, yanî dihat ku pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- bikuje, wê nehişt ew biçe vê merama xwe bîne cih û wê berî wî da ser hîdayetê. Wê, di wê rojê de bi dilekî wiha Qur'ana Pîroz xwendibû û wê mirovekî cahilîyetê yê xwedî dilekî dijwar û kevirîn ê wekî Ûmer helandibû û ew kiribû însanekî wisan dil birahm, hêstir ji herdu çavên wî dibarîn, xwe ji Heq re nizm dikir û ji cemê vegerîya..

Ji bo vê sedemê zehf mûhîm e, keçên me yên ku wê di fêrgehên Qur'ana pîşroz de werin perwerdekirin van herdu Fatima'yan ji bo xwe bi nimûne û rêber bigrin. Divê her yek ji keçên me wekî wan bi îffet û rûmetdar bin. Divê ew amelên xwe ji bo rizaya Xuda eda bikin. Divê ew Qur'ana pîroz bi dilekî kûr û keyfxweş bixwînin da ku qedr û qîmetên bilind ên xwestî, di wan de tecellî bibin û dilên me jî bi feyz û tesîrên îlahî tije bibin.

Di vê xusûsê de divê em dêya xwe Hezreta Aîşe jibîr nekin ku ew ji navbera hevjînên Mezinê me pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- zehf bi zekawet bûye. Ew ji navbera sehabîyên kîram yek ji her heft mûctehidan bûye. Mezinê me pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- di bara wê de gotiye:


*"Sêyeka dînê xwe, ji mala Aîşe bigrin."*[81]

81. Deylemî, c. 2, 165/2828.

Li ser vî esasî divê her jina misliman para xwe ji zekawet û feraseta dêya me Hezreta Aîşe bigre. Pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- bi xwe medhê wê kiriye û Heq Teala bi xwe ji îffeta wê re bûye şahid.

**Em vê zarzar û laklakê dikin; ya Rebbê me, parekê ji heyata dilî ya mezina me Hezreta Fatima, parekê ji zekawet, feraset û îffeta mezina me Hezreta Aîşe û parekê ji sedaqet û cangorîtîya dêya me Hezreta Xedîce ji bo temamê keçên me bi nesîb bike.. Amîn!.**

# Tesîra Îmanî ya Dêyên Sultanan di Medenîyeta Weqfan de



*Bi îlawe li ser ku Osmanî dewleteke mezin bûne, wan di heman demê de bi sifetê xwe ku medenîyeteke weqfan bûne jî cihekî giring di rûpelên zêrînên tarîxê de dagir kirine.*

*Ez benî, ma em dikarin bibêjin; ji dan berdewamkirina wê geşbûna nimûneyî ya ku me ji heyata eshaban daye di sedsalên werin de jî çêdibe? Ma heyata malbatî ya sipehî û hestên qelbî yên wan di sedsalên werin de jî jîyane?*

Hîç şubhe nîn e.

Îslam dînekî dînamîk e, bizavxwaz e, ne bêbizav û statîk e. Li ser vî esasî hebûna hemû sipehîtîyên di rojên pêşîn de ew her zemanî di dilên mûmînên evîndar û semîmî de dewam kirine çendan rêjeya çend ji sedî guherîbe jî.

Bi taybetî jî di serdema Osmanîyan de ji navbera hemû sedsalên di piştî esrê seadetê de wekî serdema duyema seadetê tê jimartin. Bi rastî bav û kalên me ketibûne pêşbirkeke îmanîya kamil, îrfan, îhsan û xêrê, çi di warê êminî û seadetê de be, çi jî di warê pêkanîna qelbê civakê de be. Zehftirîn delîlên zindî ji bo heqîqeta ku me gotî, di van nuqteyan de xuya

dibin; zengînîyên maddî û manewî û mîrasên kulturî yên ku nimûneyeke din wekî wan nîn e, û hinek ji wan heta bi îro jî ji me re mane.

Ji hêleke din ve jî Osmanîyan ji bûna xwe wek dewleteke mezin bêhtir; wan bi sifetê bûna xwe wek medenîyeteke weqfan, qada tarîxê dagir kirine; wek netîce ji bo vê medenîyeta wan temamê dinyayê ew ji bo xwe kirine taca ser seran û wan bi vî awayî temenekî dirêj dewam kiriye..

*Dêyên Sultanan û Hinek xanimên Serayê jî hinek berhemên din jî hene ku di nava mûzexaneya avasazîya dewleta Osmanî de peyda dibin û paşê jî ew bûne medenîyeta weqfan. Gelo hûn dikarin di vê mijarê de jî hinek malûmat û agahîyan bidin me?*

Zehf mûhîm e, em bizanin ku di serdema Osmanîyan de bi texmînî ji terefê hezar û çarsed xaniman ve tam bîst û şeş hezar û sêsed weqf hatine damezirandin.

Yek ji van xaniman jî dêya Sultan «**Nûrbanû**»[82] ye ku wê li Îstanbûlê li ser sahilê Anadolu û Rûmelîyê

82. Leqeba resmî ya mensûbên malbata desthilatedara Osmanîyan **Sultanefendî** ye. Maneya vê peyvê ev e; bav, ji malbata desthilatedar e, yanî emîr e, yan jî sultan e. Her wiha heke jinek bi mêrekî re bizewice ku ne ji malbata desthilatedar be, ji keçên wan re «Xanim-sultan» tê gotin. Herçî kurên wan e, ji wan re jî «**Begzade**» û «**Sultanza-**

çendîn eser ava kirine. Camîya Walîde ya Etîq ya li «**Toptaşî**» û «**Uskudar**»ê xeyratgeha wê, medreseya wê, nexweşxaneya wê û hemama wê ya du-qat ji wan yadîgar û xizmetên nemir in ku ji alema qelbê wê bi me gihane.

Her wiha yek ji van xaniman jî walîdesultan «**Mahî Bekîr Kosem**» e. Wê ruknê mizgefta nû avêtiye û li Uskudarê mizgefta **«Çînîlî»** ava kiriye. Li tenişta wê jî medresekek, çeşmeyek, qedengehek, hemameke du-qatî û sebîlek heye. Zêdebarî vê, wê mizgefta li «**Qavağî**» ya li Anadoluyê jî ava kiriye. Dîsa meşhûr e ku wê weqf ji bo zewicandina keçên sêwî û xizan jî damezirandiye. Ji bilî van ên ku me gotin, wê gellek amelên xêrxwazî yên din jî hene. Tişta ku pirr balê dikişîne ser xwe jî ev e; digel ku «Kosem sultan» di navbera dêyên sultanan de bi tebîetê hişk û dijwar ê xwe tê naskirin jî lêbelê di rastîya xwe de ew di bara şefqet û rahma li feqîran de şexsîyeteke zirweyî bûye û wê ji bo arîkarîya lawaz û xizanan weqf damezirandiye..

---

**de**» tê gotin û ew bi dêya xwe têne naskirin. Heke Begzade û Sultanzade bi jineke ğeyrê malbata desthilatedar re zewicîbin, zarokên wan ji malbata desthilatedar nayêne hesabkirin.

Ji hêleke din ve; ew jinên ku ewladên wan bûbin sultan; lêbelê ew bi xwe ne ji malbata desthilatedar bin, hingê bi pirranî îfadeya resmî ya wan ev e; «Walîde-sultan». Ji hevserên sultanan re jî «Qadinefendî» tê gotin. Lêbelê dema hevserên sultanan ji yekê zehftir bin hingê ew bi sifetê «1. Yan jî 2. Qadinefendî» têne naskirin.

Digel ku «Kosem sultan» bingeha wê avêtiye jî lêbelê şerefa vekirina wê ji bo îbadetê û temamkirina camîya nû ji «Xedîce Tûrxan Sultan» re bûye nesîb ku hingê hê nîvê wê temam nebûbû. Lewra temenê «Xedîce Sultan» têrê nekiribû ku wê temam bike.

Li tenişta vê, wê hinek amelên xêrxwazî yên din jî hene, her wekî destnivîsî, pirtûkxane, medrese, xeyratgeh, çeşme.. Zêdebarî van di weqfîya Camîya Nû de tiştekî din heye ku zehf balê dikişîne ser xwe, ew jî herikandina hinguvîn ya ji hinek çeşmeyan di şevên qendîlên dînî û Remezanê de ye û îkramkirina wê ji cemaetê re ye ku dema ji nimêjê derdiketin, ji wan re dihat îkramkirin. Her wiha di weqfîyê de qalîteya hinguvîn hatiye vegotin û di wê wextê de hinguvînê ji her hinguvînî bi qalîtetir ji bajarên Atîna û Rîza'yê daye anîn û ku îro navê Rîzayê bi navê «Bazar»ê hatiye guherandin.

Di weqfîyê de ev şert hatiye danîn; divê ev hinguvîn tim were bikaranîn çendan bihayê wî çi qeder giran jî bibe û divê ti hinguvînekî din neyê bikaranîn. Ev jî nimûneyeke tîpîk e ku dereca keyfîyet, çawanî û hesta di karên xêrxwazîyê de nîşan dide.

Vê xatûnê serkehnîyên zehf zengîn ên dahatê ji bo dirêjepêdana weqfên xwe li pey xwe hiştine. Her wiha wê ji bo birêvebirina van weqfên xwe jî sed û şazdeh wezîfedar bi meaş dane xebatê.

Walîde sultan **«Pertevnîyal»**ê jî li «Aqsaray»a Îstanbûlê mizgefta Walîde û mizgefta «**Ya Wedûd**»

jî dane çêkirin. Zêdebarî van, wê pirtûkxane, çeşme û destnivîs jî dane çêkirin û li ser herdu mizgeftan kirine weqf.

Herçî «**Mehrîmah Sultan**» e, wê jî «Camîya Nimêjê» li «Edirneqapî» û «Uskudar»ê dane çêkirin. Digel eserên mezin ên weqfî yên ku wê dane damezirandin jî heta tu bibêjî bes ew şexsîyeteke xwedan tewazû û nefsbiçûk bûye. Ev mîsala ku tê jî bi awayekî sipehî kesayetîya wê nîşan dide. Ji terefê hevjîna Harûn Reşîd Zubeyde Xanimê ve ji tenişta Beğdadê ji bo Mekke û Erefatê av hatibû anîn. Lêbelê tê gotin; coka vê avê di serdema Qanûnî de bi derbasbûna zemanî de ji kar ketibû, ava wê kêm bûbû, êdî têrê nedikir. Dema Mehrîmah Sultan bi vê xeberê hesîya, çû dîwana bavê xwe Qanûnî û jê teleb kir ku cokên kevin ên vê avê ji terefê serokê avasazan Mîmar Sînan ve werin tamîrkirin, wê xwest ku ev hewldana wê ji bo vê xizmetê jî heta tu bibêjî bes bi dizî bimîne û wê hemû gewher û zînetên xwe ji bo vê meqsedê terxan kirin..

Piştî Mîmar Sînan ruknên Mizgefta Suleymanîyê avêtin, ew mûddetekê ji meydanê winda bû, heta sebebê vê jî bi temamî ne pêzan bûn. Li gorî tê gotin; wî bi qesd xwe winda kir ji bo avêtina bingehên mizgeftê. Lêbelê ev ji ber çavan windabûna wî ji bo tamîrkirina cokên pêzanên avê bûye ku ji wan re «**Ava Zubeyde**»yê dihat gotin û wî li ser daxwaza «Mehrîmah Sultan»ê ya xwediya vî karê xêrxwazîyê,

wî xwe winda kiribû ji bo ev hewldan û xizmeta wê bidizîkahî bimîne û kes nizanibe ku ew pê rabûye û wê daye kirin..

Walîde sultan «**Bezm-î Alem**» jî di warê karên xêrxwazîyê de yek ji navdartirîn dêyên sultanan tê jimartin. Lewra wê gellek amelên xêrê dane kirin û ew di dirêjahîya sedsaleke temam de bi kar û xizmetên xêrxwazîyê rabûye û ew bûye beşek ji tarîxê. Mizgefta Walîde sultana li cem Seraya «**Dolmebexçe**»yê ji mizgeftên mezintirîn e ku wê dane avakirin. Pira navdara «Galata» jî weqfa wê ye.

Ya pirr giring jî ew weqf e ku Walîdesultanê li Dîmeşqê damezirandiye. Şertên wê weqfê jî ev in:

-Gihandina ava şîrîn a li Dîmeşqê ji bo hacîyan e.

-Tezmînkirina tiştên ku xizmetkaran şikandine, yan jî xirab kirine da ku şerefa wan û şexsîyeta wan neyê birîndarkirin e.

Nexweşxaneya Ğurebayên Mislimanan jî walîde sultan «Bezm-î Alem»ê damezirandiye. Lewra wê miqdarekî mezin ji serweta şexsî ya xwe kiriye weqf û pê destê xwe yê xêrxwazîyê heta bi gellek erdên dûr jî dirêj kiriye. Ev jî xizmeteke mezintirîna ji xizmetên wê ye. Ev esera mezin, digel mizgeft û çeşmê di sala 1843'êyên zayînî de ji bo xizmetê hatine vekirin. Ji wê rojê heta bi vêga şîfayê ji bo feqîrên ummeta Mûhemmed -sellellahû eleyhî we sellem- belav dike.

Van di dereca pêşîn de giringî bi karên xêr û hesenatan dane ji bo avê dabîn bikin. Wan aynî wekî Îstanbûlê ji bo Mekke û Erefatê jî av û kehnîyên weqfî temîn kirine. Ji bo vê xizmetê jî wan coyên avê dane kolan ku heta vêga jî ew berdewam dikin. Wan bi tamîrkirina coyên avê jî gellek av gihandine Îstanbûlê ku têra xelkê wê bike.

Weqfên ku bav û kalên mûbarek ên me bi îxlas damezirandine, ew bi dûa û xwezîyan hatine tesîskirin ji bo faîlîyetên wan heta roja qiyametê berdewam bibin. Ev weqf, her wekî mizgeft, medrese, nexweşxane, razanxane û sebîlan îhtiyacên mirovan yên îro temîn dikin û ewê îhtiyacên wan yên sibehrojê jî temîn bikin. Heta vêga jî gellek xizmetên wan berdewam kirine. Ev xizmetên ha ji bo kalên mûbarekên me şîara îman û esaletê ne û ew ji bo her yekî ji wan jî sedeqeyên carîye ne û ewê rûhên ezîz ên wan şad bikin.

**Cenabê Heq, îmkana berdewamîya van xizmetên vî qelbî yên ku bav û kalên me peyda kirine, hêsan bike! Dîsa ew ji bo peydabûna nifşeke wekî wan bi îffet, xêrxwaz, fezîletmend û camêr derfetan bexş bike! Ew, bi avakirina malên malbatên aram, amade û layiq ji bo qiwama vî nesîbî, ji me re bexş bike!.. Amîn!..**

## PAŞGOTIN

Heyata malbatê bi aferîna însanî re destpê kiriye. Bêşiwar ew mûhîmtirîn ayne ye ku wê di rêwîtîya me ya ebedîyetê de jî netîceya ku emê bigihinê, dîyar bike. Lewra malbat, bi nêrînekê li dinyaya ku zevîya axreta însanî ye, hawîra mekteba pêşî, hezkirina pêşî, parvekirina pêşî, dilşadîya pêşî û cenneta pêşî ye ku hestên însanî û îradeya wî yanî aqilê wî û qelbê wî têde têne perwerdekirin.

Naxwe ji her hêlê ve divê ev hêlîna mûbarek bi huwîyeta (nasnameya) esilî ya xwe bigihe û divê ew bibe keş û hewaya bi xatirtirîna temenê me. Li dinyaya derveyî qehweyeke ziwa çil salan xatirê wê tê jimartin, divê di dinyaya hundurîn de çendîn qehwe û sipehîtî hîç ti zemanekî bê xatir nebe. Pevrebûnên ku di heyata malê de temenekî di xwe de dihewîne, divê bêzarbûnîyê nede. Divê hevjîn qedr û qîmetên hev ji çavên xwe nexin. Tam berevajî vê heke sal û zeman jî di ser de derbas bibin dîsa divê her wekî mîsala berhemên abîdeyî bi rewşeke îhtîşamdar bibin, divê ew her sipehîtir bibin û bi qîmet bibin.

Ji lewma divê em nêrînên xwe li hêlîna malbata xwe dubare di ber çavan re derbas bikin. Ew hêlîna qudsî, ne hotêlek e, ne jî qadeke ğefletê ye. Ew dever bexçeyekî dila ye ku têde fêkîyên evîn, hezkirin, parvekirin û xizmetê yên ji rizaya Heq re amade, têne berhevkirin. Gul û çîçekên vî bexçeyî, heke sumbulên wî û bilbilên wî di nav hewaya biharê de bibin, îhtîmal û egereke xurt e ku di qiyametê de jî nesîb û para me sipehîtîya biharê be.

Yanî bi kurtî hêlîna malbata me;

Divê di roja mehşerê (kombûnê) de di hawîreke dehşetdar de ji bo heyatekê nebe sersebeb ku dê-bav û zarokên wan ji hev birevin lêbelê divê ew bibe mekanê jîyîna sipehîtîyan ku ew têde ji dil û can bi hesret hev û din hemêz bikin. Ji bo vê jî divê însan ji vêga ve diqqet bike ku ew çi bike û çawa bijî ferdên malbatê wê ji hev birevin, heke ew çawa û bi çi awayî jîyanekê damezirîne hemû ferdên malbata wî wê ji bo hev bibin şefaetçî û xilasker!..

Mezinê me pêğemberê Xuda -sellellahû eleyhî we sellem- dibêje:

"*Hûn çawa bijîn hûnê wisan bimrin, hûn çawa bimrin hûnê wisan dîsa werin sağkirin!..*" [83]

Şair M. 'Elî Eşmelî qîmet, sipehîtî û zerûreta hêlîna malbateke di nav qiwameke wiha de, çi xweş îfade dike:

83. Mûnawî, Feyzû'l-Qedîr, V, 663.

Malbata bextewar, seraya bihiştê, sefa'ya can,

Ev avahî li ser sitûnên dil bilind dibe...

Hemû jihên/têlên wê bes bi helalî girêdayî ne,

Dema heram tevlî wê bibe, dinya wê biheje, biherife!.

Xweşbînîya hevberî/dualî kemera dîwarên wê ye,

Lêbelê sûa-zenek wê bingehên wê bike îmha!...

Sipehîtîya wê ji bo her derdî sebra di mala can de ye,

Heke dil kuwara mêşa hinguvîn be, keder û bela wê hinguvî çêkin!..

Mekanê çîçekên jîyanê, qelbê selîm e,

Hezkirina paqij sewdaya mezin vedixwîne/bang dike!..

Hukm ev e, nîvê dîn bi yarê temam dibe,

Hêvî heye Mewla nîvê dîgerê mayî jî neqetîne!..

Ev e, ev e pirek ji Leylayê bi ber Mewlayê mezin ve,

Di ezel de Xuda eşqa wiha daye însan...

Heke ev pir nebe wê li ğurbetê her dil biqelişe,

Ey rêwî, zinhar bila cuhela vê pirê wêran nekin!

Bila bi her tiştên dibe-nabe li ser vê pirê kef bi ziman nekeve,

Hêrsa pûç xirabtrirîn zelzele ye, zirara wê ji dil re cefa ye!..

Ji mirovê rûtirş, mîzac-xirab, rê nepirse,

Ey sîmayê sipehî, melek vê tebessumê dixwaze!.

Pireke wekî sîrata mezin e ku ji nankorî re nar e,

Lêbelê ew ji bo wefadarî di rêya bihiştê de tûbaye!..

Ji bo vê dêya me Xedîce ji me re nimûne ye,

Ji bo vê teqwa'ya Muhemmedî ji me re nimûne ye...

Hêlîneke bi xêr di her çağî de zehf mûqeddes e,

Ji xwe nexasim ji bo vî çağî «SEYRÎ», ev mezintirîn doz e!..[84]

84. **Sûa-zen**: Zena xirab, şubhe. **Cuhela**: Cahilan, nezanan, nedîtîyan. **Sîma**: Rû, çehre. **Nar**: Agir, cehennem, dojeh.

Ha ew roja ku di nav malbatê de bi vî rûh û van pîvanan pevbestin û pevbendî hatibe damezirandin, ew hêlîn, wê di bara axretê de qezenceke bêdawî be ûkeş û hewaya rûhanîyetê be, ji bilî vê jî wê li dinyayê ji bo geşbûna çendîn sipehîtîyan û zindîbûna hizûr û îhtîşamê di nav civakê de bibe wesîle.

**Rebbê me, hêlînên malbatî yên wiha ji me re îhsan bike! Vî milletê ezîz û ciwanîya me di welatê me yê cennet de bi hestên îman, îrfan, evîn, mehebbet, dîgerğemî, fedakarî, xizmethezî û dilşadîya ebedî ya wiha bide temamkirin!.. Ji hêlînên malbatî yên bextewar ên ku bi vî awayî hatine damezirandin ji nû ve cîhangîrên wekî Fatîhan û Yavûzan îhsan bike!**

**Amîn!..**

**Tûba**: Ew dara bihiştê ye ku koka wê li jorê ye û şağ û çiqilên wê jî li jêrê ne.

## NAVEROK

Pêşgotin .......................................................... 5

Di Îslamê de Nîkah û Malbat .................................... 11

Ew Xusûsên ku Divê Jin di Nav Malbatê de li
wan Diqqet Bike ........................................................ 53

Mijarên ku Divê mêr di Nav Malbatê de li
wan Miqate Bin .......................................................... 75

Mijarên ku Divê Jin û Mêr di Nav Malbatê de li
wan Miqate Bin .......................................................... 95

Li Dor Perwerdeya Zarokan.................................... 115

Cihê Jinê di Îslamê de û Hînkirina Keçan .............. 163

Tesîra Îmanî ya Dêyên Sultanan di
Medenîyeta Weqfan de............................................ 181

Paşgotin .................................................................. 191

..........................................................................................................................

..........................................................................................................................

..........................................................................................................................

..........................................................................................................................

..........................................................................................................................

..........................................................................................................................

..........................................................................................................................

..........................................................................................................................

..........................................................................................................................

..........................................................................................................................

..........................................................................................................................

..........................................................................................................................

..........................................................................................................................

..........................................................................................................................

..........................................................................................................................

..........................................................................................................................

..........................................................................................................................

..........................................................................................................................

..........................................................................................................................

..........................................................................................................................

..........................................................................................................................